ROMAN

Mezher BOZAN

# AV ZELÂL BÛ



Weşanên Pêrî

*R1-AMY-016*

3 1221 09000 6409
EDMONTON PUBLIC LIBRARY

# Mezher Bozan

# AV ZELÂL BÛ

*Weşanên Pêrî*

Çapa Yêkem:

İstenbol- Rêbendan 2002

Edîtor:

Ahmet Onal

Rêz:

Şenay Yurtsever

Redaksiyon:

?

Dîzayna Bergê:

Yekitiya Wênevanên Komel

Wêne:

Gulcan Zîrek

Çap : Berdan Matbaası

Cild:

Yalçın Mücellit

ISBN 975 - 8245- 54 - 06

Pêrî Yayınları

Meşrutiyet Cad. Ankara Apt. No: 48/2

Galatasaray - **Beyoğlu / İstanbul**

**Tel:** 0 212 251 49 01

**Fax:** 0 212 249 85 27

**Beyoğlu / İSTANBUL**

# XWENDEGEH

Otobus rawestiya. Rêvî tev peya bûn. Her sê heval, li pey hev daketin. Yehya, Dawûd û Menaf. Yehya hebû şanzdeh, Menaf çardeh û Dawûd jî sêzdeh... Mirovî her sêyan daniya ser hev, ji wan zilamek dernediket.

Alavên xwe standin û berên xwe dane wî bajarê gerase. Hindek bi rê ve çûn, lê nizanîbûn, ku ew dê ber bi kude herin. Rawestiyan. Li dora xwe nihêrtin, dûre li hevûdû nihêrtin. Yehyayî got:

- Hûn li vir bin, ez dê herim ji wi mirovî bipirsim!

Yehya çû li ba paytonekê rawestiya. Wî û xwediyê paytonê bi hev re axifin û Yehya li paytonê siwar bû û hatin ba Dêwûd û Menafi. Yehyayî got:

- Ev mirov dibêje cihê ku em dê herinê pir dûr e. Hûn çi dibêjin, em li paytonê siwar bin an na? Şêst banknotî jî dixwaze. Serê her mirovî bîst... Menaf sor bû û got:

- Ew dizane ku em biyanî ne. Lewma ev çend pir dixwaze. Ez ji Mêrdinê heta Edenê bi sîh kaxeti hatime. Hem ez ne bawer im ku bîst kaxetê min hebe...

Menaf bi tirkiyeke nîvçe kete qirika mirovî. Pir di ber hev û dû dan û dawî bi çil û pênç banknotan li hev hatin.

Ajoyi paytonê berê hespan da ber bi nava bajêr. Kuçe û kolanek nema ku ne ketine. Kêfa zarokan li cih bû. Yehyayî destê xwe li pişta Menafi da û got:

- Bijî Menaf. Tu pir jêhatî yî. Heger ez bû ma, min dê şêst banknotî qebûl bikira. Di nava dengê qamiçiyan de Dawûdî got:

- Kek Yehya, em gava dinê ji vê riyê derbas ne bûn?

- Hi, nizanim...

Menafî pozê xwe hilkişand û got:

- Dawûd rast dibêje.

Yehya jî dizanibû ku rast e. Lê xwe lê nekir xwedî:

- Na lo! Kuçe tev weke hev in...

Hêja axeftinên wan dawî nihatibû payton rawestiya. Ajoyî perên xwe wergirt û ji wê derê bi lez winda bû.

Hîna tav derneketibû û li wê derê ji wan pê kes tune bû. Li ber deriyê xwendegehê yê hesinî, nêzî saetekê man. Dûre miroveke gir î bi xof hat. Zarokan xwe dane naskirin. Mirovê bi xof deriyê hesinî giran giran vekir. Ketin hewşeke pir mezin. Di nava hewşa fireh de sê avahî he bûn. Li milê çepê, avahiyeke sê tebeqe hebû, ku milê çepê seranser werdigirt. Li hêla dawî li navenda hewşê, avahiyeke çar tebeqe yî keviri û ne pir fireh hebû. Û li milê rastê, di qoziya hewşe de bînayekê şeş qat cih girtibû. Mirovê bi xof, gote wan:

- Hûn dê biçin avahiya milê çepê! Ya navîn ya mezinan e û ya milê rastê jî, cihê we razanê ye.

Herine li ser qenepekê rûnên hetanî dibe sibe.

Zarokan li hevdû nihêrtin. Kêfa wan di cih de şikest. Berê xwe dane qenepekê li nêzîk û li serê rûniştin. Pir sar bû. Ji serma, diranên wan li hev diketin. Ji bêxewî û ji serma diricifîn. Hinekê weha rûniştin. Dawûd ji aliyek û Menaf jî ji aliyek din ve serên xwe danîbûn ser milên Yehyayî. Yehyayî jî serikê xwe bir ser serê Dawûdî ve xwar kiribû. Çaxa ku çavên xwe verikin, hewş tijî zaro bûbû. Yehyayî henîşkên xwe li newqên Dawûd û Menafi da û gote wan:

- Zû rabin da em herin xwe bidin nivîsîn.

*

* *

Her sê heval li dersxanekê, bi cih kiribûn. Li deriyê fêrxanê xistin. Çaxa ku ketin hundirê fêrxanê, dersa pêşî destpêkiribu. Ketin hûndir. Mamoste navên wan nivîsî û ji Dawûdî re got:

- Tu li vir rûne!

Cihê ku Mamoste nîşanê Dawûdî dabû, li ba pencerê û li pêşiyê bû. Dawûd çû û rûnişt. Silav da kurikê li ba xwe. Lê kurik bersiv ne da û rûyê xwe tirş kir. Mamoste, ji Yehya û Menafi re jî got: "Herin ji xwe re li paş cih bibînin."

Li ber her mêzekê, du zar hebûn. Ne dixwestin ciyê wan teng bibe. Kesî cih neda Yehya û Menafî. Mamosteyî bi awireke tahl berê xwe da wan. Tirsiyan. Vêca xwe dane alî. Menaf cih dît û rûnişt. Lê Yehya hê jî li ser piyan bû. Zarokên mêza ku Yehya li ber rawestayî bû, hîna jî ne dixwastin ku ew rûnê. Yehyayî bi zorê û çiçkî jî bi dehfdan ji xwe re cih çê kir û rûnişt.

Çavê tevan li wan bû. Weke neyaran li wan diniherîn. Mamosteyî bi dengekî bilind dest bi fêrê kir. Çavan, berên xwe dane Mamosteyî. Wî digot:

- Zarokno! Dinya ji rojê qetiyaye û zemanekî gelekî dirêj li dora xwe doş bûye. Zîviriye, zîviriye hetanî ku sar bûye. Û Weki hûn dizanin hîna jî dizîvire.

Çaxa ku zengilê lêxist. Dawûd zû ji cih rabû. Wî fêhm kiribû ku piçekî bi derengî biketa, kurikê li teniştа wî, ewê xwe li Dawûdî bixista û derketiba. Loma Dawûd berî kurikê ji cih rabû. Piştî ku kurik derket, Dawûd dîsan li şûna xwe rûnişt. Dawûd rabû û rê dayê. Kurikî kir, weke ku wê rûnê, lê rûnenişt. Dawûd rabû û rê dayê. Kurikî kir, weke ku wê rûne, lê rûnenişt. Dawûd xwe careke din da alî. Milên wan li hevdû ket. Kurikî bi awirên tahl li Dawûdî nihêrt û çû.

Sê-çar roj bi vî awayî derbas bûn. Rewşa wan her dem ev bû. Rojekê, kurik ji Dawûdî pirsî:

- Tu ji ku derê yî?

- Mêrdîn.

- Tu jî weke yên dinê kurd î?

- Erê…

- Ez pir meraqan dikim. Rast bêje! Dûvikên we hene yan na?

Dawûd sor bû. Bi zorê bersîv da:

- Na, çima?

- Wisan. Ji me re dibêjin kurd bi dûv in.

- Min hîna kurdeki bi dûv ne dîtiye.

Kurikî dît ku baare bi Dawûdî. Xwe dîsan lewitand:

- Lê hûn cardin jî "kiro" ne.

Dawûd miçiqî. Qirik lê pûç bû. Her du henîşkên xwe danî ser mêzê û serê xwe xiste nava herdu destên xwe. Çavên wî tijî bûn û rê neda hêstirên wî bide der. Çend caran hêstirên xwe daqurtand.

Pê re, wê demê Dawûdî dûr çûbû... Her tişt weke filmekê di ber çavên wî re derbas bûn. Azmûn bi kêr hatibû. Bavê wî digot:

- Bijî kurê min. Ha wisan ha...

- Lê diya Dawûdî bêkêf bû:

- Na Seyda. Ez kurê xwe naşînim. Hê zarok e. Ew dê li biyanî û xerîbiyê bêyî dê, bêyî bav çawan bimîne?

- Kî wê cilên wî bişo, kî wê serê wî bişo?.. Bavê Dawûdî xwe aciz kir:

- Bes e Medê! Ez dê wî bişînim. Tu hilfirî li asmanan bikevî jî, ezê bi ya xwe bikim. Diya Dawûdî hîna cara pêşin sitûyê xwe xwar dikir:

- Ez çi bêjim bêkêr e. Beradayî ye. We biryara xwe daye, ma ne wilo?

- Erê. Kurê min ewê here bixwîne. Ew dê weke bavê xwe bibe mela. Ji vê gavê de tête ber çavên min ku ewî şaşik daye serê xwe.

- Berxê nêr, bona kêr. Lawo Xwedê bi te re be. Bi rastî, ji bo vê çûnê, tirsek di nava Dawûdî de hebû. Lê belê dîsan jî pir dixwest ku here. Evîna derketina derve wî dikişand. Mamostekî din hatibû. Dawûd pê ne hesiya bû. Di destê mamostê de şivikekê hebû. Hate li ba Dawûdî rawestiya û şivika destê xwe li serê Dawûdî da:

- Hoop, şiyar be. Ev der ne cihê razanê ye. Dawûd veciniqî û xwe rast kir. Mamosteyî digot:

- Dîroka me tirkan, ne weke gelên dinê ye. Em milletekî pir bi esl in. Ji navenda Asyayê hetanî nava Ewrûpa, erd di ber piyên hespên me de hejiya ne. Di hemû şaristaniyan de telîka me heye. Nivîsê bi xwe jî, me îcad kiriye. Ma sumerî kî ne? Ez bi bêjime we; tirk in. Ber bi êvarê, çaxa ku dibistan belav bû, her sê hevâl, çûne ba

Mamostekê, ku ewê cihê wan ê razanê nîşanî wan bida. Li ber devê deriyê odekê hebû, panzdeh-şanzdeh zarokên din. Tev jî weke hev bûn. Mamoste derket. Di destê wî lîsteyek hebû. Navên wan yeko yeko... jimart û di bere jî odekên wan û qatên odekan digot:

- Osman, Hesen, Nûrî... qat 1, ode 3... Qadir, Şêxmûs, Yehya, Menaf û Dawûd... qat 1, ode 4...

Her sê heval; Yehya, Menaf û Dawûd, li hev nihêrtin û ji hev re mizicîn. Piştî belevkirinê, çûn ji cihê cilşûştinê çarşefên livînên xwe girtin û berên xwe dan odekên xwe.

Menafî pir dixwest ku qata wan bilind ba û bikarîbana bajêr bidîtana.

Menafî pirsî:

- Gelo çima me hemûyan dane qata binî?

Şêxmûsî bersîv da:

- Ma tu nizanî, qatên jorîn ne ji bo me ne. Hinekî din hene weke me, lê ewana bê îmtîhan hatine. Pere razandine weke ku li otêlê bimînin. Xweşî û rehetî tev ji bona wan e... Qadirî got:

- Ez di êla bavê wan de bi... Xwedê zane, niha wê dê xwarinên me jî cuda bin. Ew dê goşt ji wan re here û rûn û hestî jî, ji me re...

Bi rastî jî, çaxa ku hatin xwarinxanê, wan ji hevdu cuda kirin. Hetanî ku sênîkên wan, kefçî û îskanên wan jî cihê bûn. Ji hêla jorîn re tas kebab çû û ji hêla jêrîn re ava germ hat. Di heskê de çend heb nok dixuyan... Piştî xwarinê jî yekî rabû û bi erebî dûayekî kir. Tevan jê re gotin "Amîn." Ev amîna, rojê sê caran bilind dibû. Birçî, têr, xweş - newxeş ferq ne dikir. Çend rojekê derbas bû. Memedê Cizîrî û Yaşarê Diyarbekirî jî hatin. Zarok pê kêfxweş bûbûn. Hêjmara wan bûbû heft. Ji zarokên mayîn kesî xwe li wan ne datanî.
Hêjmara wan bûbû heft. Ji zarokên mayîn kesî xwe li wan ne datanî.
Ji ber vê yekê dixwestin zêde bibin û qet nebe hevdû biparêzin. Di nava xwendekarên mezin de jî kurd hebûn. Abdullah û Memedê Xursî gihabûn sala dawî. Herduyan jî, ji van zarokên kurd î nûhatî hez dikirin û heta ji wan dihat, wan li dora xwe dicivandin. Gelekî camêr û dilsoz bûn. Di nava mezinan de Hemîd, Kerîm, Fethî,

Qasim û hinekên dinê jî he bûn. Hemîd û Kerîm kurmamên hevdû bûn. Di sinifa çaran de bûn. Carina dihatin bu zariwan, xwedî li wan derdiketin. Her weha, carina kom dibûn, hingê hêjimara wan dibû bîst kes. Wê gavê, çavên xiraban dişikestin. Şev û roj xilasî tune bû. Êvaran, piştî xwarinê, mamosteyên, ku ew şev nobedar bûn, li ber derî radiwestiyan û ne dihiştin kes ji nimêjê bireve. Wan rast dişandin mizgefta dibistanê. Piştî demeke kurt, berên wan didan sinifan. Nêzikî nimêja eşayê, wan berdidan û careka din ew dixistin mizgeftê. Sibehan, wexta ezanê, wan radikirin û dişandin mizgeftê û deriyê cîhê razanê jî diqefaltin. Yên ku di xewê de diman êdî baarîbûn derkevin. Navên wan kesan fan û hetani taştêya sibehê li wir diman. Her roj hal û rewşa wan ev bû. Dawûdê reben di hesreta têr razanê de bû. Her sibehî, çavên xwe yên bi şîlaq paqij dikir û li ser hev bawîşkan dida. Rewşa zarokên din jî ev bû. Rojekê, Yehyayî bi dengekî bilind got:

- Qeda li me bikeve. Çi karê me heye li vira? Ma melatî bi me ketiye? Ax kalo, Xwedê ji te ne razî be!

- Qadirî bi tinazî got:

- Amîîîn. Tu dibêjî qey tu li bavê min nifiran dikî...

Menafî bihnekî kişand:

- Oof, of! Yê min kes tune ye ku ez gazinan jîjê bikim. Ne bav, ne jî dê... Kalekî belengaz heye. Ew jî zimanê min nagere nifiran lê bikim. Qet nebe yê we...

**HENÎF**

Bavê Menafî qaçaxçî bû. Mehê du-sê caran canê xwe dixiste nava diranên xwe û ji nava mayinan derbasî Sûriyê dibû û dîsan her bi wî awayî dihat. Tev, ji bo perçekî qumaş, çar-pênc morîk û çend qîrûş pere bû. Her car diçû destê bavê xwe û digot:

- Bavo, ku ez mirim Sultanê û Helîmî emanetê te ne û li Siltanê dizîvirî û digot:

- Tu jî emirê bavo demekeve. Û diçû Helîmî hembêz dikir û li paş xwe ne difitilî, winda dibû û diçû. Sultanê jî li ber zayînê bû.

Terp û repa Menafî bû di zikê wê de. Ha derket, ha derneket.

- Belqitiyo, mirov dizane ku tu kur î. Hela lê binihêre, dike ku zîke min qul bike û derkeve.

Bavê wî jî digot:

- Menafê min li bavê xwe hatiye. Min jî sebir nekiriye, beriya rojê pengizî me…

Şevekê hevalên bavê Menafî hatin. Henîf, bavê Menafî pirsî:

- Xêr e?

Yûsifî got:

- Erê, xer ê. Ji me re kar derket.

- Ne, hûn zanin ku Sultanê li ber szaninê ye.

- Erê qurban… Lê bêyî te jî nabe. Em ketine ber bextê te. Pêşî zivistan e û qet nebe em bikaribin ji xwe re ard, şekir, rûn bikirin. Ew dê rewşa te jî baştir bibe.

Henîfî destê xwe di nava porê xwe de gerand û piçekî xurand. Li bavê xwe nihêrt. Bavê wî gote wî:

- Here kurê min. Madem bêyî te nabe, rabe. Qet bila çavên te li paş nemînin. Henîf rabû, pişta xwe girêda û çû Sultanê xatir bixwaze. Sultanê di nava ciyan de bû. Henîfî çokên xwe dane erdê û eniya Sultanê maçî kir. Çavên Sultanê tijî bûn. Henîfî bi dengekî tun got:

- Ku kur be Menaf, keç be, tu çi datînî…

Sultanê hêsirên xwe paqij kir û li pêy Henîfî got:

- Oxir be.

Nîvê şevê, Henîf û hevalên xwe hêdî hêdî berê xwe dane tixûb. Hingiya çûbûn û hatibûn, êdî Henîf dikarî bû çavgirtî di nava mayinan re biçûya. Hîv ketibû paş hewran. Tarî-zilmet bû. Henîfî got:

- Yallah…

Ew li pêş û yên mayîn li paş, ketin şopê û derbasî Sûriyê bûn. Çend rojekê derbas bû. Lê her şev sayî bû. Ji ber vê yekê, baaribûn bizîvirin. Meraqa Sultanê bûbû kula dilê Henîfî. Hew de bar kir û got:

- Hevalno, ez îşev diçim. Yên ku dixwazin, bila bidine pey min. Ku em li hêviya hewra bimînin, xwedê dizane emê hema hey li virbin.

Yûsifî bi dilekê şikestî got:

- Emir û temenê me ji Xwedê re. Me te bi zorê hanî. Belê, raste. Dizanim em nafilitin. Lê em çawa bikin… Tevan bi hev re biryar dan û li hêviya nîvê şevê man. Hîv dibiriqî. Henîfî bi heyecan got:

Tu çareya we tune ye. Ez dê we bidim dest."

Çar-pênc gav mabûn ku ji mayinan xilas bibin. Henîf weke her car li pêş bu. Ji nişkê ve rawestiya û baş mêze kir. Bi qasî bîst-sîh gav ji têlên tixûb wêde tiştekî hesinî dibiriqî. Henîfî bi heyecan got:

Zû vezelin, leşker. Hêja gotina xwe neqedandibû dengekî bilind bû:

- Rawestin!

Tev li erdê vezeliya bûn. Henîfî bi lez got:

- Bi şûnde!...

Gulle li ser serên wan difîkandin. Bi lez dikişkişîn. Henîfî berê xwe da leşkeran û ewî jî bersîv da û di ber re jî got:

- Hûn herin. Ez dê we biparêzim.

Yûsifî got:

- Na, ez dê jî bimînim.

- Ez ji te re dibêjim here…

- Na xêr…

Çaxa ku wan weha dihaxîfîn, yên, mayîn dûr çûbûn.

Wan û leşkeran pir di ber hev dan. Carina bi tirkî: "Ah anam, yandîm!" bilind dibû û terpînîyek ji erdê radibû. Leşkerên tirk her ku diçû, nêzîk dibûn. Êdî rizgarî (xilasî) nema bû. Henîfî got:

- Yûsif, tu dûrtir î, rabe bazde. Ez dê te biparêzim. Divête ku yek ji me rizgar be. Yûsif kelegirînî bû û got:

- Keko ez te ji bîr nakim. Heqê xwe li min helal bike.

- Helal xweş… Çaxa ku min got sisê, rabe û bazde. Yek kêliyekî ji bi şûnde mexe… Yek… Dudo… Sisê…

Her du bi hev re rabûn. Yûsifî berê xwe da Sûriyê û Henifî jî berê xwe da leşkeran û seranser agir berda. Hebû deh-panzdeh gulle bi hev re hatin. Canê Henîfî bû weke moxilê. Yûsif li paş xwe nihêrt û kire qêrîn:

- Henîîîf!...

Ew çax Yûsif ji şopê derketibû û pê li mayinekê kiribû. Piyê wî yê rastê û perçên mayînê û toz û dûxan bi hev re rabûn asmanan...

Sultanê li ber hêşa zayinê bû. Hêja şefeqê lê nedabû, gote "Ax!"

Pîra Fatê ronahiya lampê bêhtir kir û got:

- Dem e.

Dengê azana sibehê û giriyê Menafî bi hev re derketibûn. Kalikê wî li ser xanî bû û destmêj digirt. Çaxa ku herdu dengan bi hev re sah kir, go:

- Xêr be meşalê.

Sê çar sal derbas bûbûn. Her tişt hatibû ji bîr kirin. Kurê gavanê gund û Sultane dil girtibûn. Bi dizî hevdu didîtin û biryar dabûn ku bi revin.

Şevekê ji şevan Sultanê Menafî baş hembêz kir, wî li ser hev çend caran paç kir û wî xiste nava ciyan. Hetanî ku Menaf di xew re çû, serê wî miz da û boxçika xwe hilda û bi dîzî ji malê derket.

Bi salan deng ji wan derneket; êdî Menaf mezin bûbû. Karê malê mabû li ser pişta wî û birayê wî. Kaloyî digot:

- Helîm nexwendi ma. Qet nebe tu bixwîne Menafo. Di saxîtiya xwe de ku min bidîta tu bûye melayê vî gundî!..

Menafî domand:

- Qet nebe yê we, dê kî we, baveki we heye...

Zarokan hemûyan berê xwe dane Menafî. Hêsirên ku ji çavên Menafî dihatin, kezaba teva peritand.

Bêdeng tev çûn ser ser ciyê xwe û Menaf ji hundir derket û çû serçavê xwe bişo.

## MIHEMEDÊ XURSÎ

Çend meh derbas bûn. Roj bi roj hêjmara zarokên kurd zêde dibû. Li hev diciviyan. Kesî barîbû li wan şaş binihêriya. Lê her roj giliya wan dikirin. Rojekê Mihemedê Xursî û Abdullayî ci nava civatê birin ba serkarê xwendegehê. Sê rojan kesî wan ne dît. Roja çaran, Dawûd li ber devê deriyê xwendegehê li Abdulla rast hat. Bi kêf berê xwe dayê. Lê Abdullahî got:

- Neyê ba min.
- Çima?
- Wisan.
- Kek!
- Ji min û Mihemedi dûr rawestin.

Dawûdî tiştekî fêm nekir. Serê xwe xurand û bi dileke şikesti paş ve zîvîrî.

Her ji sê çar rojan carekê bangî Mihemed û Abdullah dikirin û her car, herdu heval ji carên mayîn xirabtir vedigeriyan. Rojekê, seh kirin ku Mihemedê Xursî û mamostakî bi hev re şer kirine û Mehemed pir lêdan xwariye. Çûye îdara xwendegehê û li wê derê jî lêdan xwariye. Sedem ders bû. Ewî mamosteyî ders daye wan û gotiye "Divête hûn vê pirtûkê ji cîhekê temîn bikin û ji min re naveroka wê derînin." Pirtûk li ser dîroka tirkan bû. Mihemed dersa xwe çênekiribû. Mamoste ji mêj ve jê re diran diqirçand. Ev ji wî bûbû sedemek hêja. Bi daran ketibû ser serê Mihemed. Li destên wi, li pişta wî dabû. Heta ku dar di pişta wî de şikestibû, Mihemedi deng nekiribû. Lê derba dawî, ew pir hêşandibû. Mihemedî ji mamosteyî re gotibû:

- Bes e tu li min dixî!
- Tu bersiv jî didî ha... Kurê q......n. Ez dizanim te çima çênekiriye. Tu dibêjî ez ne tirk im, ez kurd im. Bejî kurê bejiyan!
- Tu yi.

Mamoste bû xezeb û ajot ser Mihemedî. Bi kulman ketine her hevdu. Lê Mamoste pir gir bû. Weke berazekî bû. Mihemedê reben pelixandibû. Paşê Mamosteyî Mihemed bi xwe re biribû îdara dibistanê û li wê derê jî sê Mamoste ketibûn ser serê Mihemed û bir serde jî pazdeh roj ceza jî dabûnê. Şansê Memedî heba ku bi xêra Abdullahî zarokên sinifê îfadên xwe baş dabûn. Heger na, Mihemed ji xwendegehê dihate avêtin.

## DAVÛD DIÇE MALÊ

Û herî dawî, semestira zivistanê giha hawara wan. Zaro weke nûçê bûbûn ji dayikên xwe... Bi kêf û bi tinaz rojên xwe yên dawi derbas kirin.

Nivê şevê bû teqînîya derî. Ji hundir î got:

- Kî ye?

Dawûdî dengê diya xwe nas kir û got:

- Yadê, ez im, Dawûd.

- Ez bi qurban, tu yî?

Diya Dawûdî derî zû vekir û kurê xwe hembêz kir. Bavê Dawûdî jî rabû bû û bi hezkirin got:

- Heylo, kurê min bûye peya.

Zaro tev şiyar bûbûn. Şahiyek kete nava malê. Ew şev hetanî destê sibehê ranezan. Ji vir, ji wir axefîn. Dawûd, heta jê hat xwe memnûn nîşan da. Bi rastî, ne ji wî bajarî û ne jî ji wê xwendegehê hez kiribû. Lê ne dixwest ku diya wî kêfşikestî bimîne Halê bavê wî jî ne tu hal bû. Birek zaro hebû di malê de. Dawûd "Qet nebe," digot di dilê xwe de "Qet nebe ez derketim ji stuyê wî..."

Her ku roja çûyinê nêzîk dibû, tirsa dilê Dawûdî bêhtir dibû. Xwe weke mehkûmekî didît. Bêçare ewê careke din biçûya û têketa wê zindanê. Şevekê xewa Dawûdî reviya. Di nava ciyan de, vî alî-wî alî zîvirî, nebû. Kir ku rabe ser xwe, dengê bavê xwe sah kir. Bavê wî digot:

- Medê, hişê xwe bîne serê xwe!

- Na Seyda, ez qet tehemmul nakim. Tu nabînî, kurik bûye weke pelê çilo. Tu pif bikî, ewê bikeve.

- Keçê, bêhiş nebe. Ev xêra Xwedê ye. Şeş zarok û ew jî dike heft.

- Hiiş dengê xwe bilind meke.

- Erê erê. Lê tu jî bêje erê, bila bi riya xwe de here.

- Ez çi bêjim!...

Dawûdî fam kir ku bavê wî rast dibêje. Biryar da ku êdî qet madê xwe nake. Ber êvarkî, baholka xwe ya biçûk, ya ku tam baorya

bejbaa wî ya kiba û hûrik bû, hilda û kete rê. Hêsirên çavê diya xwe hê nû didît. Destê wê maç kir û zû jê derbas bû. Ne dixwest, ku hêsirên wî yên li ber ketinê li ber diya wî bêne xwarê...

Dawûdî li pey xwe dengê avê sah kir. Li paş xwe ne fitilî. Hew destê xwe yê vala rakir, hejand û daxist.

Roj bi roj kula dilê Dawûdî bêhtir dibû. Ne hevalan ew vedikirin û ne jî dersan. Kuxukeke pîs jî bûbû bela serê wî. Bi roj tiştekî wî tune bû, lê êvaran, çaxa ku dikete nava ciyan kuxukê dest pê dikir. Panzdeh-bîst rojan, ne ew raza û ne jî hişt ku hevalên wî razên. Pir şerm dikir. Lê tevan, jê hez dikirin û kesî ne digot "Ev çi kuxik e?" Rojekê, yekî dermanekî dayê û kuxik ji nişka ve sekinî.

## DENÎZ KÎ YE?

Mihemedê Xursî pir bêzar bû. Abdullah jî li bâlê bû. Di destê Abdullah de rojnameyekî hebû. Ne Mihemed û ne jî Abdullah bi axaftin bûn. Yehyayî got:

- Kek, ma tu dikarî rojnamê bidî min?

Abdullah rojnamê dirêj kir. Yehyayî girt û vekir. Çavên Menafî û Dawûdî li rojnamê aliqîn. Li serî, rojnamê digot: "Denîz û hevalên xwe cezayên xwe dîtin..."

Menafî got:

- Denîz kî ye?

Yehyayî got:

- Nizanim.

Çavên Dawûdî li çavên Mihemedî geriyan. Mihemedî çavên xwe revand û berê xwe guheri. Zîlê lê da. Bela bûn. Pirsa Menêf û çavên Mihemedî ji bîra Dawûdî dernediket: "Denîz kî ye?".

Ketin dersxanê. Bîsteke din Mamosteyê dersa quranê kete hundir. Du-sê caran di nava rêza mêzan de zîvirî. Destên xwe di hevdû dan û got:

- We tevan bihîst, ne... Anarşîstan bidarve kirin. Dawiya bêîmanan, xwedênenasan û xayinan ev e...

Dawûdî li çavên mamosteyî nihêrt, dikeniyan. Ji kefan ser-xweş bû. Dûre çavên Mihemedî hatin bîra Dawûdî. Ji mamosteyî bêzi (nefret) kir.

Ji ser vê, du roj derbas nebûnûn, polîsan, mamosteyekî wan girtibûn û avêtibûn zîndanê.

Hende zarokên xwendegehê ji hev re digotin:

- We dît, Mamoste Elî girtine.

- Erê, dibêjin komûnîst bû.

- Pê re pirtûk hatine girtin.

- Ji xwe kîjan Mamosteyê dersa fen û matematîkê hebin, hemû komûnîst in.

- Le, tev bi zanebûn hatine xwendegeha me. Ji bona ku hizra (fıkra) me neçê (xirab) bikin.

- Xwedê me ji wan biparêze!...

Dawûdî her tiştî sah dikir. Dixwest ku fêhm bike, lê ji her tişti ewçend dûr bû ku nizanîbû dê çi bike. Bi şev di nava ciyan de gevizi. Dûre Mihemed, Mamoste Elî, Mamosteyê Quranê zarokên ku behsa Mamoste Elî dikirin, yek bi yek derbas bûn li pey hev weke xiyalekê. Nêzîkî ezana sipêdê, di xewê re çûbû. Demeke kin derbas bû, bi dengekê veciniqî.

- De rabe nimêjê.

Ji nav nivînan rabû, rûnişt. Şîlaqa çavên xwe paqij kir û çû tahretê.

## KERÎM

Édî ne Mihemedê Xursî û ne jî Abdullah hebûn. Wana xwendegehê bi teqereqê biribûn serî. Hewşa dibistanê bê wan vala xuya dikir. Yehya got:

- Dawiyê ji vê rizgar bûn.

Menafî got:

- Aqîbet li serê me be. Were çar sal û pênc meh, were!

Mihemedê Cizîrî keniya û got:

- Kalo nemire buhar hat…

Qadirî jê re temam kir:

- ...pîrê nemire pincar hat...

Bîstekî kesî nihaxifî. Xwe weke sêwiyan didîtin.

Cîhe ku Mihemedê Xursî û Abdulla vala kiribû, Kerîm û Hemîdî dixwestin dagirin. Diçûn û dihatin. Çi ji destên wan dihat, li pey xwe ne dihiştin. Yek ji yekî ciwanmêrtir bûn. Hemîd mizawîr bû. Ziravokî bû. Çi biketa destê wî dixwend û ji xwendegehê bêhtir ji danû standinên ji derve hez dikir. Hinek gundiyên wan hebûn. Li Edenê bi cih bûbûn. Şembî û yekşembên Kerîm û Hemîd li ba wan derbas dibûn. Çûn û hatinên Kerîm û Hemîdî bala hinekan dikişand. Ji alê din ve dan û standinên wan bi zarokan re jî ketibû ser. Ne dixwestin ku zarokên kurd li hev kom bibin. Daxwaziya wan ev bû, ku her yek bi alekê ve bela bibin û bêxwedî bimînin. Ew çax, ewê bikarîbana wan di nava xwe de bihelînin û mêjûyên wan bişon. Lê Kerîm ji xwe de bihelînin û mêjûyên wan bişon. Lê Kerîm ji xwe re weke astengeke (manieke) mezin didît... Heger ne ew ba, ew dê zarokan zûtir baoriya wan şikil bigirtana.

Rojekê van dilnexwazanan li hev civiyan û biryar standin ji bona ku Kerîm çavtirsî bikin. Vî karî jî dane ew kesên ku di sefa Kerîmî de bûn.

Dotira rojê, çaxa ku zîla dawî lê da, sê heb li ber derî rawestiyan. Kerîm hêdi hêdi pirtûkên xwe top kir u berê xwe da derî. Lê yekî ji wan bi milê Kerîmî girt û got:

- Kerîm, were em piçek bihaxifin.

Kerîmî got:

- Tiştekî me yî axiftinê nîn e.

- Heye.

- Çi ye?

- Ma, ne çi ye? got yekî din.

Kerîmî lê mêze kir. Kurik yekî weke qedenakê bû û di navbera xwendekaran de, di boksê de, di giraniya hefte û pênç kîloyan de, li Edenê, kesê yekemîn bû. Destê xwe yê rastê givaştibû û li kefa destê xwe yî mayîn dida. Kerîm rawestiya û got:

- Fermo, ez li we guhdarî. Hûn çi dixwazin?

Kurikî ku bi milê wî girtibû got:

- Me sah kiriye, ku tu bi kommunîstan re didî û distîni.

- Derew e.

- Hevalên me derewan nakin.

Kerîm zer bû. Nexwest lê guhdarî bike. Xwest ku derkeve, lê kurikê sisiyan yê ku di orta derî de sekinî bû, bi herdu destan Kerîm dahf da. Kerîm weke zarokekî li ser qûnê li erdê ket. Pirtûkên wî her yek bi aliyek de çûn.

Boksorî got:

- Hê maye kiro! Çi çax me xwest tê herî.

Kerîmî pirtûkên xwe jî erdê hilda. Rabû ser piyan. Xwe dawşand. Destên wî tev bi toz bûne. Nihaxifi. Yê ku bi milê wî girtibû.

- Me tiştekî dinê ji sah kiriye. Tu, ew zarokên ku ji rojhilata welêt hatine, wan li dora xwe kom dikî û propoxande dikî. Tev ji we hîn bûne, kes nabêje ez Tirk im. Hûn eslên wan bi wan didine inkar kirin, got û li navka çavên Kerîmî nihêrt û pirsî:

- Tu tirk î yan jî kurd î?

- ...

- Çima tu bersiv nadi?

- Ev çi pirs e?

- Himm... Nexwe rast e...

- Çi rast e?

- Q...ê diya te...

Kerîm hate ber girînê û got:

Kurikî li ber derî got:

- Ku tu mêr bî, va ye derî...

Kerîmî xwest ku bi bazdan derkeve, lê boksor şîlmaqekê li paş stûyê Kerîmî da. Kerîm bi dev ve kumişî erdê. Zû rabû û yê li ber derî dahf da, wî li ser piştê xiste xware û bazda. Ew li pêş û yên mayîn jî li paş bi derencekan de berxwar bûn. Her gavekî boksor weke du gavên Kerîm bûn. Wî Kerîm di qata duduyan de zeft kir. Bi

destekî sînga Kerîm bi hişkî girt û bi destê mayîn boksekê li çenga wî da. Çenga Kerîm bi derbekê re şikiya. Boksek din hat û li ser pozê Kerîmî ket. Xwînê weke ava bilbilokê (henefiyê) avêt der. Boksor, Kerîm mîna balgîyekê pekand û ji hevalên xwe re got:

- Zû, hê ku kesî em nedîtine…

Dawûd, Menaf û Yehya bi heyecan li ber deriyê nexweşxanê diçûn û dihatin. Ne dihiştin, bu bikevine hundir. Yahya xwe avêt mirovê ber derî:

- Em tev bêkes in… Ji me pê ve kes tune ye, ku li wî bipirse. Qenciyekê bi me bike. Mirov dawiyê hate rehmê û got:

- Tenê yekî, dikarim berdim.

Yehyayî bi lez bi pêlikan de rapelikî. Tiştekî pir hindik ma û dageriya hat. Dawûd û Menafî bi çavên vekirî lê dinihêrtin. Yehyayî got:

- Bêxêr e. Lê dibêjin ewê sax bibe.

Buhar destpê kiribû. Her der heşîn bûbû. Daran pel vekiribûn. Lê pelên di nava zarokan venekiribûn. Tev bêxwedî mabûn: Kerîm piştî nexweşxanê, bi çendakî jî, di rewîra xwendegehê de raza. Tehlike nemabû. Lê her ku diçû, Kerîm qelstir dibû. Çenga wî dirûtibûn, lê xwar mabû. Bi kesî re nedihaxifî. Raporeke dirêj danê û ew şandin welatê wî Midyadê. Hemîd jî pê re şandin. Çaxa ku otobus bi rê ket, Kerîm destekî xwe rakir û danî. Çavên wî tije bûbûn. Dawûdî xwe zeft nekir û hêsirên wî weke baranê hatin xwarê. Menaf kete milê wî û hêdî hêdî çûn.

## XORTÊ HÊJA

Rojekê mamosteki û xortekî hivdeh-hîjdehsalî, ketin sinifê. Mamosteyî got:

- Ev hevalê we nû hatiye. Navê wî Mehdî ye.

Dûre mamoste bi destnîşanî (îşaretan) ji Mehdî re got here li paşiyê rûnê. Mehdî bêdeng çû rûnişt. Herkesî lê dinihêrt. Ew jî serê xwe rakiribû û bi çavên vala li mamoste dinihêrt. Mamosteyî dest bi dersê kir:

- Welatê me Tirkiye ye, ji heft êrdiman ava ye. Marmara, Ege, Akdenîz, Karadenîz, Îç Anadolu û her duduyên mayîn jî Dogu û Guneydogu Anadolu ne…

Zîlê lêxist. Zaro derketin. Yehya hêdî rabû çû ba Mehdî û jê pirsî:

- Tu ji ku derê yî?

- Ji Diyarbekirê.

Yehya kêfxweş bûbû.

- Tu bi xêr hatî. Ez jî Mêrdînê me. Bangî Menaf û Dawûdî kir. Ew jî hatin. Destê Mehdî hejandin û xwe pê dane naskirin. Dûre Menafî pirsî:

- Xêr e, wextî dema xwendinê biqede, tu hê nûh têyî!.

Mehdî bihneke kûr kişand û got:

- Ez ajotî me, sirgûn bûme.

Dawûdî got:

- Ji ber çi?

- Min û mamosteyekî, me şer kir. Mirovekî zahf pîs bû. Çêrê me dida. Min hew debirand. Ez rabûmê û min lê da.

Mehdî çîroka xwe ji serî hetanî binî ji wan re got. Tevan bi mereq û hijmekarî lê guhdarî dikirin û kesî xeberdanên wî ne dibirî.

Bi rastî jî Mehdî baora temenê (emrê) xwe gir xuya dikir. Xurt û bi navpî bû. Jê dihat… Zû ji hevdû hez kirin.

Jiyana zarokan guherî bû. Ew kêfa ku winda kiribûn paş ve hatibû. Mehdî bi dengekî şewitî ji wan distira. Di destpêkê de, çawan ku digot: "Eyşana Elî…" Yehyayî destê xwe li pişta wî dida û digot:

- Erê qurban erê.

Roj ji rojan avis bû, meh ji mehan… Payiz, zivistan li pey hev derbas bûn. Gul û çîçekan her der xemilandin. Dawûdî bejin dihavêt. Hema hema bûbû weke Yehya. Êdî Yehyayî serê wî miz nedida, dikete milê wî. Dawûd xwe qure dikir. Di zikê xwe de digot: "Ez ji Menafî derbas bûm. Saleke din jî ji Yehyayî…" Menafî bi tinazî digot:

- Erê lawo, erê. Xwedê hem di qirdê me û hem jî di bejna me

de...

Yehyayî digot:

- Na kuro, na... Tu dikevî gunehan.

- De here wêde lo tu jî. Feleka me şaş bûye, tu hê behsa gunehan dikî...

Wê gavê Mehdî digot:

- Yehya, mirov dizane ku reha şêxan di te de heye. Dev ji kurik berde. Çi dibêje, bi kêfa xwe ye.

Manafî gotina xwe nebir serî:

-Ez jî, Dawûd jî, em herdu jî bejin dihavêjin. Lê cudahî ew e ku Dawûd ber bi jor diçe û ez jî ber bi jêr...

Keneke wisan li wan girt ku êdî bi zikên xwe digirtin.

Rojên duşemban ne dihate kişandin... Her du dersên pêşî yên Mamoste Necdetî bûn. Mirovekî pir bi xezeb bû. Kî mêr ba, ewê nihata dersa wî. Çaxa ku yek nihatiba, mamoste ji yê li teniştа wî rûdinişt dipirsî. "Nizanim..." tune bû. Kê bigota "Nizanim." mala wî xira dibû. Misoger lêdan dixwar. Tevayiya zaroyan ji Mamosteyî ditirsiyan. Bejna wî hebû du metre û baora bejna xwe dagirtî bû jî.

Baş dihate bîra Dawûdî. Ev mamoste bû ku li Mihemedê Xursî dabû. Qiseta mamoste Necdet û Mihemedê Xursî ji Mehdî re jî gotibûn. Mehdî digot:

- Ez dê rojekê dê û xwehên wî b......m.

Mamoste Necdetî dersekê pir giran dabû wan. Nîvê sinifê dersê çênekiribû û ji ber vê yekê, mişe ji wan ji tirsê ew roj nihatibûn xwendegehê. Yehya jî nihatibû. Mamoste kete sinifê. Lê nihêrt ku sinif bi nîvî ye. Hêrs bû. Li dersan ne nihêrt û got:

-Evana xwe bi aqil dizanin ha! Em dê duşemba bê hevdû bibînin. Li nava sinifê çû û hat. Dûre navên wanê nihatî yek bi yek nivîsî. Ew roj dersekê din da wan ên li wir amade bûn û got:

- Ji wan re jî bêjin, kî nehat, ez zanim...

Roj weke bayê derbas bûn. Hew lê nihêrtin ku duşemb hat. Bi tirs ketine sinifê. Necdet hat. Sinif temam bû. Darekê pir qalind hebû di destê Mamoste de. Dar danî ser masê û got:

- Berê em dê hesabê dersa mayîn bibînin.

Kaxetekê ji bêrîka xwe deranî û bi nav, yek bi yek bangî wan kesên ji dersa wî reviyabûn, kir. Bi wî darê qalind zarokan tev reş û şîn kir. Çaxa ku dordihate Yehyayî, Dawûdî çavên xwe digirt.

Di dawiya dersê de Mamoste careke din bareke giran dabû ser pişta wan. Karê wan ev bû, ku pirtûkeke Zîya Gokalp wê bihata xwendin û kurteya naveroka wê derêxistana. Piştî ku zîlê lêxist û Mamoste çû, zarokan tev serî rakirin. Mehdî got:

- Evî bênamûsî îmana me çikand. Ders, ders, ders... û bi serde jî lêdan.

Bû roja duşembê. Yên ku pirtûk peyda kiribûn hindik bûn. Ji nîvê sinifê bêhtir destvala hatibûn. Rojek beriya wê, Mehdî, Yehya, Dawûd, Menaf, Qadir û Şêxmûs biryar dabûn, ku nekevin dersê. Lê Mehdî dixwest ku sinif bi temamî nekeve dersê. Beriya ku Mamoste were, rabû ser lingan û got:

- Hevalino, em niha çend heval me biryara xwe daye ku em nakevin dersê. Lê ev ne çare ye. Divête ku em sinifê bi temamî vala bikin. Ji bona ku Mamoste baş fêhm bike ku em ne ker in. Ew çax ji herk serîkî dengekî, bilind bû. Tevan jî digotin:

- Rast e, em nakevin dersê.

Mehdî got:

- Nexwe va em diçin sînemayê. Kî dixwaze, ew dê li pey me were. Yê ku pere nîn e, ji kîsê min e. Û pirtûkên xwe hilda û derket. Yehya, Dawûd û yên mayîn li pey wî derketin. Mamoste Necdet weke her caran, bi gavên berfireh û bi serhejî hat û bi dewarkî derî vekir. Çavên wî yên çêlekî bûnê weke farên otomobîlê. Sinif vengî-vala bû. Hew di qoziyekê de şagirtekî xwe li ser hev givaştibû. Mamosteyî gote belku şaş hatiye. Derket, li lewha derî nihêrt, na tu şaş î tune bû. Bi pehînê deryê nivçe dahf da. Derî çû li dîwêr ket. Kurik veciniqî, rabû ser xwe, cit sekinî. Rengê wî bûbû mîna pembuyê. Mamosteyî got:

- Kanê yên mayîn?..

- Nizanim...

- Çawa tu nizanî?.

Kurik diricifî. Mamosteyî bi çepilê wî girt û di erdê de ew gevizand. Çend pehîn lê da û bi porê wî girt, kişand û wî rakir ser piyan û got:

- Li kû derê ne?

- Tev derketin çûn…

- Bi kude?...

- Sînemayê…

- Çima?

- Nizanim…

Kulmiskekê hat li ser pozê kurikî danî. Xwînê avêt der. Hêsir weke baranê hatin. Bi girîn got:

- Ji ber te reviyan…

- Himm… Kî bû li pêşî?

- !!…

- Kî bû kurê q.....ê?

- Mehdî…

- Mehdî ha!...

Kurikî serê xwe kire ber xwe. Mamosteyî bi xezebî got:

- Tu çima li vir î?

- Ez tirsiyam…

- Ji kê?

- Ji te…

Mamosteyî bi guhê wî girt û di pey xwe ra kişkişand. Çûne ba serkarê xwendegehê.

*

* *

Piştî sinemayê xort li hev civiyan. Yekî ji wan got:

- Em de sibehê çi bersîv bidin?

Mehdî lê vêgerand:

- Kes bila behsa sînemayê neke. Her yek tiştekî bêjîn. Bibêjin "Ez nexweş bûm…", bêjin "di xewê de mabûm…", lê bila nizanibin ku haya me ji hev hebû.

Yehyayî got:

- Hevalino, nexwe soz bidin. Dûre ji bona ku em bikaribin li ruyên hev binihêrin... De werin.

Tevan jî soza xwe dan û her yek ber bi aliyekî de çûn.

*

* *

Roja sêşembê tevan kom kirin birin. Haya kesî ji Hesenî tune bû. Kesî nizanibû ku Hesen wê rojê paş ve zîvirîbû û paşê çi hatibû serê wî. Tev ji xwe bawer bûn. Bi rastî, kargêriya (îdara) dibistanê jî, mamoste Necdet jî, Hesen jî, rolên xwe baş dileyîstin. Hesen weke ku hayim-tayim be, hatibû û ew jî bi wanên mayîn re li hêviya dora xwe bû ku here îfadê bide.

Ki biketa hundir, têr lêdan dixwar û dûre jê re digotin:

- Haya me ji her tiştî heye. Înkar meke. Kê we bêgav (mecbûr) kir? Bêje û xwe rizgar (xilas) bike. Bêsûd (bêfaîde), digotin "Mehdi..." û kaxet îmze dikirin. Çaxa ku yek derdiket, mamosteyên li ber dêri nedihiştin ku ew kes bi yên mayîn re kontaktê bike û bi lez yêkî din dibirin hundir.

Pirsiyariya (îfadekirina) wan hetanî êvarê berdewam kir. Hew Dawûd, Yehya, Menaf û Mehdî mabûn. Di beriya wan de Şêxmûs û Qadir çûn îfade dan. Lê ew herdu weke yên mayîn derneketin. Şêxmûs dikuliya. Xwest li wan raweste, lê mamostyekî ji wanê li ber derî, ewî bi dahfdan ji wir dûr kir. Qadir jî çaxa ku derket, bi milekî xwe girtibû û çavên wî sor bûbûn. Li Mehdî nihêrt û çavên xwe girt. Dûre Dawûdî birin.

Wan çi digot, Dawûdî red dikir. Pir li wî dan. Cilên wî tev di xwînê de mabûn.

Jê re digotin.

- Binihêre, tevan îmze kiriye. Fêde nîne. Bêje, Mehdî bû, ne?

- Na, ez bûm. Min wisan kir.

- Kesî navê te negotiye.

- Hemû virran dikin. Naxwazin navê min bibêjin.

Dawûdî îfada xwe temam kir. Lê ew kaxet îmze nekir. Wî di

dîwêr de asê kirin û terqû-berq lê dan. Derî vebû. Bi çepilê Dawûdî girtin û ewî avêtin ber derî. Xwînê dewam dikir. Menafi bi sivikayî xwe gîhande Dawûd. Mendîla xwe deranî û da destê wî. Dawûdî bi dizî got:

- Teva li ser Mehdî îfade daye... Mamosteyê ku Şexmûs ji wir dûr kiribû, bi guhê Dawûdî girt û ewî rakir ser piyan û pehînekî li qorika wî da. Dawûd pengizî, çû... Piştî Dawûdî, Menaf û Yehyayî jî çûn têr lêdan xwarin. Lê îmze nekirin. Kirin ne kirin Yehya û Menaf li ser Mehdî îfade nedan. Darê ku serê Menaf şikenandibû di destê Yehyayî de şikestibû. Û axir, dawiya tevan, Mehdî kete hũndir. Aqûbeta xwe dizanîbû. Nehişt kes lê bide. Kê lê da, wî jî li wî da. Du mamosteyan Mehdî girtin û yê sisiyan bi boksan kete ser zikê Mehdî. Horîniyekî ji Mehdî derket. Ewî berdan. Kete xwarê. Ji xwe çûbû. Tirsiyan. Qolonyê lê kirin, av reşandin. Mehdî çavên xwe vekir û çêrê wan da. Êdî kesî newêrî bû ku cardin lê bide. Hew yekî got:

- Mehdî va ye tevan gotiye wî karî te kiriye...

Mehdî axifta wî ji devê wî girt:

- Erê, min kiriye.

- Çima?

- Ez bibêjim çima?... Gelo we ji kesî pirs kiriye, nika bê ji bo çi min wisa kiriye?

- Na, ew karê me ye. Em zanin emê çi pirs bikin. Tu bersîv bide. Çima?

- Mamoste Necdet bela serê dibistanê ye. Niha hûn dibistanê tev bînin îfadê, yek bi çeyî derheqê wî de xeber nade. Heger hûn vê pirsiyarê jî ji zarokan nekin, ez dê herim hetanî Enqerê... Mamosteyekî îfada Mehdî bi temamî girt û danî ber. Mehdî xwend. Mizicî, îmze kir û avêt ber wan. Derî vebû. Mehdî weke qumandanekî derket.

Ew roj, kesî ji tirs û ji şerman bi kesî re neaxifî. Hew Hesen xurt filitîbu. Lê ewî jî weke ku lêdan xwaribe xwe digivaşt ser hev. Du roj derbas bûbûn. Dîsan bang zarokan tevan kirin û ev car pirsa Mamoste Necdetî ji wan kirin. Zarokan tevan mêranî nîşan dan û çi

hate ber devê wan gotin. Hew Hesenî bi tenê pesnê Necdetî da. Dûre zarokan seh kirin ku îfada Mamoste Necdetî jî hatiye girtin. Bi vê yekê kêfxweş bûn. Lê dîsan jî ji Mehdî şerm dikirin. Mehdî şerma wan fêhm dikir û ji wan re dikeniya.

Dawûd û Menafî bi dizî dest bi pirsiyarê kiribûn. Çaxa ku çûbûn sînemayê, kî bi kê re bû tev fêhm kirin. Hesen bi tenê mabû. Wî jî digot:

- Ez nexweş bûm. Çûm razam.

Dawûdî digot:

- Heger ez bim, xayin Hesen e. Lê çawa em dê lê heq bikin!...

Menafî deng ne dikir.

Di ser bûyerê re çend rojek derbas bûbû. Kes nemabû ku sah nekiribû. Rojekê, zarokên kurd, dîsan li hev kom bûbûn. Tev bi mahd bûn. Hemîd jî hatibû. Hîna kula Kerîmê reben nihatibû jibîrkirin, bi ser de jî ev bûyer çêbûbû. Hemîd pir mereqan dikir. Bûyerê, jê re ji serî hetanî binî gotin. Tiştek kêm nehiştin. Heta ku Dawûdî behsa lêkolîna xwe û Menafî jê re got û tiştên ku derheqê Hesenî de jî dihizirî, got. Ji nişkê ve çavên Hemîdî biriqîn û pirsî:

- Çi roj bû?

Dawûd:

- Duşemb…

- Çi çax bû?

- Berya dersan…

- Himm… Baş hate bîra min. Ew roj ez dereng hatim. Min lez dikir ji bona ku ez bigihêm dersê. Zîlê lêdabû û di hewşê de kesek tune bû. Tam di devê derî de ez laqê Mamoste Necdetî hatim. Bi guhê kurikekî girtibû û ewî li pey xwe dikişand. Gelo ne ew be?.

- Ez bi qurbana te bim lo… Niha tu wî kurikî bibînî tu dê wî nas bikî?

- Ez bawer im.

- Nexwe tu li vira raweste, ez herim wî kurikî bixapînim û derxînim hewşê. Ku ew be, ji Dawûdî re bibêje.

Pir neçûbû Menaf û Hesen, milên wan di hev de, bi kêf û ken

derketin. Menafî jê re mizawirî dikir. Hirre-hirra Hesen bû dikeniya. Hatin di ber Hemîdî re derbas bûn. Hemîdî li Dawûdî nihêrt û got:

- Bi sê telaqên bêfutû ew bû.

- Gelekî sipas, got Dawûdî.

- Hemîdî pirsî:

- Hûn dê çi bikin?

- Nizanim…

- Bi aqil bin. Xwe din mekin. Kurik bi Dîhekî ve nareve. Ca em binihêrin ka wê çi bê serê we û Mehdî… Dûre em dê baor wê tiştekî li cîh (munasib) bibînin. Kete serê Dawûdî. Ji Yehya û Manafî re jî nerînên Hemîdî got. Wan jî pejirand.

*

* *

Êdî zeman derbas nedibû. Tev li hêviya biryara dibistanê bûn û dibistan jî li hêviya Anqerê bû. Deh rojekî bêdeng ma. Herkes, herder… Mamosteyên mayîn, êdî li zarokên bi şevînî (yatılı) tahde ne dikirin. Roja yanzdehan bombe teqiya. Nîvrokî bû. Zîlê lêdabû û xwendekâr hemû kom bûbûn. Serkarê dibistanê derket ser pêlekan. Di destê wî de kaxetek hebû. Berê li rêzên razorkan yek bi yek nihêrt. Dûre bi dengekî berz got:

- Ez dixwazim biryarekê li ber we tevan bixwînim. Jibona ku hûn tev îbret bigirin.

Û xwend:

-Filan roj… filan seet…

Dawûd ji rengek dikete rengekî din. Ne ji bona xwe bû. Wisan zanibû (texmîn dikir) ku ewê cezayekî mezin bidine Mehdî. Li Mehdî nihêrt. Şopa heyecanê bi Mehdî re tune bû. Weke her caran sakin û bi aram bû Mehdî. Rûyê wî bi ken bû. Herî dawî serkarê dibistanê gotinên xwe bire serî:

- Piştî îfadeyan û pirsiyar û tehqîqatan; Yehya, Menaf, Qadir, Şêxmûs heft roj, Dawûd panzdeh roj ji xwendegehê bi dûr xistin…

- Weke din, sinif bi temamî hate îxtarkirin û…

Serkare xwendegehê çavên xwe li Mehdî gerand û got:

- Û Mehdî jî heqê xwe yê xwendinê winda dike. Êdî ne li vir û ne jî li cîheke din, baare bixwîne. Mehdî bi dengekî bilind û qalind got:

- Ya Mamoste Necdetî?

-Ew te elaqedar (têkildar) nake.

- Kî elaqedar dike?

- Bicehenime here…

- Tu bersiva min bide...

- Ez ne bêgav im. Yellah, siktir be!

Mehdî hêrs bûbû:

- Edeba xwe xirab neke. Yan na, ez jina te ya q…e ziyaret dikim…

Serkarê dibistanê hate xezebê. Kef ji devê dihat. Êrîş kir. Du mamosteyên din jî pê re êrîş kirin. Ew çax mamosteyekî din bazda çû telefonê polîs bike. Mamostên mayîn jî berê xwe dane Mehdî. Lê zarokên sinifê Mehdî xistin nava xwe û nehiştin kes xwe bigihênê. Mehdî jî dixwest êrîşî wan bike, lê her ku diçû zarokên navçîtiyê bêhtir dibûn. Menafî got:

- Mehdî, bireve. Vêga ew dê polîs werin.

Mehdî bêhtir hêrs bû:

- Ez di diya polîsan n…m.

Dawûd, Yehya û Şêxmûs ketin milên Mehdî û ew bi zorê derxistin derve, hewşa, dibistanê.

Hê Mehdî neketibû kuçekê, dengê otomobîla polîsan hat. Serekê dibistanê çû ba polîsan, bi hev re xeber dan. Dûre serekê dibistanê ji mamosteyekî re got:

- Zarokan bişînin sinifên wan.

Paşê ew û polîs ketin odeka wî.

Piştî wê rojê, ne Mehdî xuya bû û ne jî kesî jê xeberek wergirt. Kêmasiya wî bûbû xencerek û ketibû dilê Dawûdî. Her ku diçû nefreta wî bêhtir dibû. Mehdî çûbû… Hesen bi ya xwe mabû û mamoste Necdet weke berazan diçû-dihat. Kerîm hate bîra Dawûdî. Bi çenga şikestî û sitûxwar wî bi rê kiribûn. Dûre xeber girtibûn ku

Kerîmî dev ji dibistanê berdabû. Yên ku lêdabûn jî milên xwe dihejandin û weke qabadayiyan (begnazan) difîkandin. Dem dema wan bû. Kêf kêfa wan bû. Mehkema wan dewam dikir. Lê xwediyên wan dewlemend bûn, piştên wan xurt bûn. Ji xwe dadger (hakim) û dadgir (sawcî) ji xwarinê re amade bûn. Kerîme reben, pere tune bû ku were mehkemê jî. Ev ji tevan xirabtir (neçêtir) bû. Kes nemabû ku dahwe jî bimîne. Û vêca jî, weke cara mayîn… "Ya Hesen!... Hela ez baarim bi Mamoste Necdetî, ya Hesenî!..." digot Dawûdî.

## BENDAV

Germa havînê dest pêkiribû. Êdî germê ders nedihatin kişandin. Ne jî îmtîhanên (azmûnên) dawî bûna, kesî li pirtûkan nedinihêrt. Dawiya her hefteyan, şembî û yekşemban, zaro diçûn ber bi barajê de û pirî caran diketin ava Seyhanê. Çemeke kûr bû û nêzî ber bi barajê bêhtir kûr dibû. Her sal bi dehan mirov tê de difetisîn.

Ji rojan, çarşembe bû. Û ew roj Dawûd û Menaf, Hesenî xapandin û biryar dan ku herine berajê. Ji kesî re negotin. Ji bazarê hinek balcanên sor, penêr, zeytûn û du heb nan kirîn û bi rê ketin. Hesen pir bi kêf bû. Navbera wî û Menaf gelekî xweş bû. Menafî çi digot? Hesenî bi ya wî dikir. Di rê de Menaf stranan digot. Dawûd heta jê dihaf xwe kêfxweş nîşan dida.

Ciyekî bi sîh dîtin û rûniştin. Bihna xwe vedan. Ji her derê dûr bûn. Hesen li ser çîmenê vezeliya. Menafî xwe li ser kêlekê dirêj kir û enîşka xwe danî erdê. Berê wî li Hesenî bû. Dawûd jî çarmêrkî rûniştibû. Ji vir ji wir dihaxifîn. Hêdî hêdî dihatin bûyera sînemayê Menafî got:

- Ew çi roj bû… ne wisan?

Dawûdî got:

- Qet mepirse…

Hesen zer bû. Rabû, dîsan rûnişt. Menafî li çavên Hesen nihêrt û domand:

- Niha min zanîba kîjan bêdavî me da dest, min'ê wî di kevçiyek av de bixeniqanda…

Dawûdî got:

- Ya ez... Hûn dizanin min'ê çi kiriba?

Hesen ji rengek kete rengekî din. Berê xwe da Dêwûd û ji bo ku keslê nekeve şubhê xwe mecbûrê haxiftinê dît bi zorê got:

- Te yê çi kiriba?

Dawûd jî li hêviya vî tiştî bû:

- Min dê ewî serserkî bi şaxên vê darê ve daleqanda û bi vê qayişê ji laşê wî reş û şîn kiriba...

Dora Menafî bû:

- Hesen, gelo tu tiştekî nizanî? Em dikin û nakin vî bênamûsî tesbît nakin.

Hesenî di cih de got:

- Ez ew roj nexweş bûm û çûm razam. Ez tiştekî nizanim...

Dawûdî li çavên Hesenî nihêrt. Hesenî çavên xwe revand û serê xwe berra erdê da. Dawûd êdî ji zilamê xwe bawer bû. Li Menafî nihêrt. Menafî bi serê xwe jê re got "Ne vêga..."

Demekê, bêdeng man. Paşê Menafî got:

- De em rabin!

Hesen veciniqi. Ewî gote qey ew dê hêrîşî ser wî bikin. Menafî tirsa wî fêhm kir û got:

- Çem li hêviya me ye...

Hesenî kenekê li ber girînê kir. Dawûd jî rabû ser piyan û ser berjor de hilkişiyan. Çik çika çivîkan bû. Her xişîniya pelekê, ziravê Hesenî diqetand. Weke miriyan dimeşiya. Gupe gupa dilê wî, guhên Dawûdî ker dikir. Meşka dapira Dawûdî hate ber çavên Dawûdî. Dûre Mehdî di ber çavên wî re derbas bû. Destên xwe givaşt. Diranên xwe qiriçand... Lê hîna dem nihatibû. Menaf li pêş, Dawûd li pey Menaf û Hesenî jî li herî dawî, diçûn. Kaşekî cit î ji kaşê mayîn bilindtir dest pêkiribû. Pê ve rapelikîn. Hema hema bi çarpiyan hildikişiyan. Di nîvê kaşê de Menaf pê li gomeyekî kir. Bala Dawûdî li Menafî bû. Dît ku gome ji cih leqiya, bi telaş got:

- Menaf!

Menaf jî bi gome hisiyabû û bi lez û bez xwe avêt pêş. Wê çaxê

gome ji ciyê xwe gindirî. Dawûd xwe zû ji ber da âlî. Lê Hesen dereng mabû. Ew û gome bi hevre gindirîn. Teqlo meqlo bûn. Ew gomeyê mezin di ser zikê Hesenî re derbas bû. Axînekî ji Hesenî bilind bû. Hetanî xwarê kaşê û li pey gome, hebû deh teqle avêt û li gome sekinî. Weke termekî li erdê dirêjketî bû. Dawûd û Menaf bi lez li pey wî daketin xwarê. Dev û pozê Hesen di nava xwînê de mabûn. Bi çepilên wî girtin û ewî dane rûniştandin. Borîna Hesenî bû, digiriya. Hêsirên wî weke baranê dihatine xwarê. Gelekî êşiya bû. Menafî piyên wî, milên wî kontrol kir. Rewşa Hesen xirab bû. Henîşkekî wî û herdû gûzekên wî çerm avêtibûn û xwîn diçizirandin. Şalê wî çiriya bû. Ji bona ku bi laşê wî çerm avêtibûn û xwîn diçizirandin. Şalê wî çiriya bû. Ji bona ku bi laşê wî ve nezeliqe, şalê wî ji wî kirin. Ew kîn û nefreta (bêziya) ku beriya pêne kêliyan (deqiqeyan) bi Dawûd re hebû, şûna xwe ji dilovanî û rehmê re hişt. Dilê wî şewitî bi halê Hesen. Destmalka xwe derhanî û dev û pozê Hesenî jî xwînê paqij kir. Menaf jî ji alek ve enîşk û gûzekên Hesenî paqij dikir. Hesenî giriya xwe betal kir. Çilma pozê xwe hilkişand û çavên xwe paqij kir. Berê li Menafî nihêrt û dûre vegeriya li Dawûdî nihêrt. Herdu jî ji dil û can alîkariya wî dikirin. Şerm kir. Serê xwe kir ber xwe û got:

- Ez dê ji we ra tiştekî bêjim…

Menafî got:

- Bibêje Hesen.

- Ez ezabekî dikişînim. Her şev, çaxa ku ez diçim razanê, şiklê Mehdî tête ber çavên min. Ez mirovekî nebaş im. Vêga hûn çi bi min bikin, ez musteheq im. Ew bênamûsê, ew bêbavê xayin ez bûm… Li min xin. Min bikujin. Lê li min bubihurin.

Tûka Dawûdî bûbû golek di devê wî de. Gote tuff û avêt ser rûyê Hesen. Tûka Dawûdî weke daxmekî li eniya Hesenî danî. Dûre hêdî hêdî bi ser rûyê wî de herikî. Hesen bi herdu destan rûyê xwe girt û bu fişe fişa wî. Dawûdî destê xwe rakir. Lê Menafî hişk bi destê wî girt. Hesenî xwe zû avêt destê Dawûdî din û bû mirçe mirça wî. Dûre Hesenî destê Menafî jî girt û ewî jî li ser hev çend caran

maçî kir. Dawûd nerm bûbû. Di şûna xwe de rûnişt. Menafî destê xe avêt ser milê Hesen û got:

- Me zanîbû tu yî. Lê me dixwest ku tu bi xwe bibêjî yan jî em li te bidin. Va ye li xwe mukir hatî. Tiştê bûye, çûye. Êdî bêsûd û fêde ye. Maşalê derekî te ne şikestibe… Ca rabe…

Hesen hêdî hêdî rabû ser piya. Çend gav avêt, dikuliya.

Dawûdî got:

- Çawa ye, tê karibî?

- Erê, ez dê bikaribim…

Menafî got:

- Rûnê, piçekî hilma xwe vede.

Hesen rûnişt. Êdî neditirsiya. Menaf çû avrijandinê. Dawûdî bi darikekê erd dikola. Ne serê xwe radikir û ne jî dihaxifî. Hesenî li birînên xwe dinihêrt. Diêşiyan, lê derekî wî neşikestibû. Xwîn zuwa bûbû.

Menaf hat, li ber Hesenî rewestiya û li jor nihêrt. Dûre ji Hesenî pirsî:

- Te hilma xwe veda?

- Erê, ez amade me.

Dawûd jî rabû. Xwe ji tozê dawşand û got:

- Heta serê kaş em bikevin milên Hesen ew dê çêtir be.

Ketin milên Hesenî. Çaxa ku kaş xilas bû, baraja bi heybet xuya kir. Dengê xume xuma avê dihat. Sirek hêba bihna wan vekir. Hesen got:

- Min berdin. Ez biceribînim.

Hesenî berdan. Deh panzdeh gav çû. Her gavekî wî yê nû ji yên mayîn çêtir bû. Rawestiya. Li paş xwe fitilî û bi kêf got:

- Hûn çima rawestî ne, çem li hêviya me ye.

Dawûd û Menaf pê keniyan û Menaf dîsan dest bi stranên xwe yên nîvçemayî kir.

*

* *

Piştî xwarinê, Menafî cilên xwe ji ber xwe kir û kete avê. Ji Dawûd û Hesen re jî got:

- Werin, miriyên xwe ji bîr bikin.

Hesenî bi serhêjandinê xwe got "Na", Dawûdî got:

- Bîstekî din.

Menafî got:

- Hûn dizanin.

Û Menafî xwe di nava avê de teqlo meqlo kir û got: "Ox!." dûre dest bi sobeberiyê kir û vebû. Ber bi cîhên kûr ve diçû. Hesenî cilên xwe ji xwe kir û xwe da ber tavê. Dawûd hêdî hêdî bişkojkên cilên xwe vedikir.

Menaf pir vebûbû û hema bi zorê dihate xuya. Bala Hesenî li Menafî bû. Berê destê Menafî dît. Ji wan re bi desthêjandinê dixwest tiştekî bibêje. Hesen jî destê xwe rakir. Lê Menafî destê xwe li ser hev radikir. Dûre bû ware war wî. Hesen zû rabû û xwe avêt nava avê û berê xwe da Menaf. Dawûdî hîna fêhm nekiribû. Çaxa ku Hesenî xwe avêt nava avê, ew jî rabû û da pey Hesenî. Bi rastî, Hesen jî avê re jêhatî bû. Zû xwe gîhande Menaf. Bi çepilê Menafî girt û ewî hêdî hêdî kişand. Dûre Dawûdî giha wan. Her yekî ji aliyekî ve Menafî zeft kirin. Menaf bêdeng bû. Hew çavên fereh bûbûn û li ser hev hilm vedida.

Menaf bi ser zik ve razandin. Bû olqînî û Menaf vereşiya. Bi qasî tasek av ji devê wî hat. Dûre wî dane rûniştandin. Diricifî. Dawûd hemû cilan avêt ser wî û ewî baş nixumand. Hesen vêketibû li çîpên Menafî masaj dikir. Goştê çîpên Menafî bûbûn weke qayişê. Dawûdî jî dest bi masajê kir. Hêdî hêdî damarên wî sist bûn û rengê Menaf xweş bû. Hesenî got:

- Derbasbûyî be.

Menafî lê vegerand:

- Spas…

Dawûdî destê xwe da ser pişta Hesen û got:

- Êdî dora şermê hate me. Tu ne mirovekî xirabî. Ez dixwazim…

Hesenî axiftina Dawûdî birî:

- Ev ji min re bû sedemek… Qet tiştekî nebêje. Ne pêwîst e.

Ketin bêdengî û aramiyeke (sukûneteke) dûr-dirêj. Dûre Hesenî got:

- Dawûd, ew roj min pir lêdan xwar. Xweziya şahidên min hebaya!.. Lê çi fêde, ez qels bûm. Wan çi got min mîna wan kir. Rizgarî tunebû.

Menafî got:

-Hesen, vê meselê bigire û carekê din veneke. Ji niha û pê ve tu birayê me yî. Ne wisan Dawûd?

Dawûdî bi ken bersîv da:

- Bêşik…

Ew çax baskên Hesenî hebây, ew dê bifiriya ji kêfan li asîmanan biketa.

**BELAVBÛN**

Civata zarokên kurd têkçûbû. Her yek bi aliyek ve çûbû. Dawiyê ew kesên ku ne dixwestin zarokên kurd bigihên hev, gîhabûn armanca xwe. Zarokên kurd, êdî hatibûn wê rewşê, ku bêyî axeftin, bêyî silav lihevdan, ji ber hev derbas dibûn. Berê ji tirsan û pê re pê re jî, bi zanebûn… Qels û lawaz ketibûn û bangêşî û şik û gumanbiriyên paşverûyên tirk, ew pelixandibûn, ji hev bela wela kiribûn. Di vê yekê de tilîkên hin kurdên ku xwe frotibûn, an jî hatibûn xapandin jî hebûn. Bi rastî, êdî kesî, xwe li kurdayetiyê danedanî û piraniyên wan digotin: "Em tev musluman in, tirk çi ye - kurd çi ye!..."

Dawûdî xwe dabû sporê û ji her tiştî dûr radiwestiya. Menaf dil girtibû, ji ber evîndariyê derbeder û bêzar bû. Vê havînê, çaxa ku çûbû Diyarbekirê, ji bo ku diya xwe bibîne, rast li Felekê jî hatibû…

Beriya salekê, diya Menaf hatibû gund û xwe avêtibû dest û piyên kalikê Menaf û ber bextê wî. Gundî tev li wan civiyabûn û tevan dixwestin, ku diya Menaf were bexişandin û efû kirin. Herî dawî, kalik nerm bûbû û gotibû: "Heta ku Menafo û Helîmo wan efû nekin, ez tiştekî nabêjim."… Sultanê, diya Menafî, çokên xwe danîbû erdê û bi çavên tijîhêsir, berê li Helîm, dûre jî Menafî nihêrt

bû. Paşê serê xwe xwar kiribû. Dûr û dirêj bi wî awayî rawestiyabûn. Helîmî bi simbêlên xwe dileyîst. Menaf hema hey li situyê diya xwe li ba xwe ne dîbû. Qîrîniyekê wisan jê rabûbû ku cîran tev hatibûn hawarê... Menafî qet ne dixwest, lê dîsan jî dê bû. Şîrê wê xwaribû... Mirov bêkêmasî nedibû... Ya baş jibîrvekirin bû... Û mezinahî di bexişandinê de bû. Menaf çûbû destê diya xwe maçî kiribû. Li pey wî Helîm jî çûbû destwê diya xwe. Diya wan rabûbû ser piyan û destên xwe danîbû ser sînga xwe û li kaloyî dinihêrt. Kaloyî berê xwe dabû aliyê mêhvanan û bêyî ku li Sultanê binihêre, destê xwe dirêj kiribû. Sultanê bi lez destê dirêjkirî girtibû û li ser hev sê caran maçî kiribû û danibû ser serê xwe. Çaxa ku xatir xwastibû, adresa xwe dabû wan û gotibû: "Carina werin û bibînin ku ez çawa xwe ji we re dikime qurban!...

Di ser re hîna salekî neçûbû, diya Menaf bêxêr bûbû û ketibû nava ciyan. Ji Menafî re nameyekî şandibû Edenê û xwe dihavêt Menaf ji bona ku here wê bibîne. Beriya ku xwendegeh bête girtin bi çend rojekî, destûr û îzîn girtibû ji dibistanê bi sedema nexweşiya diya xwe û raste rast berê xwe dabû Diyarbekirê. Diya wî di nava ciyan de bû. Menaf li ber serê diya xwe rûniştibû û destê wê xistibû nava destên xwe. Carekê bûbû terqîniya derî û hêdî hêdî vebûbû. Wê çaxê Menafî gotibû qey roj ji asmanan qetiyabû û ketibû hundir. Kiribû nekiribû çavên wî ji wê rojê neqetiyabûn. Diya Menaf gotibû: "Felekê! Were keça min! Ne xerîb e, kurê min menaf e."... Felekê hatibû nêzîk û çavên wê yên xezalî rohnkayî xistibû nava Menaf û bi nermî gotibû: "Tu bi xêr hatiyî."... Menaf qemirîbû û xwêdanê, heniya wî birixandibû. Zimanê wî hatibû girtin. Bêxeberdan, hew serê xwe hejwandibû. Roja dinê, dotira rojê û her roj, Felekê hatibû ba diya wî. Menaf gelekî kêfxweş dibû bi hatinên Felekê re. Û kêfxweşiyên xwe jî veneşartibû. Felekê jî kefa xwe ji Menafî re dihanî...

Piştî ku Menaf çûbû gund, ji xwarin û vexwarinê bûbû. Ne ewî ji havîna xwe tahm standibû û ne jî kesî ji wî...

Vêca jî çi caran digihê Dawûdî, behsa Felekê jê re dike. Wisan

bûye ku êdî Dawûd hûr û kûr bi her tiştên wan dizane. Carekê got:

- Bes e lo, te guhên min kerr kirin.

- Erê lawo, erê, bila were serê te, em'ê bibînin…

- Bi rastî, piştî ku min vî halê te dît, bila ji min dûr be…

- Axa. Felekê!.. Tu ji min dûr î û ev kurik rewşa min fêhm nake. Gelo ez çi bikim!..

- Hilkişe qata şeşan û xwe bihavêje. Tu dê jê rizgar bibî, ezê jî… Û dûre Dawûdî bi bazdan çû tuwaletê. Menafî pirtûka xwe vekir û dest bi xwendinê kir. Lê mixabin tîp û herf tev: "F, E, L, E, K" û "ê" bûn. Çi dikir, ne dibû. Çavên xwe difirikand, dîsan dinihêrt û dîsan hemû gotinan "Felekê" dixwend.

*

* *

Yehya êdî bi Mihemedê Cizîrî re digeriya. Carina bi Dawûd û Menaf re dibûn çarkes. Le ev demana pir kêm bûn.

Hemîdî jî xwendegeh biribû serî. Çaxa ku xatir xwestibû, ji Dawûdî re gotibû: "Bila her dem hişê te li serê te be û pir hevalan ji xwe re çêneke. Kerîmî çima lêdan xwar, vê yekê jî qet ji bîr neke."

## AMELIYAT

Cejna remezanê nêzîk bûbû. Zarokan tevan amadekariyên xwe yên çûna bajarên xwe dikirin. Kêfeke bêsalox ketibû dilê wan. Dawûd bi tenê bêmahd bû; hêşa serê wî avêtibû pişta wî. Taqet nedikir ku li ser piyan rawestaya. Çû cem sihhiyê dibistanê û ji bo ku here ba doktor xwe da nivîsîn.

Nexweşên wê rojê tevan, li ber deriyê doktorî ketibûn dorê. Kî diçû, bi çendî du- sê hilmên cigarê dima û paş ve dihat. Yên li ber derî mayî dipirsîn. Nexweş digot:

- Çi dizanim çiyê min heye? Mirovî ji doktorî ditirse…

Nexweşekî din digot:

- Bê pirs û salox, hema reçetê dadigire û dilde destê mirov û di bêje: "Bangî yê din bikin."

Dora Dawûdî hatibû. Weke ku li deriyê serekê dibistanê bide, li

derî da. Dûre kete hundir. Doktorî mahd û birûskê xwe kir û got:

- Hi… yê te?

Dawûdî got:

- Duhî û pêr serê min zaf dihêşiya. Agirê min hebû. Vê sibehê ez bi piştêşê şiyar bûm…

Doktorî got:

- Temam, temam… Te sermê girtiye. Te xwe cemidandiye…

Doktorî reçetekê nivîsî û da destê Dawûd û bi destan jê re got here… Dawûd derket û raste rast çû dermanên xwe ji dermanxanê wergirt, hanî.

Sê roj derbas bûn. Her ku diçû êş li bedena Dawûd belav dibû. Êşê ji piştê avêtibû ser sînga wî. Dûre jî zikê wî… Bê-hal ketibû. Di ser de jî, dermanan wî navêşî kiribûn û tu sûd wû fêna wan jî ne dîtibû. Roja çaran, destê sibehê, bi êşeke pir mezin şiyar bû. Destê xwe avêtê, weke hêkêkê gir bû. Hişk bû û wisan zor didayê, ku hema li ber teqînê bû. Dawûdî zor kir sibeh. Raste rast çû nig sihhiyê û xwast ku dîsan here ba doktorî. Sihiyê awirek dayê û got:

- Ez te nêşînim.

- Çima?

- Hîna tu wê rojê çûyî…

- Çi dibe ku ez çûbim?

- Zor nede min, here karê xwe!

- Tu bêgav (mecbûr) î, got Dawûdî. Dengê wî bilind derketibû. Ji odeka kêlekê alîkarê serekê dibistanê ji cih pekiya û hat hundir û bi hêrs got:

- Çi ye, çi bûye, çi qewimiye?

Sihhiyê got:

- Ev kurik hîna wê rojê çû ba doktor û birrek derman stand. Vêga dîsan dixwaze here ba doktorî.

Alîkarê serekê dibistanê li Dawûdî fetilî û got:

- Xwedê bela we bide. Yên ku ji dersan direvin, hemû têne vê derê.

Dawûdî got:

- Ez ji dersan narevim... Ez nexweş im.
- Tu virran dikî. Yellah, biqeşite, siktir be!
Dawûdî ji ber hêşan bi newqa xwe girt û kir qêrîn:
- Ger ku bi min tiştek bibe, ewê ji we bête pirs kirin. Hevalên min tev dizanin ku ez niha li vir im...
Alîkarê serekê dibistanê got:
- Tu me tehdît dikî, na?.. Û ajot ser Dawûdî. Dawûdî gavek bi şûn de avêt û bi lez qayişa şalê xwe vekir û şal ji şemitand û got:
- Ger ku hûn ji min bawer nakin, werin bi çavên xwe bibînin.
Alîkar di cih de rawestiya. Sihiyê hat, baş li wermê nihêrt, destê xwe dayê û got:
- Ne tiştek e. Te serma girtiye.
Dawûd zoq li çavên Sihiyê nihêrt û got:
-Tu li serê min bûyî doktor, bavo. Tu ji ku derê dizanî ku ev ne tiştek e?
Alîkarê serek got:
-Nexwe, wî nexweş binivîse û tu jî here. Ku derew be, ez jê re zanim çi bêjim. Sihiyê destên xwe firikand û got:
- Ez weke îmana xwe dizanim. Ku ew'ê derewin derkeve.
Dawûdî got:
- Em dê bibînin wê kî şerm bike!...
Sihiyê li pêş, Dawûd li paş, ketin rê. Sihiye bi lez diçû. Dawûd bi dijwarî bi rê ve diçû. Carina Sihiye û li Dawûdî dizîvirî û dibinê simbêla xwe ya ziravikî re dimizicî û di got:
- De hadê...
Dawûd hîç nihaxifî. Ketibû derdê êşên di laşê xwe. Reng pê ve nemabû. Piştî birêveçûneke dûrûdirêj, ketin apartmana ku doktor lê bû. Dawûd hetanî qata duduyan bi dijwarî hilkişiya. Mabû qatek bi tenê. Dawûd rawestiya, hilma xwe veda. Sihiyê li bayê xwe hilkişiya û raste rast çû nig doktor. Dawûd, dest di newqê de, hêdî hêdî xwe berbijor kir. Gava ku pêlek neman, destê xwe da dîwêr û pişta xwe yê xûz, rast kir. Serê xwe rakir û dît ku deriyê odeka doktorî vekirî ye û doktor û Sihiye bi mahne lê dinihêrin. Dawûdî di dilê xwe de

got: "Ev bênamûsê Sihiye, doktor jî xapandiye!...

Dawût hat hetanî ber derî û li wê derê rawestiya. Ew çax doktor ji re got:

- Were xorto! Ka binihêrin derdê te çi ye?

Dawûd kete hundirî. Destê wî bi qayişa şalê ve bû. Doktorî got:

- Lezê meke. Here li wê derê vezele.

Dawûdî bi ya doktorî kir, çû xwe li ciyê nîşande dirêj kir. Doktor rabû û hat cem Dawûdî. Sihiye jî hat. Her ku doktorî destê xwe dihavêt ciyê werimanî û zor didayê, Dawûdî axîn radikir. Mahdê wî tahl dibû. Doktor kete telaşê û got:

- Zû, zû! Divête di nava bîst û çar seetan de, tu ameliyat bibî. Ev apandîst e. Ku bi derengî bikeve, ew dê biteqe.

Dawûdî hêşa xwe ji bîr kir û bi çavekî xezeb li sihhiyê nihêrt. Sihiye ji şerm û tirsan ketibû binê erdê. Zimanê wî li hev geriya. Tûka xwe bi dijwarî daqurtand û got:

- Tu hîç mereqan nekî. Ez dê her tiştî safî bikim.

Dawûdî bi awireke hêrsîn lê nihêrt. Tiştek ne got. Sihiyê domand:

- Tu hêdî hêdî dakeve xwarê. Ez vêga diçim motorbisiklêta xwe dihênim û te lê suwar dikim, dibim nexweşxanê.

Û Sihiye li hêviya bersiva Dawûdî ranewestiya û ji odê zû derket. Bi bejbaa xwe ya kiba û qalind, weke qurmekî di derencekan de gindirî, çû.

Hetanî ku Dawûdî cilên xwe li xwe kir û rabû ser piyan, doktor ewraqên wî yên ji bo formalîtên nexweşxanê amade kir û da destê Dawûd. Dûre doktor rûnişt kaxetekê din tijî kir û îmze kir û wi jî da destê Dawûdî û jê re got:

- Hûn dê rasterast herin Nexweşxana Dewletê. Divête evan formalîtanan tev, îro temam bibin û tu îşev li nexweşxanê razê. Bila derbasbûyî be.

Dawûd bi nermî li doktorî nihêrt û got:

- Gelekî spas dikim…

Dawûd bi nermî li doktorî nihêrt û got:

- Gelekî spas dikim…

Dawûd hêdî hêdî daket ser rê. Dizanîbû ku êdî Sihiye xuya nabe, lê dîsan jî got, ca ez piçekî li hêviya wî rawestim.

Baranê dest pêkiribû. Dawûdî gumana xwe baş ji Sihiyê birî bû. Destê wî di newqa wî de, berê xwe da nexweşxanê. Mîratê zahf dûr bû. Qirûşek perê wî jî tune bû, ku li tiştekî suwar be, here. Êdî derengi bû, ku here dibistanê ji hevalên xwe jî bixwaze.

Çakêta Dawûdî teba tev şil bûbû. Dawûdî zerfa ku doktorî dabû wî xistibû paşila xwe û bi destekî jî, hişk pê girtibû. Man û nemana wî tev bi wê zerfê ve girêdayî bû.

Çaxa ku Dawûd pira kevirî ya ku li ser çemê Seyhanê bû, derbas kir, hilma xwe veda. Nexweşxane ji wê mabû sed- du sed gav.

Bi qasê saetekê formalîteyên nexweşxanê çûne serî. Lê Dawûd jî xilas bûbû. Geh diçû vî derîyî, geh diçû wî derîyî. Ya baş ew bu ku li ser wê kaxetka ku doktor piştî zerfê dabûyê dinivîsî; "acil"! An na rewşa Dawûd nebaş bû. Qiyametek mirov hebû li nexweşxanê… Niçe-niça peyan, kuxte-kuxta, ax û ofînên nexweşan û qîre-qîre zaroyan hemû tev li hev bûbûn… Piştî formalîte tev xilas bûn, ji Dawûd re gotin: "Here, cilên xwe yên razanê û tişt-miştên ku dê ji te re pêwîst (lazim) bibin bihêne û zû were."

Qudûmên Dawûdî şikestibûn… Hanî ber çavên xwe; bi çendî dinyatin. Dilê Dawûdî ji birçîna dixeliya. Li xwe xurcilî, na, tune bû pere. Bi rê de çû. Êş ne bes bû, ev car jî qurîniya zikê wî dest pêkiribû. Destê xwe avêt bêrîka xwe, cigara ku veşartibû derhanî. Ew jî şil bûbû. Got: "şil-mil, baş e ku tu heyî…" Paşê ji mirovekî jê agir xwest û cigare pê xist. Mîratê bi zikê birçî ne dihate kişandin. Piştî sê-çar hilman, cigarê ji ser pirê avête nava Seyhanê û got: "Lahnet li te jî û li yên te didin kişandin jî bê!..."

Yehyayî li ber deriyê dibistanê bi destê Dawûdî girt û got:

-Heyran ma tu li kû derê mayî? Em tev ketin bîr û mereqa te.

Menaf û Mihemedê Cizîrî jî hatin.

Dawûdî got:

- Ez dê ameliyat bibim.

Menafî got:

- Hişş…

- Tiştekî tirsê tune ye. Apandîst e. Karê pênc kêliyan (deqîqan) e. Lê jê nebaştir, ez birçî me û perê min jî tune ye.

Menafî got:

- Ez vêga têm…

Dawûdî li pey Menafî nihêrt. Yehyayî bi dizî pere deranî û xiste bêrîka Dawûdî. Dawûdî bi destê wî girt. Wî û Yehya di ber hev dan. Lê dît ku destê Mihemedê cîzîrî jî kete bêrika wî ya din.

Memedî got:

- Bibuhure, ev qediya…

Bi rastî, Dawûd jî li hêviya tiştekî weha bû û ji xwe, bi devê xwe ketibûyê. Ku ne gotiba: "Ez birçî me û perên min jî tunene." Vêga ne Menaf diçû ji bona ku jê re xwarin bîne û ne jî Yehya û Mihemed vî tiştê hanê dikirin. Dawûdî got:

- Ji we herdukan re jî spas.

Menaf xuya bû. Di destê wî de paketek û şûşak dew hebû. Dan destên Dawûdî. Dawûdî pakêtê vekir. Bîhneke xweş kete pozê wî. Di nava nan de goştê sorkirî, felqên sorikan û du filfilên tûj î qelandî jî tê de bûn. Kete ser. Menafî pirsî:

- Nexwe tu li vir mayî, ne wisa?

- Êrê…

- De were di vê şeva erîfê de û li ser rê, mirov bikeve nexweşxanê!...

- Qismet e ezbenî.

- Nexwe ku ez çûm Qezê, çi bikim?

- Xwe nîşanê yên me nede. Ku tu laqê wan hatî jî, bibêje "Dilê wî nexwest were. Ji otobusê acil dibe."

Mihemedî got:

- Ma qey tu vêga xeber naşînî ji dê û bavê xwe re?

- Na.

- Bila cejna wan jehr nebe. Ez dizanim ku ew dê her du jî werin û komekî zarok li malê ewê perîşan bibin.

- Yehyayî got:

- Lo, tu mêr î. Ka were ez çavên te maçî bikim.

Dawûdî serê xwe dirêj kir. Yehyayî got mirç û ji heniya Dawûdî maç kir... Êdî kesî xeber nedida. Dawûdî xwarina xwe hemû xwar. Cilên xwe yên pêdivî (lazimi) kom kir û xiste nava kîsikekê. Destûr û xatir xwest û derket çû.

*

* *

Nîvê şevê, Dawûd bi qelebalixekê şiyar bu. Birîndarekî anîbûn. Hemşîre û personelên nexweşxanê li hev dizîvirîn. Lê doktor ne xuya bû. Birîndar di nava xwînê de bû. Xwîn ranediwestiya. Bi zorê pansûman dikirin û yek ji yekî pirs dikir:

- Ka doktor li kû ye?

Bistekî dinê doktor hat. Çêrê personelan dida û digot:

- Çi bûye, çi qewimiye vê nîvê şevê? Ma em jî ne mirov in?

Ji hêlek ve, çavên xwe difirikand. Ew û hemşîreyekî bi hev re ketibûn odekê. Hemşîre ji telaşê, sînga xwe vekirî hiştibû. Tev li ber serê birîndar kom bûbûn. Doktorî çawa li birîndar nihêrt, got:

- Hetanî vê gavê hûn li kû derê bûn?

Hevalê birîndar bersiv da:

- Em ji cihekî dûr hatin û ji traktorê pê ve tiştekî din tune bû, ku em lê sîwar bin.

Doktorî got: "Nirç, nirç!." dûre got:

- Tiştekî ku ez bikaribim bikim, nîn e! Bibin nexweşxaneyeke xusûsî (taybetî).

Hevalê birîndarî, xwe avête doktorî:

- Ez axa binê lingwê te maçî bikim, çarekê bibînin! Em feqîr in. Perê me tune ye.

Doktorî got:

- Ez çi bikim. Jê re mesrefeka pir mezin pêwîst (lazim) e û ez ne bawer im ku bifilite jî!

Camêrê reben bêçare li dora xwe nihêrt. Herkesî serê xwe bera berxwe da, avên Dawûdî tijî bûbûn. Vêga milyonên wî heba, ew dê

bêyî dudilî (teredut) bida...

Doktorî got:

- Tişkî bibêje. Hevalê te li ber çûnê ye.

Mêrikî got:

- Ax li min bavo! Gelo yekê xwedîwujdan tune ye li vî dunyê! Û li çokên xwe da. Birîndar ketibû ber sêkerata mirinê (canberkevki bûbû). Xirte-xirta qirika wî bû. Doktorî dest avête seromê û ji milê wî kişand. Ew çax çavên doktorî li hemşîra sîngvekirî ket. Bi awiran lê nihêrt. Hemşîre sor Personal hatin mirî dahênan ser sedyê û ji odekê derketin. Hevalê yê mirî kire qîrîn û got:

- Şêxooo!

Doktor kete milê mêrik û wî ji odê derêxist.

Dawûdî serê xwe danî ser bahlîfê. Hêsirên wî bahlîfê bi derbekê re şil kirin. Vir de wir de zîvirî, çavên wî xew girtin. Êşekê dijwar dest pêkir. Her ku diçû zor didayê. Bê hemdî axinekî ji Dawûdî rabû. Bi dengê Dawûdî re, jibaa ku di navbera Dawûd û bavê xwe yê emeliyatikirî de û li ser kursîyekê hişk diponijî, veciniqî û bazda çû bang hemşîreyeke kir.

Derziya ku hemşîre li Dawûdî xistibû, Dawûd sakîn kiribû û hêşa wî hatibû birîn. Dawûdî çavên xwe girt û kete xeweke giran.

*

* *

Sibeha roja eydê (cejna remezanê) Dawûd birin bin kêrik û neş teran. Beriya ku wî bibin, hemşîrekî hat û jê pirsî:

- Ew dera te paqij e?

Dawûd sor bû û:

- Her tişt pir zû û li pey hev çêbû. Êdî wext nema, got.

Hemşîrê ji bersiva Dawûdî hez nekiribû û weke ku bibêje, çi karê min jê heye, milên xwe rakir û li bayê xwe çû.

Pir derbas nebûbû, hatin Dawûd birin salona emeliyatxanê. Dawûd li ber deriyê girtî, li ser sediyê serpiştkî vezelandî bû û li hêviya wan bû ku werin wî bibin. Ew çax yekî cilsipî hate ba Dawûd û tinazên xwe kir:

- Te eşofman li xwe kiriye. Xuya ye ku tu ji sporê fam dikî.

Dawûd keniya. Mirovî domand:

- Ez wextekê gelekî beza - ji bazdanê re jêhatî - bûm. Tu dikarî bi min re bikevî banzdanê?.

- Bi vî halî, got Dawûdî bi pirs.

- Na na, ji tere du meh musaede…

- Baş e, ser çavan.

Mirovî deriyê girtî vekir, kete hundur û derî zû girt. Dawûd tiştekî nedîtibû. Hew dengê şeqe-şeqa kêra, çetel û kefçiyan dihat. Dawûd gote qey vêga xwarin dixwun. Bîsteke din derî dîsan vebû û ji wê odekê nexeşekî derxistin û wî bi meytkî ji ber çav winda kirin. Ew çax Dawûd kete hêcanê ne girtibû ku Dawûd xwe li ser masa emeliyatê dît. Dermanekî li ser dewsa emeliyatê reşandin. Derman fûriya, kef girt. Dûre bêhneke xweş kete pozê Dawûd û Dawûd û Dawûdî kete xeweke şêrîn.

*

* *

Dawûd bi dengekî re şiyar bû. Ew jina ku çaxa êş bi Dawûd girtibû, gîhabû hawarê, bangî wî dikir. Dawûd çavên xwe vekir. Jinê jê re dikeniya. Dawûd jî mizicî, lê fêhm nekiribû çi ye. Çima li wir bû dîsan, kanî ewê emeliyat bibaya? Xwest ku piyên xwe bikişîne, nebû. Milên wî ji ne dihatin. Jibaê bi ken got:

- Tu girêdayî yî. Ew dê vêga werin te vekin. Karê şîyarkirina te jî dabûne min. Derbasbûyî be.

- Spas, got Dawûdî.

Hatin Dawûdî vekirin. Doktor li ser serê wî rawestiya bû. Dawûdî ew nas kir. Ew mirovê ku digot ez beza me, wî emeliyat kiribû. Destê xwe da ser eniya Dawûd û got:

- Tu dizanî ji kîsik çi derket?

- Çi?

- Bizirên fifilan…

Devê Dawûdî ji ken re vebû…

- Nebî, nebî ha, got doktorî. Tebessum (bişirîn) heye, kenê bi

deng û tiqe-tiq tune ye. Yan na ew dê dirûn vebe.

Kena Dawûdî di cih de sar bû. Hemşîreyekê li cihê emeliyatê nihêrt û dûre li kaxeta di destê xwe de "Normal" nivîsî û doktor û peyên wî tev çûn ba nexweşekî din.

*

* *

Hê çar roj derbas nebûbûn, Dawûd ji nexweşxanê deranîn. Raporekê hazir kirin û dane destê wî. Dawûd weke sêwiyan xwe li ber derî dît. Hêdî hêdî kete rê. Je re wext nehiştibûn ku çêrê wan ji bide. Ku bibêje evçend bê wijdanî nabe! Lê ne taqeta wî hebû û ne jî xulqê çêrdanê pê re hebû. Veca jî ji bona bi rêveçûnê qudûm tune bû pê re. Devê xwe tijî kir û gote tiff û li pey tifa xwe nihêrt. Hetanî ku tûk çû û gîha Seyhanê û bi avê re herikî, ji ber çav winda bû…

Li ser riya xwe, da wezinandin. Çil û heft kîlo mabû. Bawer nekir. Dîsan li weznê nihêrt. Erhê, çil û heft bû. Rewşa xwe ya berê emeliyatê hanî bîra xwe, pêncî û heşt an jî pêncî û neh kîlo bû. Ricifî. Xwe weke darikeke hişk î bêpel dît.

## RAPOR

Dawûdî beriya hevalên xwe hatibû dibistanê û ewî li ser cîhê. Kerîmî razandibûn. Rûyê Kerîmî hate ber çavên wî. Erçena Kerîm î dirûtî û xwar mayî û ruyê wî yê ken nasnekirî… Dûre Hemîd xuya bû weke xiyalekê û digot:

- Kerîmî çima lêdan xwar, qet ji bîr meke!...

Dawûdî bêkêf bû û ew şev zû raza.

Dene qelebalixa zarokan ji xwarê ve dihat. Dawûd rabû çû ber pencerê û temaşe kir. Qasekê din zarok kom bûn û bi tirkî gotin: "Korkma sonmez…"

Ala xwendegehê, ku çend roj bi darve mabû, weke potikeke bi qirêj hanîn xwarê. Yehyayî di binê çavan re li alê dinihêrt… Çi carî jê hez nekiribû. Ji zarotiya xwe û vir de ji vê alê jî, ji vê "Korkma, sonmez" ê jî nefret dikir. Bav, bapîrên wî tev zulm û tahdeya hikûmeta tirk dîtibûn. Pîrika wî, Diya wî… herkesî, her tim dij

dewletê xeber didan û bi dizî jî alîkariya pêşmergêyên kurdên başûrê Kurdistanê dikirin. Gundê wan di ber tixûb de bû. Yehya çend caran di civatên pêşmergan de rûniştibû. Hê di deh saliya xwe de wateya kurd û Kurdistanê dizanî bû. Çaxa ku dibistana pêşî xilas kiribû, bapîrê wî yê di Melatiyê de bi nav û deng, jê re gotibû: "Ez ji xwendegeha Melatiyê pê ve nahêlim tu herî cihekî din. Bapîrê Yehyayî çi bigota qanûn bû di gund de. Nedibû ku Yehya li ber wî rabe û ji xwe pîşekî (meslekî) din jî nas nedikir, ji Mamostetiyê pê ve…" Mamosta bûn!... Ji min dûr be!..." Digot Yehyayî "Karê min tune ye ez ji sibehê hetanî êvarê bibêjim; tirk im, rast im… û vê jî bi zor bi zarokên kurd bidim jiberkirin…

Yehya li dawiya rêzê rawestiya bû. Zarok dor bi dor ber bi sinifên xwe de diçûn. Ji nedîve dengê şeqe-şeqa camekê kete guhên Yehyayî. Serê xwe rakir. Li qata sisiyan yekî li cama rewîrê dida. Baş bala xwe dayê. Ji Dawûd pêve ne kesekî din bû…

Dawûd derî vekir. Yehyayî Dawûd hembêz kir. Rûniştin. Yehya ji por hetanî neynûkê Dawûdî kontrol kir û got: "Niç niç!..."

- Niç-niça te ji bona çi bû? got Dawûdî.

- Qet… Te pir kîlo daye.

- Êrê… Nizanim ez dê çawa xwe cardin bikim bi goşt û bi xwîn.

- Mîrata xwarinên vir jî, ji nepixandina zik pêve bi kêri tiştekî nayên. Zingila Mamosteyan lê da. Yehya rabû çû. Dawûd di wê hundirê teng de, vî serî, wî serî çû û hat. Odek weke heftûskekê bû û di vê qulikê de çar somyên (textnivîn) qerase hebûn. Di navbera wan de bi qasî nîv metrê valahî hebû. Bêhna Dawûdî teng bû. Li ser somya xwe rûnişt. Dûre vezeliya. Herdû destên xwe di bin serê xwe de kilît kir û çavên xwe girt.

Dawûd bi dengê zîlê re şiyar bû. Zû rabû û berê xwe da derî. Dizanî bû ku vêga ewê Yehya, Menaf û Mihemedê Cizîrî û belku hinekên dî jî werin. Bi rastî jî rewîr tijî bûbû. Kê sah kiribû, hatibû. Teva meraq dikirin ku gelo ameliyat çawa bû. Dawûdî xwe qure kir wû hal mesele ji serî hetanî binî tev got. Devên wan vekirî û bê nekes guhdarî dikirin.

Roj bi roj çîroka Dawûd bela dibû. Di hewşa xwendegehê de yên ku qiseta wî sah ne kiribû, nema bû. Ya ku bêhtir bal dikişand ew bû ku Dawûd bi tena serê xwe her formalîte safî kiribû. Xeber ji kesî re neşandibû. Ev bûbû mêraniyekê ku jê re lêvên xwe gez dikirin.

*
* *

Dawûd li milkursiya li ber camê rûniştî bû. Şofêr pê li gazê dikir ne dikir, ne rê xilas dibû, ne jî şev…

Piştî rapora Dawûdî ku nexweşxanê dabû yê, qediyabû, doktorê ku Dawûd şandibû nexweşxanê, wî muayene kiribû û gotibû:

- Tu pir qels ketiyî. Ezê bîst rojekî din rapor bidime te û rast here mala xwe. Qet nebe, bîçkek goşt were ser hestiyên te.

Saet çarê şevê, berbanga sibehê, Dawûdî li derî da. Dengê diya wî, bi bawîşkê re tevlî hev bilind bû.

- Kî ye?

- Ez im yadê.

- Tu kî yî?

- Dawûd…

- Dawûd?.. Dengê te ne mîna yê Dawûdî ye…

- Derî veke û bibîne…

- Diya wî bêbawerî û piçekî bi tirs derî nîvçe kir. Li Dawûdî nihêrt. Nas nekir. Çavên xwe firikand û car din nihêrt. Paşê xwe avêt stuyê Dawûd:

- Mala min bişewite!... Ev çi hal e?

- Mepirse… Ez ameliyat bûme.

- Hiişş!...

Bavê Dawûdî jî rabûbû. Diya wî got:

- Seyda, Seyda!... Agir bi mala min bikeve. Kurê me ameliyat bûye û haya me jê nîn e.

- Çima kuro, got bavê wî.

Dawûdî bersîv da:

- Nizanim çawa bibêjim… Cejna Remezanê bû. Çaxa ku xwîşk

û birayên min cejna we pîroz dikirin, ez di binê kêrikan de bûm. Wîjdanê min qebûl nekir ku ez cejna we bi herimînim…

- Vêca ew çi ye? Ma tu ne kurê me yî? Got bavê wî.

Diya wî xwe xeyidand û bi hêrs got:

- Le ku tu miribayî?..

Bersîva Dawûdî amade bû:

- Hê min sah ne kiriye ku kes ji ber apandîstê miriye…

Çavên bavê wî tijî bûbûn. Berê xwe guherî. Lê diya wî xwe ne girt û bû kûze-kûza wê.

Kêfa Dawûdî li cih bû. Hevalên wî yên Qezê tev hatin balê. Bi xêra Dawûdî li cih bû. Hevalên wî yên Qezzê tev hatin balê. Bi xêra Dawûd, xwîşk û birayên Dawûdî bi rojan xwarin, lê şekir û loqumên ku hatibûn hew ne bûbûn.

Êdî Dawûdî çaxa ku dilê wî dixwest, radiza û bi qîma xwe şiyar dibû. Ne dengê azana sibehê hebû û ne jî, ew zîla melûn… Ji dersan jî rizgar bûbû… Kêf kêfa wî bû. Goşt, birinc û her tişt dihate ber wî. Çi bixwesta, bi ya wî dikirin… Şûr simbêlên wî ne dibirî…

Di nava deh rojan de Dawûd baş qelew bû. Xwîn ketibû ruyê wî yê zer. Gepên wî tijî bûbûn. Radibû digeriya. Carina diçû qehwexanê ba hevalên xwe. Bi saetan rûdiniştin. Ji sîporê û ji maçan pê ve tiştekî din xeber ne didan. Dawûd pir pê dilteng dibû. Lê dengê xwe ne dikir. Navbera wî û Xelîl xweş bû. Bi Xelîlî re tiştî din hebû. Bi kurdîtiya xwe ve girêdayî bû û di cihê xwe de ne disekinî. Hertim dixwest behsa Kurdistanê bike. Lê kesî lê guhdarî ne dikir. Ewî jî, ji teva bêhtir bi Dawûdî re dida û distand. Li kuçên Qezzê digeriyan Diçûn ser gir, di nava daran de rûdiniştin û dûrdirêj xeber didan. Dawûdî re dihejand.

Rojên bi daxwaziya mirov, zû derbas dibin. Dawûd hew lê nihêrt ku di otobusê de ye û hevalên wî tev rêz bûne û jê re destên xwe dihejînin. Hetanî ku hevalên wî ji ber çav winda bûn, Dawûd jî li ser piyan, ji wan re dest hejand, Dûre rûnişt. Cigareyek deranî. Pê xist û hilmekê kişand. Dûman çû heta pişika wî. Nêvî derket, nêvî ma…

Ew otobusa ku berê xwe dabû Qezzê, ne diçû. Lê ev otobusa, bela ku berê wê li Edenê bû, diherikî. Ruha, Entab li pey hev derbas bûn. Dawûd carekê dit ku şewqa lampên cade û xaniyên Edenê weke hûtan devên xwe vekirine. Otobus kete devê hût. Dawûd got: "Qeda li te bikeve Edene... Ev bû pênc sal. Tu min dixwî, ez xwe dixwim hew nabe... Ne tu min berdidî, ne ez ji te rizgar dibim.

Ev rêwîtî jî ne tu rêwîtî bû. Navê xwê neketibû çavên Dawûd. Çi cara ku dibênijî, bi dengê zilê re şiyar dibû. Yan jî, mamostên bi şivik dihatin xewa wî û digotin: "Rabe, rabe... nimêj çû..." Dawûd vediciniqî û bi saetan li pey xewa ku reviya bû digeriya...

Dawûd baholka xwe ya biçûk hilda û kete rê. Kêlek mêlekên baholê tev çûbûn û devê wê jî bi beneke sitûr hatibû girêdan... Beriya pênc salan, cardin ev baholka biçûk didestê Dawûd de bû. Ew`ê çaxe Dawûd jî hûrik bû. Lê vêga qulpa baholê di nava destê wî de winda dibû... êdî ji ber wê şerm dikir Dawûd. Yekî nûh jî ne dihate bîra wî. Beriya vHegerê bi çend rojan, diya Dawûd gotibû:

- Wîî!... Lawê min hê bi vê baholkê ye... Ez vêga xwe dişewitînim... Dawûd kêfa xwe hanîbû. Lê bavê Dawûd, weke ku qet bûbû... Dawûd fam kiribû ku rewşa bavê wî ne baş bû. Zivistan bû; komir bû, êzing bûn... Pişta bavê wî şikestibû... Ne dibû ku Dawûd bigota: "Bavo, ji min re baholekî nûh bistîne."

He ew roj bû ku bavê wî çûbû ji xelkê pere deyn kiribû ji bona riya Dawûd û ji bona mesrefa wî...

Dawûd deriyê odekê vekir û pir hêdî giha ber ciyê xwe. Nexwest kes bi dengê wî re şiyar bibe. Saet çarê bû û kî şiyar biba, çûbû jê... Ji ber ku nêzîkî wexta banga sibehê bû, êdî ji tirsa xew bi çavên wî ne diket.

Hê Dawûd du-sê caran dinava ciyan de ne zîvirî bû, deriyê odekê bi terqînî vebû û bi dengê "Rabe nimêjê!" re rabû û rûnişt. Ew çax şaylixiyeke kete nava odekê. Yehya, Menaf, Mihemedê Cizîrî û yên mayîn yeko yeko xwe avêtin stûyê Dawûdî, wî hembêz kirin.

- Tu li kû derê ma lo!... Me bêriya te kiribû, got Yehyayî.

Menafî bi destê Dawûdî girt. Du-sê caran hişk hejand û got:

- Ciyê te dihate xuya.

- Min jî beriya we kiribû, got Dawûdî. Baş e ku me car din hevdû dît!...

Mihemedê Cizîrî pirs kir:

- Ê lo!... Hela bibêje, çi hebû çi tune bû?

- Weleh saxiya canê we…

- Ya te jî, got Mihemed û domand:

- Yê me jî teqe-req berdewam e. Her roj ders, her roj bêxewî… Lo ev ne tu hal e…

- Em çawa bikin, qeder… Em dê bikşînin, got Yehyayî.

Menafî di ber xwe de neda û bi tinazî got:

- Na lo, qedera çi… Eva keder e. Ax felekê!...

Bû tiqe-tiqa Dawûd û keniya. Ev car navê felekê bê hemdî derketibû ji devê Menaf. Menafî zû fêhm kir sedema kenê Dawûd û ewî jî dest bi ken kir…

Dawûd du mehan serê xwe ji ser dersan ranekir. Ji ber ku raporan ewî bi paş ve hiştibû, barê wî giran bûbû. Hin ders hebûn ku îmana Dawûd ji wan diçû. Ne dihatin xebatê û fêhmkirinê. Ew ders jî tev bi Quranê ve girêdayî bûn; Hedîs, Tefsîr, Kelam, Fiqih û bi ser van de jî Kîmya, Fizîk û Matematîk hebûn ku qudûmê mirov ne dima. Kîjan Mamoste dihat, digot:

- Ez te fêhm dikim. Lê vêga tu li vir î û tê mecbûren zor bidî xwe. Dawûdî xwe tirş dikir. Ew çax Menaf henîşka xwe di newqa wî de dida û digot:

- Qet xwe tirş meke. Mazeret tune ye…

- Tu dev ji min berde û bi halê we bigirî Menafo…

- Çima?

- Çi çima?... Yê min doktoran min ameliyat kirin û ez ji bela xwe xilas bûm. Ya tu?.. Ew dê kî te ji derdê Felekê rizgar bike?

Menafî tu bersiv ne dît û berê xwe guhêrand.

ŞER

Di xwendegehê de hebû deh hêzên paşverû. Her hêzekê dixwest ku ji yên din xurttir bibe. Hemûyan jî dixwest ku xortên kurd jî bi xwe ve girêbidin. Li dora zarokan diçûn dihatin. Belavokên xwe didane wan, carna bi xweşî û carna jî bi zor...

Her ku diçû, faşîstan zora hêzên din dibirin û yan wan pasîfîze dikirin, yan jî, wan ditirsandin. Lê car din jî dev li hevdû ne dikrin. Ji ber ku hemû jî paşverû bûn, tiştên wan yên beşdar (muşterek) jî hebûn. Piraniya Mamosteyan jî alîkariya wan dikirin. Êdî ji sînor derhanîbûn. Sibehan diketin cihê anonsê û marşên xwe digotin.

Dawûdî dev ji sporê berda bû. Her beşê sporê xistibûn destên xwe û yên ku nas nedikirin, yan jî yên ku kêfa wan ji wan re ne dihat, ne digirtin. Dawûd jî yek ji wan kesanan bû. Ji Dawûd hezne dikirin. Rojekê, di maçeka basketbolê de, Dawûd hêjmarekî pir hêja qeyd kiribû û ji kêfa milê xwe yê çepê rakiribû. Piştî maçê şeş heban Dawûd xistibûn nava çemberê û yekî ji wan gotibû:

- Ma qey tu komûnîst î?

- Ev ji kû derê derket?

- Te milê we yê çepê hilda, gotibû yekî din. Dawûdî ew çax fêhm kiribû ku niyeta wan kesan xirab (neçê) bû. Dawûd hêrs bûbû û gotibû:

- Ma kî milê xwe yê çepê hilde, dibe komunîst?

- Erê le, ma milê teyî rastê seqet bû? Gotibû kurikî. Dawûdî serê xwe hejandibû. Kiribû niçe- niç û bi ken bersîv dabû:

- Ez her karê xwe bi destê çepê dikim. Danûstandinê min tev pê ye. Tu car destê rastê ne hatiye bîra min.

Ji wan şeş kesan yek hebû ku pir girs û dagirtî bû. Balixbûn lê nihatibû û bi bejin avêtinê re ji hev felişî bû. Dengê wî jî, ji yê mirova bêhtir, mînanî yên dewaran bû. Û heywankî jî Dawûdî re gotibû:

- Bila ji nûha pê ve destê te yê rastê jî were bîra te.

Li hêviya bersiva Dawûdî nema bûn û li bayên xwe çûbûn.

Menaf, xapandin kiribû karê xwe. Li dora wî pir diçûn û di hatin. Lê Menaf xwe li kerîtîyê dabû. Ji tevan re jî digot:

- Erê, rast e.

Dûre ji wan re behsa Felekê dikir, hetanî ku ji ber wî direviyan û carekê din lê silav jî ne dikirin.

Yehya zirz bû. Di bin mihneta kesî de ne dima û çi bihata devê wî, dano paş ne dixist. Ketibû defterên hemû hêzan. Teva jî jê re diran diqirçandin.

Mihemedê Cizîrî bi bejbaa xwe ya hûrik û bedena xwe ya nexweşokî bala kesî ne dikişand. Hebûn û tunebûna wî ne dihate ferq kirin.

Dawiya buharê bû. Mejiyê mirov dikelijî ji germa. Çaxa ku dibû nîvrokî, herkesî xwe dida ber siya dîwaran.

Qiyala nîvro bû û hê ji zîlê re dem hebû. Yehya, Menaf û Mihemedê Cizîrî xwe dabûn ber siyê û ji vir, ji wir dipeyivîn. Dawûd ji wan deh - panzdeh gav dûr bû û Hesenê qehremanê bûyera Mehdî, wî dida peyiftin.

Sê kes di deriyê hewşê reketin hewşê. Di destên wan de pirtûk û belavok hebûn. Çar - pênc hevalên wan ber bi wan de çûn. Dûre wan pirtûk û belovokan teslîm girtin. Piştî ku ew sê kesanan ji hewşê derketin çûn, wan ên mayîn dest bi belavkirina belavokan kirin. Hatin heta ber Yehya. Belovokekê dirêj kirin. Yehyayî ne girt û meşiya. Yekî ji wan hişk bi milê Yehya girt û got:

- Tu çima nagirî?

- Ez naxwazim.

- Kesî ji te ne pirsiye tu dixwazî yan na!

Belavokê car din dirêjî Yehyayî kirin. Yehyayî bi pişta destê xwe belavokê dahf da. Lê milê xwe xilas nekir. Kurikî ev car bi herdû destan bi sînga Yehyayî girt û wî hejand.

Yehya zer bûbû, le carekê gotibû. "Na." êdî qiyamet rabiba, kesî barîbû pê. Ew kurikê ku bi sînga Yehyayî girtibû got:

- Tu digirî yan na?

- Na.

Ew dê ku belavok dirêjî wî kiribû gote "tiff!". Tûka wî li ser çavên Yehya ket. Yehyayî jî bi tûkê bersiv da.

Menaf û Mihemedê Cîzîrî qasidî dikirin. Lê herdû jî bi dahfdanan ji wir dûr ketibûn. Yehya ketibû qozîye û bû terpe - repa wan. Dawûd xwe zû gîhande wan. Xwe ji Yehyayî re kir sîper.

- Xwe bide alî, got yekî ji Dawûdî re.

- Xêr e, çi qewimiye, got Dawûdî.

- Ez ji te re dibêjim xwe bide alî…

- Na xêr! Hevalê min e. Derdê we çi ye?

Xwedyê belavokê, ev car belavokê dirêjî Dawûdî kir:

- Ha ji te re.

Dawûdî belavokê girt. Lê nihêrt û perçe - werçe kir û avêt ser ruyê wan. Ji nişka ve boksekê gote ziring û hat li ser pozê Dawûdî danî. Ew boks ji kêlekê ve hatibû. Dawûdî hesabê pêşiya xwe dikir, lê kêleka xwe ji bîr kiribû. Xwediyê boksê, ew kurikê girs î ji hev felişandî bû. Ji wê roja ku Dawûd milê xwe yê çepê rakiribû û vir de, kurik bi hev re êrîşî Dawûd kirin. Yehya ji paş Dawûd derket. Menaf û Mihemedî jî xwe gîhandin. Lê hêjmara wan kesan her ku diçû bêhtir dibû. Pirtûk û belavok li hewayê wan kesan her ku diçû bêhtir dibû. Pirtûk û belavok li hewayê dizîzikîn. Her çar hevalên kurd baş di berxwe dan, lê pir lêdan jî xwarinw… Û axir mamostên ku li ber pencerê li wan temaşe dikirin, xuya bûn. Wan ji hev cuda kirin. Teva kom kirin û bi xwe re birin. Serkarê xwendegehê bi dareke weke qurmekî hat. Bê pirsîn kete ser serê wan… Mehemedê Cizîrî ji nişkave belavokekî ji bêrîka xwe deranî û dirêjî serkarê xwendegehê kir û got:

- Tu çima li me guhdarî nakî? Van kesan bi zor belavokan didin me. Li me dixin û vêga jî tu bê pirs û bê bersiv li me didî…

Serkarê xwendegehê belavoke girt û xwend. Dûre got:

- Himm… Kî dide we? Hinekî fikirî; paşê domand:

- Kê şer deranî?

- Wan derxist, got Mihemedî.

Nivîskarê (katib) xwendegehê daqtîloya xwe anî. Mamosteyekî, hemûyan deranî salona fireh û paşê yeko - yeko bangî wan kirin.

Dawûd wê odekê baş nas dikir. Hanî bîra xwe. Ew roja ku

çûbûn sînemayê hindik lêdan ne xwaribûn li wê odekê...

Hefteyek derbas bû, deh roj, bîst... Lê ne cazayek hate ji kesî re û ne jî aferînek. Lê piştî wê rojê, êdî kesî belavokan ne hanî hewşa xwendegehê.

Dawûd, Yehya, Menaf û Mihemedê Cizîrî ji her car bêhtir bi hev re digeriyan. Faşîstên xwendegehê ji dûrî ve li wan gefan didan. Lê emir standibûn ji serokên xwe. Diviya ku çendakî bê deng bimana...

Rojên dawî jî bi vî awayî derbas bûn û ketin semestra havînê.

**HAVÎN**

Xelîlî serê xwe rakir û dît ku Dawûd jê re dikene. Ji cihê xwe pekiya û xwe avêt situyê Dawûd Seîd, Feysel, Zeyad, Ednan, Melo û Dîko... hemû li wir bûn. Teva yeko yeko Dawûdî himbêz kirin. Her yekî Dawûd bi alekve dikişand. Lê Dawûd li ba Xelîlî rûnişt. Yên mayîn jî leyîskên xwe betal kirin, kursîkên xwe kişandin û li dora Dawûdî rêz bûn.

Navê Dîko Îsmaîl bû. Lê bela ku di maçan de, çaxa ku top dihatê, berê pê li topê dikir û dûre weke dîkan li dora xwe dinihêrt, navê wî kiribûn "Dîko". İsmaîl çendakî bi navê Dîko aciz bû, di ber xwe da, lê dûre pê qayil bû. Lê ewî jî heyfa xwe distand. Kê jê re bigota "Dîko!" di cih de bersîv dida: "Ha çi ye, mirîşko!"...

Melo, navê xwe yê rastî nizanî bû. Di zaroktiya xwe de vî navî girtibû. Kê, çi çax vî navî lê kiribû, ne dihate bîra kesî. Melo berbi bela bû. Serê wî li pêncî tehxtî ketibû. Kes tune bû ku hîvza xwe jê ne dikir. Lê Melo ji hevalên xwe re weke mîheke mêşinî bû. Hela Dawûd!... Bi îmana xwe ne dida. Dawûd jî her tim hesabê wî dikir... Par hevdû nas kiribûn. Her yek ji mehelleyekê bûn... Her mehelle xwedî grûbeke futbolê bû. Kosar grûba Melo, Serê Gir jî ya Dawûd bû. Herdû grûb jî xurt bûn û zora grûbên mayîn tevan dibirin. Lê ji hevdû ditirsiyan. Bi piranî grûba Dawûd fêde dikir. Rojekê, di nava civatê de Melo û hevalên wî teklîfa yekbûnê hanîn. Dawûd bi hevalên xwe re şêwirî û pejirandin. Çaxa ku herdû grûb bibana yek, ewê xurttir bibana.

Dotira rojê, herdû grûban jî xwe fesh kirin û bûne yek. Lê bela ku hêjmara wan pir bû, di nava xwe kirin du beş. Yên baş û yên mayîn ji hev cuda bûn.

Piştî yekbûnê wusa xurt bûbûn ku navê wan derketibû dervayî Quezzê jî. Ji gundan, ji Dirbêsîyê, heta ku jî Nisêbînê ji wan re teklîfên maçan dihatîn.

Du meh derbas bûbûn. Seyfoyî dikir û nedikir barîbû biketa grûba baş. Bejna jî hûrik bû û zû topê winda dikir. Di gellaciyê de, di ser wî re kes tune bû. Berê navbera herdû grûban vekir... Xortan yeko - yeko berra hevdû dida û dûre tiqîniya wî bû, dikeniya... Hindik mabû ku grûb bibaya sê perçe. Hin çeçan jî hebûn ku dixwestin ku taqim bela bibe. Weke Seyfo, ji wan re jî cih nemabû di grûba baş de Û dauwîyê jî, Seyfoyî ji alek ve û çeçanan jî ji alek ve Dawûd.û Melo berra hevdû dan. Bêhişiya Melo bi kar hanîbûn. Hatibû wê qasê ku rojekê Meloyî kulmiska xwe li masa qehwexanê dabû û çaya li ber Dawûdî rijandibû.

- Ev çi bû Melo? gotibû Dawûdî.

- Tu çawa fêhm dikî, ew e!

- Yanî?

- Herê, yanî em vêga ji hev diqetin...

- Ser çavan...

Dawûd rabûbû ser piyan. Bala herkesî lê bû. Tûk di qirika Dawûd de pûç bûbû. Dengê wî bi zor derketibû:

- Hevalno, ji îro û pê ve em bûne weke berê... Va ez vega ji vir derdikevim. Yên ku dixwazin car din di grûba Serê Gir de bileyîzin, bera bi min re derkevin. Piştî wê axefê, Dawûd ji wir derketibû. Hevalên wî yên kevin, li pey wî çûbûn. Çeçan tev bi Melo re mabûn. Xelîl ketibû milê Dawûd û gotibû:

- Berê em çardeh bûn, vêga deh... Tişt nabe. Qet nebe me yar û neyarên xwe naskir...

Ew dê derketana maçekê. Lê dev ji yazdehan berde, deh jî ne temam bû. Dîko ne xuya bû. Li sahê herkesî cihê xwe girtibû. Dengekî kete guhên Dawûd:

- Hûn dê bêyî min dest pê bikin ha?...

Dawûd li deng fitîlî bû û Dîko dîtibû. Du hevalên Dîkoyî jî pê re bûn. Dîko xwe zû amade kiribû û ji Dawûdî re gotibû:

- Ev herdû heval jî xweş dileyîzin. Ev Qado ye û ev jî Nodquriş e… (Nodquriş şehîde Kurdistanê Dawûd Uluç e) çend kes pêwîstin?

- Yek, gotibû Dawûdî.

- Nodquriş! Xwe amade bike û nîşan bide ku kurê bavan çawa dileyîzin.

Dawûd pir kêfxweş bûbû. Bi destê Dîkoyî giritbû û gotibû:

- Spas Îsmaîl… Te qudûmên min î şikestî bi rih kir. Bibêje, tu çi dixwazî?

- Piştî maçê, sê cigare…

- Wey serseran…

*

* *

Melo û hevalên wî pesn û fortên xwe dikirin û meydan dixwendin. Dawûd çendakî bêdeng mabû û dûre gqtibû:"Hodrimeydan

Maçeke zahf dijwar bû. Lê Dawûd û hevalên wî ew roj bûbûn piling. Hêj maç hew nebûbû, çar û yek û yek li pêş bûn. Û gola pêncan destên xe dabû ber guhên xwe. Melo hêrs bûbû û bi hevalên xwe de ketibû. Çêrê an dida. Lê fêde ne dikir.

Nod qirûş weke bayê diçû. Meloyî xwe gîhandibûye. Piyê xwe dirêj kiribû. Lê ne ji bo topê bû. Bi qestî weha kiribû. Nodquriş teqlo - meqlo bûbû. Lê zû rabûbû. Ew û Melo ketibûn ser serên hevdû. Feysel xwestibû navçîtî bike. Lê Melo Feysel di yek derbê de li erdê rast kiribû. Feyselê bê zirav dest bi girîn kiribû. Dawûd hêrs bûbû û ji feyselî re gotibû:

- Tu mêr î lo, ev girîn çi ye?

Û Dawûd bi lez êrîşî Melo kiribû. Quto, hevalê Melo, derketibû pêşiya Dawûd. Dawûd wî dahf dabû û Quto li ser piştê li erdê ketibû. Ew çax kurmamê Melo, Nasir, bi qirika Dawûdî girtibû. Dawûdî pehînekî li nava şeqên Nasir xistibû û qêrîn ji Nasir rabûbû. Melo

êrîşî Dawûd kiribû lê Selman (şehîdê Kurdistanê Selman Dogru), hakemê maçê, bi Melo girtibû û ewî dahf dabû. Melo ji Selman ditirsiya. Lê gef xwaribû û gotibû:

- Wey! Selmano, tu jî, ji piştgiriya wan dikî ne? Min zanî bû.

- Yellah bicehinimin, gotibû Selman.

Meloyî hevalên xwe kişandibû û gotibû:

- Ev li vir namîne. Ger ku hûn mêr bin, ez dê îşev e li sûkê bibînim.

Li zora Dawûd çûbû:

- Tu ji bavê xwe bênminet î...

Dawûd û Meloyî bi awiran li hevdû nihêrtbûn û Meloyî ji hevalên xwe re gotibû:

- Haydê em herin.

Piştî şîvê, Dawûdî li hewşa malê çend tûran avêt. Melo çi caran heyfa xwe ji kesî re nehiştibû. Dawûdî ne dixwest ku ev tişt mezin bibaya. Lê ku derneketa, ew dê navê wî tirsonek bimaya. Ji bavê xwe şerm dikir. Ne dixwest ku xelkê bigota: "Kurê mela bûye sakûl û li sûkan qirên derdixe!..."

Dawûdî cigara xwe pêxistibû û hêdî hêdî meşiyabû... şeveke sayî, hêba û xweş bû... Bayê havînê nava mirov miz dida. Dawûdî gîhabû qehwexanê. Ji hevalên wî, kes tune bû li piyasê. Rûniştibû... Çay hatibû... Şekirên xwe havêtibû nava çayê û dûvdirêj li hev xistibû. Paşê qurtekî vexwaribû, lê çay jê re bê tam hatibû...

Saetek - du saet derbas bûbûn, lê ji hevalan kes xuya nebûbû. Dawûd rabûbû û berê xwe dabû nava sûkê. Xwestibû ku li Melo û hevalên wî rast were. Êdî çi dibû, bila bibûya...

Dawûd li ber afîşên sînemayê rawestiyabû... Giraniya destekî li ser milê xwe hîs kiribû û dilê wî kiribû gupe - gup. Serê xwe zîvirandibû û çavên Xelîl î beriqandî dîtibû. Xelîl jê pirsîbû:

- Ma tu din î Dawûd, bi tenê û li vê rastê tu çi didipeyî?

- Qet.

- Zanim, zanim tu mêr î.

- Ya te?

- Yê min tiştek bi min nabe. Derdê wan tu yî. Bi rastî, min nizanîbû ku hevalên me ev çend bizdonek in.

- Lê!...

Xelîl li dora xwe nihêrtî bû. Dûre bi destê Dawûd girtibû û gotibû:

- Êdî bes e. Were em herin malê.

- Na xêr…

- Çima?

- Ez hê nûh hatime. Hê zû ye ji çûna malê re…

- Nexwe em herin sînemayê.

- Na, dilê min naxwaze.

- Na Dawûd, na, ne weke te ye. Tu eşkere meydan dixwînî.

- Ez dixwazim min bibînin Xelîl. Ez xurûra xwe nadim bi milekî an serekî şikestî.

- Yaho ez bitera ketim belayê…

- Tu here Xelîl.

- Na.

- Herê.

- Careke din nebêje Dawûd. Tu min dihêşînî.

- Baş e heyran, tu zanî.

Dawûdî pişta xwe dabû dîwêr. Carekê dîtibû ku ji dûr ve peyên Melo, Quto û Nasir ji qoziyê derketibûn. Berê wan li Dawûd bû.

- Va ye hatin, gotibû Dawûdî.

Her ku Quto û Nasir nêz dibûn, hêcana Dawûd bêhtir dibû. Naê tirsê jî tune bû pê re. Lê ku yekî naskirî bidîta, ji zimanê bavê xwe rizgar ne dibû.

Quto li berpozê Dawûd rawestiyabû û pozê xwe xwaro - maro kiribû. Çavên xwe yên hûrik û biçûktir kiribû û heta jê hatibû xwe pîs kiribû û gotibû:

- Dawo, were em piçkî bipeyivin!

- Em dê çi bipeyivin?

- Tu zanî…

Dawûd gavekî ber bi Quto de çûbû. Lê Xelîlî bi milê Dawûdî

girtibû û gotibû:

- Hûn dê xwe li vê meydanê rezîl bikin.

Ew kuçe çawa ye? gotibû Nêsir û bi tiliya xwe kuçeke tarî zulmet nîşan dabû. Dawûd li kuçê nihêrtbû û gotibû:

- Baş e, fermo.

Quto û Nasir li pêş û Dawûd li paş, berê xwe dabûn kuçê. Xelîl xwe cardin avêtibû Dawûd:

- Meçe…

- Çima?... Tu dixwazî ji min re bibêjin pîrek?

- Çi dibêjin, bila bibêjin. Bi serê xwe, derketina te yî sûkê jî mêraniyek e.

- Em dê bibînin kî mêr e, gotibû Quto û bûbû tiqe - tiqa wî, keniya bû. Hatibûn ber deriyê hewşa mizgeftê. Wexta belavbûna cemaetê bû. Ricfekê bi Dawûdî girtibû. Gotina Quto jî bûbû gulle û li sînga wî ketibû. Dawûd ajotibû ser Quto. Quto du - sê gavan bi şûn de avêtibû. Berê Dawûd li - Dawûd!...

Dawûdî xwestibû ki li Xelîlî bifitile, lê dereng mabû. Ji paş ve, yekî xwe gîhandibû Dawûd û ziringiyekê ji pozê Dawûdî hatibû. Dawûd gêj bûbû. Sitêrkan li ber çavên wî destbi govendê kiribûn. Dev û pozê Dawûdî xwîn avêtibûn. Bê hemdî du - sê gavên çewt havêtibû Dawûd û çog dabû erdê… Xelk zû kom bûbûn. Xelîl ketibû milê Dêwûd û wî berbi kehniyên mizgeftê de biribû. Gêjaniya Dawûdî berdewam bû. Ava sar wî hanîbû ser hişê wî. Xelîl vêketibû rûyê Dawûdî ji xwînê dişûşt. Dawûdî destê Xelîlî dahf dabû û gotibû:

- Çi bûye, ev çi xwîn e?

- Melo, bênamûs kurê bênamûsan… Ji qelafetê xwe şerm nekir. Di nava pêncî mirovî de û ji paş ve, vê teresiyê kir…

- Ka ew bi ku derê ve çû?

- Ewî dûr kirin. Lê helbetê emê wan di qulçikekê de bibînin. Ev ji wan re namîne îşev.

- Tu dûr raweste Xelîl.

- Na Dawûd, êdî filitî. Ji ku derê zirav be, bila ji wir biqete!

Rabibûn. Qehwexane bi qehwexane, dikan bi dikan li Melo û hevalên wî geriyabûn. Mabû qehwexanekî bi tenê. Di nava pasajekê debû û ji ber çav dûr bû. Ketibûn pasajê. Dengê Melo weke boriyê ketibû gohên wan… Melo rûniştî bû û bi mirovên qerase re qumar dileyîst. Yekî Melo nuquçandibû. Çavên Dawûd û yên Melo li hevdû ketibûn. Weke ku xumînîyekî ji asmanan rabe, Dawûd erd hejandibû û bûbû birûsk. Bi banzdan êrîş kiribû. Hetanî ku Melo xwe rast kiribû, pehîna Dawûd li sînga wî ketibû. Melo, weke golikekê kiribû orîn û bi tev kursîka xwe ve qelibîbû. Xelîl jî xwe ji alekî din gîhandibû Quto û Nasir. Hê ku Quto û Nasir nîvcokî rabûyî bûn, Xelîl serê herduyan li hevdû dabû û piştên wan dabû dîwêr. Bûbû hinge - dinga wan. Ew çeçanên ku nawberra hevdû dabûn, qet li xwe nexurcilîbûn û di binê simbêlan re dimizicin. Xelkên wê qehwexanê wan zû ji hevdû qetandibûn. Melo jî, ji erdê rabûbû û êrîş kiribû. Ew çax Xelîl xwe dabû ber Dawûd. Qeweta tu kesî têrnedikir ku Xelîl û Melo ji hevdû biqetînin. Herdû qedene weke tanqan toz erdê radikirin. Dawûd, Quto û Nasir ji heêla xelkê ve, ji hev cuda bûbûn. Di nava ew çend mirovî de, baarîbûn xwe tev bidin.

- Polîs!..., gotibû yekî.

- Ez di dayika polîsan de b…m. gotibû Meloyî.

Sê polîs bi banzdan dihatin û destên wan li ser debançên wan bûn. Xelkê tev xwe dabûn alî. Melo û Xelîl, her yek berê xwe dabûn kuçekê û ji ber çavan winda bûbûn. Dawûdî xwe di nava xelkê de veşartibî. Ji xwe kesî xwe li tişkî ne kiribû xwedî. Polîsan kiribûn ne kiribûn, tiştekî fêhm nekiribûn. Teres bûbûn û mabûn. Sê rojan kes li sûkê xuya nebûbû. Dinava wan sê rojanan de, Dawûd û Xelîl carek bi tenê hevdû dîtibûn. Roja çaran, Dawûd derketibû sûke. Ber êvarkî bû û cardin sirek hêba dihat. Dawûd çûbû qehwexana xwe ya her car. Dîtibû ku hevalên wî tev rûniştî bûn û leqe - leqa wan bû. Wan jî Dawûd dîtibûn. Teva serên xwe bera ber xwe dabûn. Ji Dawûdî şerm dikirin. Dawûd bi dengekî xemgîn silav dabû wan û di ber masa wan re derbas bûbû û çûbû masakî din û bi tenê rûniştibû. Ji şerman, kesî ne gotibû "Tu çima nayê masa me?". Nodquruş jî li wê

derê bû. Ji cihê xwe rabûbû û hatibû ba Dawûd. Nodquriş dikuliya. Beriya ku rûnê, ji xwediyê qehwexanê re gotibû: "Du çay!..." dûre şalê xwe kişandibû hetanî ber gozekê. Birînekî têra xwe hebû. Ji Dawûd re gotibû:

- Heval, tu min baş nas nakî. Va ye tu dibînî. Min zanîba ku ewê qirên derkeve, min dê mirina xwe bi xista çavên xwe û ez`ê bihatama, li ba te bama... Dawûd xeber nedabû. Pakêta xwe ya cigarê dirêjî Nodquriş kiribû. Nodquriş berê rûniştibû û dûre cigarê girtibû... Xelîl jî hatibû. Lê wî weke Dawûd nekiribû. Li kesî silav nedabû û rast berê xwe dabû pişta Nodquriş û gotibû:

- Gozeka te çawa bû?

- Baştir e, spas.

Bi hatina Xelîl û tewra wî re, hevalên wan î mayîn tev bi hev re rabûbûn û serên wan di ber wan de, derbas bûbûn çûbûn.

- Xwezî ne weha bûya!... gotibû Dawûdî.

Ne Xelîl ne jî Nodquriş peyivîbûn.

Dengê azana êvarê bilind bûbû... Mizgefta xwendegehê, mamostên dest bi dar, şeveqên tarî û zîl û şorbên bi sabûn û zik êş... Tev hatibûn ber çavên Dawûd. Gotibû tiff û tifa xwe dûr avêtibû. Sedema tifa xwe ne gotibû û wan jî pirs ne kiribûn. Paşê Nodquriş ji wan xatir xwestibû û çûbû... Xelîl destên xwe danîbû ser çokên xwe û kiribû ku rabe, ji dûrî ve Melo xuya bûbû. Carek din rûniştibû. Bi nîşanan ji Dawûdî re gotibû li paş xwe binihêre. Dawûdî serê xwe zîvirandibû û dîtibû ku Melo berbiwan ve dihat. Dawûd li Xelîlî nihêrt bû. Xelîl çavên xwe ji Melo ne diqetand. Melo jî ziq li wan dinihêrt. Melo pir sakîn bû. Hatibû, hatibû û li ser serê Dawûd rawestiya bû. Berê wî li Xelîlî bû û gotibû:

- Merheba ji we re.

- Merheba, gotibhû Xelîlî. Dawûd li hêviya şereke nûh bû. Lê dengê Melo pir nerm û germ bû. Dawûdî serê xwe rakiribû û çavên Meloyî sor ditibû. Melo ji wan pirsî bû:

- Gelo destûra we heye ku ez li ba we rûnêm?

- Fermo, gotibû Dawûdî.

- Hesô, sê çay! Gotibû Xelîlî, ji çaygêr re.

Meloyî qûtiya xwe ya cigarê derhanî bû û cigareke zirav î delal pêçabû û dirêjî Dawûdî kiribû û gotibû:

Merivê mêr, ser serê min…

- Spas, gotibû Dêwûd û di berre jî cigara Meloyî girtibû. Melo jî cigara Dawûd bi destê xwe pêxistibû û destekî xwe jî danî bû ser çoga Xelîl…

Hemû heval carek din li hev hatiun û car din bûbû wek berê. Pir derbas nebûbû, çeçan jî tev hatibûn û car din civat fereh û mezin bûbû…

*

* *

Bi hatina Şerefî re Dawûd ji nava wan bûyerên par derket û rabû. Wî û Şerefî hevdû maçî kirin. Şeref jî çeçan bû û ji Dawûdî pir hez dikir. Par, dema ew şer derketibû, ew ne li Qezzê bû û çaxa ku sah kiribû, pir aciz bûbû. Xortekî nerm î dilsoz bû. Dawûd jî di nava çeçanan de herî pir ji wî hez dikir.

## KEÇA ÇEÇANÎ

Birayê Şerefî jin dihani. Amadekariya dawetê dikirin. Dawetên çeçanan ne mînanî yên kurdan bûn û ber bi yên tirkan ve jî qet ne diçûn. Adetên wan jî mîna dawetên wan bûn. Çeçan bi hev du ve pir girêdayî bûn û qedr û qîmeta ku didane hev jî teqdîra şayanê bû… Bi piranî bi hev dizewicîn. Kêm caran keçên xwe didan xortên kurd. Ew jî, ku kes ji çeçanan wê keçikê nexwesta, yan jî, keçik ne delal ba, ew tişta çêdibû… Car carina jî, xortekî kurd wî jêhatî û xwende ji xwe re dikirin zava.

Çeçan, ne ji Kurdistanê bûn. Ji navbera Kurdistanê û Sowyetistanê, ji çiyayên Qefqesan hatibûn. Dewleta tirk bi hesane tirkbûn wê wan hanîbûn, yan jî li pey hesabên ziravtir bû. Dewletê gelek ji çeçanan li Kurdistanê û li cihên avî û bi bereket bi cih kiribû. Çeçan beriya herkesî bi ser ketibûn. Dema ku kurdan hê li hêviya cotekî ga bûn çeçan bûbûn xwedî dîsqero, traktor û çînkutokan

(bîçeran). Axa û şêx ne bes bûn, bi ser de çeçan jî hatibûn. Erd ew erd bû, ax ew ax bû, lê xwedî diguherîn.

Çaxa ku çeçanan dawetên xwe çêdikirin, bangî kurdan ne dikirin. Dawetên xwe di nava xwe de çêdikirin. Carina, hinekê nas û dostên xwe yên pir nêzîk diezimandin. Ji kurdan biparêzin. Bi rastî, kurd jî ne berketiyen wan bûn. Lê ev adet carek bi cih bûbû. Ji ber ku beriya salan, di dawetekêde xortekî kurd, ji nava dawetê, keça mezinekî çeçanan hilgirtibû û biribû, ev adet derketibû, digotin hevlên Dawûdî çeçan. Lê keçik bi dilê xwe çûbû. Bavê kurikî, çend caran xwe avêtibû bextê bavê keçikê. Lê bavê keçikê hem keça xwe nedabû û hem jî bi zimaneke xirab bavê kurik qewirandibû. Piştî sê mehan, çeçanan cardin dawetekê çêkiribûn. Bavê keçikê êdî ji keça xwe bawer bûbû û wê şandibû dawetê. Keçê xwediya soza xwe derketibû. Ji kurikî re xeber şandibû û kurik bi du hevalên we re bi rext û fîşek dîtibû, firiya bû. Bi destên hevdû girtibûn û li jeepekî bîst gav ji konê wê de suwar bûbûn û jeep li bayê xwe çûbû. Ew roj û ev roj çeçanan dawetên xwe ji kurdan re qedexe kiribûn.

Niha jî daweta çeçanan bû. Şerefî bi milê Dawûdî girt û ewî ji qehwexanê deranî. Piçkî bi rê de çûn.

- Tu zanî çima min te hanî hetanî vê derê? got Şeref.

- Na, xêr e?

- Êrê. Hûn tev zanin ku îro daweta birayê min e. Ev bû çend sal û vir de, em dawetên xwe di nava xwe de çê dikin. Ji ber vê yekê, min baarîbû di nava hevalan de bi gota "Dawûd, tu îşev mêhvanê min î." Destûra hevalekî bi tenê dane min.

- Ew jî ez im, ne?

- Le… Ez dixwazim tu werî. Ew dê piçkî hilma te jî vebe.

- Baş e, Şeref. Spas.

- Saet tam di nehan de were. Ez dê werim pêşiya te.

Dawûd ji kêfan, nizanîbû dê çi bike. Zû çû malê. Fîk - fîka wî bû difîkand. Diya wî derket pêşiya wî:

- Çi ye kuro, tu vêketiyî û gazî şeytanan dikî?

- Dayê, çi têkiliya fîkandinê û şeytanan bi hevdûre heye, ez

fêhm nakim.

- Çi zanim. Ji zarotiya me û vir de em weha dizanin.

- Nexwe tu hê zarok mayî. Mezin bibe dayê, got Dawûdî û gote çip û bazda. Diya wî rahişt şimika xwe û berra pê wî da:

- Kurê nizanim çi, ne ez`ê te vêga şeq - şeqî bikim. Derî veke!..

Dawûd xwe dabû paş derî û hiqe - hiqa wî bû dikeniya. Diya wî çend caran xwe li derî da, nebû. Ji hewşê, bû kuxte - kuxta bavê Dawûd:

- Medê, çiye car din şimik di destê te de ye?

- Tu nabînî, kafir çi dibêje!...

- Hi, çi dibêje?

- Ji min re dibêje, tu hê zarok î!

Bavê Dawûdî bi tinazî got:

- Ma qey tu bi çavên mezinan li xwe dinihêrt Medê?

Bû tiqe - tiqa hersêyan. Dawûdî derî vekir. Bi destê Diya xwe yî bi şimik girt û destê wêyî dinê jî zeft kir û gote mirç û maçî kir û danî ser heniya xwe:

- Dayê, ma qet tu bîr nabî, ku tu zarok bî, ev xortê bi destê te girtiye, dergûşa kê ye?

Destê diya wî sist bû û şimik ji desta ket. Kurê xwe hembêz kir û ewî çendcaran li ser hev maçî kir.

Dawûd cilên xwe yên en delal li xwe kir. Porê xwe şeh kir. Diranên xwe firçe kir. Pêlavên xwe paqij kir û,

- De bi xatirê we, got.

Diya wî li pey wî bang kir:

- Kude lo?

- Ez dê herim daweta çeçanan.

- Li kû derê gur miriye gelo! Wan gazî kurdan ne dikirin.

- Zave birayê hevalê min e. Hevalê min pir xwest û va ez jî diçim.

- Nebî, nebî tu dil milan bigrî! Me nexe bela çeçanan. Hem keçên wan di cuwaniyên xwe de rindin, hem jî zû pîr dibin. Dûre mirov wan nas nake.

Dawûd keniya. Serê xwe hejand û ji ber çav winda bû.

Nêzîkî mala Şerefî, koneke mezin hatibû vekirin. Ji konê dengê muzîkê dihat. Li ber deriyê konê sê - çarmirovên girs milên xwe gîhandibûn hevdû û li ser piyan radiwestiyan. Dawûd nêzî wan bû.

- Qedexe, gote yekî ji wan. Çeçan û kurd zû ji hevdû cuda dibûn. Çeçan zerik bûn û kurd jî por reş, çav reş, birûreş bûn... Êrê, zerik û sorikên kurdan jî ne kêm bûn lê car din jî, mirov wan nas dikir.

- Ez mêhvan im, got Dawûdî. Hevalê Şerefî me.

- Nexwe li vira raweste, em gazî Şerefî bikin, got yekî din.

Şeref zû hat Dawûdî hembêz kir û got:

- Bibexişîne Dawûd. Di nava teşqelê de, min te ji bîr kiribû. Fermo...

- Tiştek nabe Şeref, got Dawûdî. Ez jî niha hatim.

Şerefî ji Dawûdî re kursiyek hanî. Dawûd li ser texma derî rûniştibû.

Dengê akordîyonê Dawûdî mest kiribû. Hela ew xort û keçên çeçanan ku weke kevokan dileyîstin, Dawûd ji dil ve biribû. Çavên xwe girtibû û dixwest ku bi rojan, bi mehan weha bimîne...

Carekê Dawûdî çavên xwe vekir ku çi vekirin bû! Çavên wî bûne far û man. Gote qey xewn dibîne. Çavên xwe car din girt. Muzîk berdewam bû. Na, ne xewn bû. Qapaxên çavên xwe hêdî hêdî hilda, dît ku zerî, ta bi ta li ba dibin. Çavên wê yên kesk weke yaqûtan dibeYiqîn. Dawûd ricfekî di nava xwe de hîs kir. Rojê hem dizîvirî û hem jî berê xwe dabû Dawûd û dihat... Li ser tiliyên piyên xwe diherikî... Hat, hat... û çavên yaqût û yên Dawûd î zeytûnî li hev ketin. Tîrên çavên kesk, çavên reş qul kirin û çûn di nava dilê Dawûdî de çikiyan... Xwêdanê di heniya Dawûd re havêt. Rojê lêvên xwe yên gêlazî (wîşneyî) vezeland, diranên mercan beş bûn... Tev di nava çend kêlikân de bûbûn. Rojê milên xwe vî alî, wî alî hejand û di ber Dawûd re derbas bû, çû... Hê Dawûd xwêdana xwe paqij ne kiribû, car din hat. Dawêt hew bû, lê hê xwêdana Dawûd li hêviya paqijkirinê bû... Şeref hat. Destê xwe danî ser milê Dêwûd û got:

- Te xwêdan daye!...

- !!...

- Hela ez binihêrim.

Şerefî destê xwe da heniya Dawûd û domand:

- Agirê te jî heye. Tu nexweş î.

Dawûd ji cihê xwe rabû. Çavên wî li derî bûn. Roj ber bi derî de diçû. Beriya ku derkeve, rawestiya û li ser alekî fetilî. Dawûdî dît. Bi destekî porên xwe avêt ser milê xwe û ji derî derket, çû.

- Himm… Min fêhm kir derdê te çi ye Dawûd? got Şerefî.

Dawûdî dengê Şerefî hê nûh sah kiribû. Şerm kir. Destê Şerefî girt û hejand. Şeref dikeniya.

- Tu tama devê xwe dizanî, got Şerefî.

Dawûd xwe li xeşîmiyê danî:

- Weke çi?

- Ew keçik. Vêga bi kêmanî dilê bîst xortî pê ve ye… Bi te re dibe bîst û yek… Qe çi dibe!...

- Bîst û yekê çi Şeref?

- Ji min veneşêre. Keçik meriva min e. Bavê wê serekê bankê ye… Şeref di binê çavan re li Dawûdî dinihêrt. Dawûdî guhên xwe dabû ber devê wî. Şerefî bi ken axaftina xwe hew kir:

- Navê wê jî…

- Çi ye, zû bêje, got Dawûdî.

Êdî tişkî veşartinê nema bû. Şerefî got:

- Senem e.

- Senem!...

- Êrê ya, Senem… De hadê ji te ra oxir be rêwîyê wagona bîst û yekan…

-Em dê bibînin, got Dawûdî û li bayê xwe derket, çû.

Li ser banê xanî, Dawûd di nava ciyan de, vî alî wî alî zîvirî, lê xewa wî nehat. Ji xwe ewî jî nedixwest ku razê. Hîv û stêrk ji her şevê bêhtir diberiqîn. Menaf hate bîra Dawûdî. Vêga ku Menafî sah kiriba, ewê bigota: "De îca bi halê xwe bikene." Dawûd sor bû. Çavên xwe car din girt. Rojê dest bi dîlanê kir… Porên zerî, çavên kesk û diranên sipî boz xuya bûn. Dawûd çavên xwe hişk girt. Xwest

ku xiyala rojê di nava çavên xwe de hefs bike. Lê xiyala rojê zû çû. Lêvên Dawûdî ji hev vebûn û di ber xwe de got: "Senem!..."

*

* *

Sê roj, çar roj derbas bûbûn. Dawûd êdî gumana xwe ji sûkê birî û dest bi kuçan kir. Lê Senem tune bû. Ne mala wê nas dikir û ne jî riya wê. Şerm dikir ku ji Şerefî jî pirs bike.

Roja pêncan, ber esirkî bû. Dawûd di nava sûkê de çendturan avêt. Aciz bû û berê xwe da qehwexanê. Tam ewê biketa pasaja ku qehwexane lê bû, dît ku ji dûrî ve sê keçik tên. Rawestiya. Bala xwe da wan. Nêz dibûn û her ku nêz dibûn, sûretên wan jî mezin dibûn. Dawûd berê xwe da wan û ber bi wan deçû. Hêcana wî dikir ku dilê wî di devê wî re derkeve. Porên zer li ba dibûn. Dawûdî xwe da qoziyekê. Senem û her du hevalên xwe hatin û di ber Dawûdî re derbas bûn. Piçkî dûr ketin. Dawûd ji qoziyê derket û da pey wan. Çûn ketin mexazeyekê. Pir neman, derketin. Bîst - sîh gav wêde, ketin dikana rojnamevan. Dawûdî bi lez da pey wan û ew jî dikanê bûne yek. Di devê derî de li hev qelibîn. Milê Dawûdî li sînga Senemê ketibû. Rojnama Senemê ji desta kete xwarê. Dawûdî zû hilda û dirêjî wê kir:

- Pardon…

Tîrên kesk û reş li hev ketin. Dawûd sor bhu. Senemê Dawûd nas kir. Levên xwe vezeland, bişir~î û bi dengekî nerm bersiv da:

- Rica dikim.

Û rojnama xwe ji destê Dawûdî girt. Hevaleke Senemê got:

- Bi destûra te be, em êdhi derkevin.

Dawûd careke din sor bû. Xwe ji ber derî da alî. Çavên wî li yên Senem digeriyan. Senemê bi nazikî yek car lê nihêrt û di ber re derbas bû. Hilmeke xweş di pozê Dawûdî re berjor bû û çû gîha mêjiyê wî… carekê ketibû bela Senemê. Êdî rizgarî tunebû. Dûra - dûra da pey wan…

Sê-çar kuçe çûn. Hevalên Senemê jê qetiyan. Senem bi kûçekê û hevalên wê bi kûçekê din ve çûn. Heta ku Dawûd xwe gîhande

kuça ku Senem ketibûyê, Senemê kûçe hew kiribû. Dawûdî banzda. Di seriyê destpêka kûçekê dinde Senemê dît. Senem li ber derîyekî rawestiyabû. Destê xwe havêt zîla derî û ji nişka ve li paş xwe zîvirî. Dawûd li wê naverastê mabû. Serê xwe berra berxwe da. Derî vebû. Dawûdî paş ve diçû. Dengê diya Senemê kete guhên Dawûdî. Dûre kenê Senemê bilind bû…

Deh rojan hev nedîtin. Dawûdî xwe dixwar. Lê şerm dikir ku car din bikeve wê kûçeyê. Le ku car din ji nedî ve li Senem rast be! Ev bi mirina Dawûd bû. Serbilindiya wî ji evîna wî zahftir bû. Ji xwe, ji ber vê serbilindiyê tiştên gelek hêja jî feda kiribû…

Roja yanzdehan, serê şeveqê, hê ku tavê ax germ nekiribû, Dawûd derket sûkê. Rast berê xwe da rojnamevan. Rojname hê nûh hatibûn û rojnamevan ew rêz dikirin. Dawûd li hêviya mirovî bû ku karê xwe hew bike. Ew çax pêjnek li paş Dawûd rawestiya. Bîhneke naskirî kete pozê Dawûdî. Hêdî hêdî fitilî. Xwediyê hilmê ji Dawûdî re keniya û bi dengekî germ got:

- Merheba.

Dawûd lal bû, nîvdengî got:

- Senem!...

- Tu navê min ji kû derê dizanî?

- Ne gengaz e ku mirov navê keçikeke wisa delal nizanibe…

Hinarên rûyê Senemê bûne sêvên sor. Tiştek ne hate bîra wê. Hema got:

- Ya navê te?...

- Dawûd.

Rojnamevan, bi dengên wan re, dev ji karê xwe berda û hate ba wan:

- Fermo!

-”Hurrhiyet”, got Senemê.

Rojnamevan rojnameya "Hurrîyet"ê dirêj kir. Perên xwe girt û li Dawûdî nihêrt.

- Ez jî "Hurrîyet" dixwazim, got Dawûdî.

Senemê berê xwe dabû derî. Dawûdî perên rojnamê bi lez da û

xwe gîhande Senemê.

- Ez her roj, van çaxnan, dihêm rojname digirim, got Senemê. Dawûdî xwest ku tişkî bibêje, lê Senemê wê keysê nedayê. Gavên xwe sivik avêt. Dawûdî fahm kir ku bi rêveçûna wî ya bi Senemê re, ne dirûst e. Di cih de rawestiya. Rojnamey di destê xwe de kir rûlo, çend caran bi rojnamê li destê xwe yê vala da û:

- Baş e, qet nebe me fahm kir ku em`ê wê çi çax bibînin. Hadêh karê te rast bê Dawo, got bi dengekî nizim. Dûre li dora xwe nihêrt; kesî ew sah nekiribû.

Dawûd li qehwexanê, li ber masa xwe ya her caran rûnişt. Rojnamê vekir. Xeberan teva bi devekî digotin: "Senem û Dawûd, herî dawî îro hevdû nas kirin. Vê sibehê... saet... li dikana rojnamevan..."

- Ha ji te re çaya te, got xwediyê qehwexanê. Dawûd serê xwe rakir û keniya. Mêrik wateya kenê Dawûdî fêhm nekiribû. Dawûdî kenê xwe bilind kir. Dûre, rojnameya li ber xwe da hev û dirêjî mêrikî kir:

- Ha ji te re heqê çaya te. Min perê xwe tev da bi vê.

- Mirovî jî keniya bi Dawûdî re. Rojnamê bi pişta destê xwe dahf da. Serê xe hejand û çû.

*

* *

Dawûd her sibe, bi dengên dîkan re şiyar dibû û ji tirsa ku Senemê ew roj nebîne, hetanî şeveqan şiyar dima. Çawa tav bilind dibû, Dawûd dipengizî û rast diçû sûkê. Lê yan Senem ne dihat, yan jî bi hevalhen xwe re dihat. Herzika Dawûd dişikest. Bîst rojan,

Dawûd hew bi dîtina Senem û bi bişirîneke wê qedand... Ji xwarin û vexwarinê bûbû. Tiştekî ewî venedikir. Ne mal û ne jî hevalan... Kesî bi derdê wî nizanîbû. Carina Xelîl digot:

- Dawûd, ev çi hal e?. Ne ken û ne jî xeberdan.

- !!

- Kê çi kiriye bi te? Tu ji kê eriniyî?

- Tu çi debêjî Xelîl, ev ji ku derê derket?

- Heyran ne weke te ye. Ew Dawûdê bi kêf û bi ken çûye,

Dawûdeke neûzû-bîllah hatiye... Qet nebe bigirî ku em jî bi te ra bigirîn...

- Dev ji min berde Xelîl.
- Na, bernadim.
- Dawûd keniya:
- Baş e Xelîl. Ger ku tu dixwazî bizanibe derdê min çi ye, sibê, seet di heştan de derkeve bazarê.
- Êêê?...
- Êê, mêê tune ye. Ku were hesabê te!
- Baş e heyran, bila weki te be, got Xelîl.

Dawûdî serê xwe bera erdê dabû û li erdê dinihêrt. Çi çaxa ku biketa rewşeke weha, li erdê dinihêrt. Xelîl qurta xwe ya çayê, ya dawî vexwar. Serê xwe sipart diwarê qehwexanê û fikirî. Gelo ewê sibê çi bidita!

Şeref di ber wan re derbas bû. Silav da wan û ji Dawûdî re got:

- Hey, rêwiyê wagona bîst û yekan!. Ev çi hal e?

Dawûdî bi xwe li ser hev givaşt. Çavên Şerefli çavên Dawûdî digeriyan.

Dawûdî bi ken çavên xwe ji Şerefî revand û got:

- Min hêştirê (deva) xwe wenda kiriye, ez lê digerim.
- Heger tiştekî din bûya, belkû. Lê hêşa hêştirê dijwar e, got Şerifî.

Şeref du-sê gav havêt û dûre rawestiya û domand:

- ‚Hevaltî carina bikêrhatin e. Îşev filîmekî bi hwêştir heye. Here, binihêre. Belku hêştira te be.

Şeref li bayê xwe çû. Xelîlî serê xwe xurand û got:

- Dawûd, ev çi bû? Hêştira çi, filma çi?...
- Em rabin herin li afîşên sînemayê binihêrin, got Dawûdî. Rabûn çûn li afîşan nihêrtin... Na, yek hêştirek bi tenê jî tunc bû di wan de. Serê Xelîl têkilî hev bû. Lê tişkî din ne pirsî.
- Tu têyî em îşev herin sînemayê? got Dawûdî.
- Çawa ez nayêm!
- Nexwe em zû herin malên xwe ji bona ku em bikaribin zûtir jî

derkevin.

Ji hev qetiyan. Dawûd berê xwe da malê. Ne ji bona xwarinê çûbû malê. Perên wî têr ne dikirin. Bi dizî ji diya xwe re got:

- Dayê, pere li dor mora te heye, yan na?

Diya wî li xwe xurcilî. Deh banqinotan derhanî û da Dawûdî:

- Bes e kurê min?.

- Bes e, mala te ava.

Dawûd rabû. Pêlavên xwe xiste piyên xwe û di derî re derket.

- Diya wî li xwe pey wî bang kir:

- Kurê min te xwarin ne xwar...

Deng neçûbû Dawûd. Diya wî serê xwe hejand û di ber xwe de got:

- Ev lawik ne li ser hişê xwe ye. Xwedê nîgahdarê wî be!

Li ser kursîkên sînemayê hişk bûbûn. Xelîl bê sebir li perda sînemayê dinihêrt û Dawûd jî li deryê sînemayê… Qaseke din, Şeref li pêş, birayê wî yê nûhmalî bi jina xwe re li paş ketin hewşa sînemayê. Li pey wan jî porên zer li ba bûn. Senem û diya xwe jî hatibûn. Heger ku Senem li rasta xwe biniherîya, wê Dawûd bidîta. Lê dizanîbû ku serê xwe rake, ewê pêncî çavan bi hev re bidîta. Rast çûn, li cihê cudakirî rûniştin. Şeref Dawûd zû dît. Rabû hat ba Dawûd. Dawûd rabû ser piyan û weke ku bi salan hevdû nedîtibin, wisan hevdû hembêz kirin. Ew çax çavên Senem ber bi wan de şemitîn. Dît ku Dawûd e, kêfa xwe hanî. Lêdana zengila destpêkê re, Şeref destûra xwe xwest û got:

- Te hêştira xwe dît Dawûd?

- Erê Şeref, spas…

Xelîl li Dawûdî nihêrt. Dûre li pey Şerefî nihêrt. Hetanî Şeref li cihê xwe rûnişt, çavên xwe jê ne qetand. Ew çax Xelîlî Senem dît. Henîşka xwe li newqa Dawûdî da û got:

- Hêştira te ne bi Şerefî re be gelo?

- Mimm, got Dawûdî.

Xelîl car din li Senemê nihêrt:

- Xwîşka min be, pir delal e. Te çima heta vêga ne digot?

- Nizanim. Êdî ne pêwist e ku tu sibê werî sûkhê.

-Baş e, min fêhm kir, got Xelîlî.

Filîmê dest pê kir. Muzîkal bû û Dawûdî digote qey kilam tev ji bo wî û Senem hatibûn bestekirin…

*

* *

Dawûdî dest bi jimartina rojên dawî kiribû. Janê havêtibû dilê wî. Tiştek satî ne kiribû. Dîtin, ken, têr ne dikrin. Bêhtir jî ne dibû. Xuya bû ku Senem xwe diparast. Dawûd jî ne dixwest ku navê wan derkeve. Mabû çarekî bi tenê; ew jî name bû. Dawûd rûnişt û nameyek nivîsî. Di nama xwe de digot: "Ez dixwazim bi te re bipeyivim. Du gotin jî bes e…" Nama xwe qat qat kir û xiste bêrîka xwe.

Dotira rojê, piştî ku Senemê rojnama xwe girt û ji hevalên xwe jî qetiya, Dawûdî bi-lez xwe gîhandê. Li ber devê malê gîhabû wê. Dawûdî got:

- Senem!

Destê Senemê bi zîla derî ve ma. Li paş xwe zîvirî û got:

- Dawûd zû here ji vir.

- Ez de herim. Lê qet nebe vê bigire.

Dawûd name dirêjî Senemê kir. Senemê namê girt. Di nava destê xwe de givaşt û li zîlê da. Dawûd di ber re derbas bû çû.

Senemê nama Dawûdî çend caran xwend. Dûre wê jî nameyeke kurt nivîsî.

Bû sibe. Senem û her du hevalên xwe di ber Dawûdî re derbas bûn. Senemê hêdîka namê ji bêrîka xwe derhanî û berra xwarê da. Dawûdê li dora xwe nihêrt. Ji wî nêziktir kes tune bû. Bi lez xwe gîhandê. Ji erdê hilda û bi hêcan vekir û xwend. Senemê digot: "Ez jî dixwazim ku em hev çêtir nas bikin. Tu jî dizanî ku kêfa min jî ji te ra te. Du sibe ez diçim Îzmîrê. Ji ber vê yekê, sibê, nîvrokî, wê dema ku kes baare ji german derkeve devê derî, li hewşa dibistana ku nêzi mala me ye, raweste. Ku ez bikaribim, ezê werim…"

Ew şev xew nekete çavên Dawûdî. Zor kir sibe. Hetanî nivro ji

malê derneket. Nîvrokî çû hewşa dibistanê. Pişta xwe da dîwêr û rûnişt. Pir nema, bejna zirav xuya bû. Dawûd rabû û bi destên Senemê girt. Herdû jî diricifîn.

- Ez baarim dûvdirêj bimînim, got Senemê.
- Senem, ez bêyî te baarim biqedînim.
- Bi rastî, ez jî hoyî te bûme.

Destê Dawûdî çû porên Senemê. Miz da. Nerm bûn. Dawûdî xwest bi satan porên Senemê mizde. Li xweşa Senemê jî diçû. Paşê Dawûdî lêvên gêlazî xiste nava lêvên xwe û dûdirêj ew mêtin. Xwe dabûn talda dibistanê. Pêşî valahî bû û li wê nêzîkê tu xanî tunebûn. Senem seranser diricifî… Lêvên xwe ji nava lêvên Dawûdî rizgar kir û got:

- Bes e Dawûd. Ez êdî rabim.
- Çi zû? got Dawûdî.
- Bi rastî jî bes e. Careke din…
- Baş e, tu çi çax vedigerî ji İzmîrê?
- Deh rojeke din.
- Tu mekî yanzdeh ha!
- Çima?
- Panzdeh rojên din ez diçim Edenê.
- Hetanî wê çaxê ez têm.
- Em dê karibin car din li vir hev du bibînin?
- Çiqas ez vegerim.

Dawûdî Senem hembêz kir. Porên wê, lêvên wê ruyên wê li ser hev maçî kir. Senemê bi hezkirin li Dawûdî nihêrt û bi rê ket. Dawûd xwe di ser dîwarê hewşa dibistanê re qeliband. Senem ber bi malê de çû û Dawûd jî, ber bi dibîstanan de…

Çardeh roj derbas bûbûn, lê Senem hê nehatibû. Dawûd bi dileke şikestî xwe li çûnê amade kir. Û roja panzdehan xwe di otobusê dît. Çavên Dawûd kesî nedidîtin. Hevalên wî tev rêz bûbûn û heta ku otobus ji ber çavan winda bû, ji Dawûdî re destên xwe hejandin.

## KARKERÊN KURD

Yehya û Mihemedê Cizîrî êdî ne dihatin zeftê. Rojên şembî û yekşeman wenda dibûn. Dawûd ketibû mereqa wan. Carina wan digirt û dipirsî. Lê bersîvên wan, Dawûdî, têr ne dikirin.

Edî Menaf bêxêr bûbû. Felekê, felaka wî şaş kiribû. Radibû, rûdinişt pesna Felekê dida. Ji tahmê derhanî bû. Dawûd jî dil girtibû. Her ku xiyala Senemê dihate ber çavên wî, axîn hildida. Lê kesî sah ne dikir û mîna Menaf serê xwe jî ne xwaribû. Gotineke hebû: "Mirovên bi koran re razên şaş, radibin!" Ji ber vê yekê, Dawûd ji Menafî dûr radiwestiya. Yehya û Mehemed jî, ji herkesî dûr direviyan.

*

* *

Li Edenê berf nedihat. Ev bûbû zivistana pêncan, ku hê nûh berf didîtin. Û wê berfê jî erd ne girtibû. Lê car din jî dengên def û zirneyan xelkê tev ji cîhên wan rakiribûn ser piyan. Ber şeveqê bû. Edene sipî-boz bûbû û xelkê li ber def û zirneyan dawet girtibûn. Bi derketina tavê re, ew berfa nîvtilî, heliyabû çûbû.

Lê zivistanan, rojên sar jî ne kêm bûn. Rojekê ji wan rojên sar bû. Sireke hişk lêv ên mirovan diqelaşt. Car din şembî bû û Yehya û Mihemed rabûbûn û xwe dişidandin. Dawûd çavên xwe nîvçe kir. Dît ku Yehya milaniya (atqiya) xwe li dev û pozên xwe digerîne. Dawûdî hêdîka destê xwe dirêj kir û atqiyê kişand ber xwe. Yehya li hev zîvirî û bi milaniyê re hat heta ber pozê Dawûd. Dawûdî milaniyê hişkî girtibû:

- Dîkên serê beyaniyan, bi ku derê ve car din?

- Qet, got Yehyayî.

Dawûdî dev jê berneda:

- Çawa qet? Serê şeveqê û vê sermê rabin xwe bişidînin, dev û pozên xwe binuxumînin û ez bipirsim, bibêjin, qet.

- Em dê herin mêhvaniyekê, got Mihemed.

Dawhûd ji nedîve got:

- Hûn min jî bi xwe re nabin?

- Tu dizanî...

- Serseran Dawûd. Em çawa te nabin, got Yehyayî ji dil. Dawûd pekiya û rabû. Di nava çend kêliyan de xwe amade kir. Yehya û Mihemed, her yek ji alek ve ketin milên Dawûd û dane nava sûka Edenê... Pir çûn. Ji nava bajêr derketibûn. Ketibûn taxên (mehellên) xalî. Kuçên tev bi herî û li cihna heta ber çoçê bi av û çirav dest pê kiribûn. Çare tune bû... Kirin ne kirin pêlavên wan tijî av bûn û gorên wan, delingên şalên wan tev şil bûn. Baranê jî dest pê kiribû û wisan dihat ku êdî ne dibû ku gavekî din bihavêjin. Li wê nêzîkê qehwexaneyek hebû. Xwe bi zorê havêtin wir.

Baranê ber nîvrokî betilî û rawestiya... Dawûd, Yehya û Mehemed ji qehwexaneyê derketin. Pir neçûn. Li ber derîyeke nizim sekinîn. Yehya derî dahf da û derî bi qirçînî vebû. Li hewşê kes tune bû. Hewşa biçûk î çarqozî zû hew bû. Li ber derîyeke şîn rawestiyan. Yehya li derî da dengekî qurs î qalind bilind bû:

- Kî ye ew?

- Yehya.

Derî bi lez vebû. Mirovekî sîh û pênc yan sih û şeş salî ji wan re keniya. Diranên wî yên pêşî, bi nevî zêrkirî bûn. Simbêlên wî yên weke dengê wî qalind, lêvên wî wenda kiribûn. Mirovî bi destê Yehya girt, hejand. Dûre bi destê Mihemedî girt. Çavên wî li Dawûd bûn. Yehya pêlavên xwe derdixist. Di ber re jî got:

- Ev jî Dawûd e...

Mirovî destê xwe dirêj kir.

Ristem..., çavên xwe li hûndur gerand:

- Sipas, got Dawûdi:

- Mihemed çavên xwe li hundur gerand:

- Ka, kes tune ye.

- Hemo çû nan û Selîm jî çû ba hevalekî me. Ew`î werin... Ez sobê dadim. Hûn şil bûne.

Ristem derket. Yehya gorên xwe derhanîbû û vêketibû tilîken xwe miz dida. Dawûd li ba soba sar rawestiyabû û destên xwe difirikand. Mihemed jî çûbû ber pencerê û li rê dinihêrt. Car din bû

xumînîya asmîn. Mihemed xwe tirş kir û got:

- Mîratê dîsan dest pê kir!

Derî vebû. Ristem bi hinek darik û sê - çar quran ve kete odekê. Dawûd deriyê soba sac vekir. Ristem çokên xwe da erdê. Darik û xurman bi cih kir. Dibinî de du-sê bizot mabhûn. Ristem pif kir. Bizot sor dibûn lê pênediketin. Ristem li dora xwe nihêrt û perçeyek ji rojnameyeke kevin dît. Perçê rojnamê da ber bizotan û pif kir. Pêket. Lê ev car jî, sobê dûman kir. Çavên Dawûd ji dûmanê sor bûn. Mihemed felqeyekî pencerê vekir. Dawûdî gorên xwe şemitand û danî ber sobê. Çaxa ku Dawûdî serê xwe rakir, dît ku Ristemî bi dilovanî li wî dinihêrê. Dawûd mizwicî. Bû terqîniya derî. Mihemed beriya Ristemî xwe gîhande derî. Hemo û Selîm bi hev re ketin hundir. Bêhna nanê germ kete pozên wan. Yehya ji cih rabû û perçekî ji nan jêkir û got:

- Nanê germ pir xweş e.

Dawûdî jî dilê xwe bijand nanê germ, lê şerm kir.

Ristem, Dawûd bi Selîm û Hemo, da naskirin. Selîm miroveke dirêj î bi nav-pî bû. Serê wî digîha lampê. Bi rastî, xanî jî piçek nizim bû û Selîm bi hêsanî karîbû destê xwe bida beştên odekê. Odek jî biçûk bû û hew têra Hemo dikir. Miroveke qut î qalind bû Hemo û zikê wî jî têra xwe hebû. Hemo destê xwe da zikê xwe û got:

- Ev hemû ne goşt e. Nêvî bayê savara gund e û nêvî jî bayê fasûliyên vir e. Mihemed bi dengekî bilind keniya û got:

- Xwezî yê min jî çiçkî zikê min hebaya! Xem ne dikir bila ba baya.

Tev bi hev re keniyan. Hemo têr ne bûbû. Domand:

- Memo, ku tu pir dixwazî, ha ji te re zikê min.

- Ji Dawûd pê ve kes bi vê gotinê ne keniya. Kenê Dawûd di devê wî de sar bû.

- Tu çima sekinî? ßikene keko. Ken derman e. Me ji bîr kiriye. Qet nebe tu bikene ku em jî bi te kêfxweş bibin, got Selîmî. Ew çax bêdengiyeke kûr kete odekê. Ristem rabû û got:

- Em tev birçî ne. Ez tiştekî sivik amade bikim.

Selîmî pişta xwe dabû dolaba firaqan. Qet li xwe ne xurcilî. Destê xwe dirêj kir, firaqekî zeytûnên reş, paketekî helaw û sê tasikên avê hanî xwarê. Ristem sifre hanî û raxist. Tûpê biçûk bir ber derî. Tawekekê danî ser tûpê. Rûnê xwe baş qijiland û dûre bi qasî deh hêkan şikenand. Hemo nan perçe kir û belav kir. Tev li dora sifrê rêz bûn û çarmêrkî rûniştin. Dawûd pir xwest ku çarmêrki rûnê, lê nebû. Li ser çokê rûnişt. Tawek hate ber wan.

- Pir nexwin. Ez dê vêga fasûliyan deynim ser êgir, got Ristem. Dûre li Hemo nihêrt û bi tinazî got:

- Ez para te cuda bikim?

Hemo pariya xwe ya mezin havêt devê xwe. Tev li hêviya bersiva Hemo bûn. Hemo pariya xwe cût, daqurtand û tawekê ber bi xwe de kişand û got:

- Na lo, ne pêwîst e. Bi xwedê, ez`ê ji we re jî bihêlim.

Ev mizawiriya Hemo teva kenand. Dûre Hemo henîşka xwe li çoka Dawûdî da:

- Bixwe. Li vê malê kî nexwe birçî dimîne.

- Ez dixum, got Dawûdî bi şermî.

- Na, tu naxwî, temaşe dikî. Meke ku ez bi zor bixim devê te!

- Hemo tu çi dixwazî ji lêwik? Çavên te lê ye ku tu wî bidî şermê û para wî jî bihêlim.

- Lê, got Hemoyî. Yan na ez dê çawa têr bibim?

Mizawirî li ba Hemo gelek bûn. Yê ku ji mizawiriyên Hemoyî re xerîb bû, Dawûd bi tenê bûhu. Bi vê mizawiriya wî jî car din ji Dawûdî pê ve kes ne keniya. Lê vê carê Dawûdî dilê xwe bi kenê têr kir.

Baran rawestiya bû. Lê dîsan jî hewr hebûn û diyar ne dibû ku ew`ê paşî çawa be. Ristem gurzekê darik û çend qurmên din jî hanîbû û li ber sobê danîbu. Gorên Dawûd zûwa bûbûn. Dawûdî gorên xwe hilda. Yên Mihemed û Yehya jî dirêjî wan kir. Mihemedî gorên xwe girt. Yehya bi destan got bila bimînin.

Pirtûkeke stûr hebû di destê Selîmî de. Selîm di nava pirtûkê de winda bûbû. Hemo sifre hildabû û firaqan dişûşt. Mihemed çû

alîkariya Hemo. Ristem fasûliyan amade dikir. Yehya dabûn ber birincê, dineqand. Dawûd jî ketibû ser rojnameya wê rojê.

Selîmî gote req û pirtûke girt. Bi dengê reqînîyê re Dawûd veciniqî. Li Selîmî nihêrt.

- Roj wê bê, got Selîmî.

Dawûdî fêhm ne kir. Çavên xwe ji yên Selîm neqetand. Selîmî dengê xwe bilind kir:

- Roj wê bê, zordar namînin wê herin…

Ristemî qapaxa qûşxanê danî ser û got:

- Tu dibê zordarên Kurdistanê jî dê herin yan cihên wan xweş in?

- Cihê kîjan zordarî ne xweş e gelo? got Selîm.

- Êê?...

- Êê-mê tune ye Ristem. Ew dê roja wan jî bêt. Lê çi çax e, ez nizanim. Dîrok û gelê Kurdistanê ew`ê fermanên wan rakin.

Dawûdî henîşkên xwe danîbû ser çokên xwe û geh li Selîm û geh jî li Ristem dinihêrt. Ne dixwest ku yek herfekî bi tenê birevîne. Selîm li Dawûd nihêrt û dûre li Ristem nihêrt û berdewam kir:

- Tu zordar bi dilxwestinê ji tu welatî derneketiye. Ev tête ser wê wateyê ku tu gel bi qurban û heyranan ne bûne xwediyê mafên xwe. Bi kurtî; çemên şîn sor diherikin roja rabûna ser tapanan (lingan). Ew çax zordar êdî wext nabînin ku li dû xwe binihêrin…

- Yanê? got Dawûdî. Hê nûh devê wî qul bûbû û tiştek gotibû.

- Yanê xorto, yanê kekê mino, berê bixwîne, paşê hilde şûrê xwe û bibe melkemot, got Selîmî. Dawûd wî hanîbû hêcanê.

- Madem dawî melkemotbûn e, xwendin çi ye? got Yehya.

- Ax melle ax!... Ez çi bêjim, nakeve wî seriyê hişk. Ma lawo qey ji te hewe ku ew`ê Kurdistan bê xwende û bê zane serfiraz bibe. Rabe here tu nimêja xwe bike.

Bersîva Selîmî, Yehya hêşandibû. Lêvên xwe daliqand û got:

- Ez nizanim. Yê min ez musluman im. Heta şoreşê ez bi we ra me. Lê piştî şoreşê ez nizanim…

-Baş e baş e, va îro te got şoreş. Heta vê gavê te ew jî fêhm ne dikir.

- Em ne ewçend ker in lo, tu jî ha! got Yehyayî bi hêrs. Selîmî şaşiya xwe dît û li ber dilê Yehyayî geriya:

- Haşa, bibexişîne Yehya. Min pir hajot ser te.

Yehya dilekî kişand û got:

- Tişt nabe Selîm. Em heval in.

- Sifrê rast bikin, fasûlî hatin, got Ristemî.

Hemoyî got:

- Çi zû!...

- Na lo ez tinazan dikim. Ma tu şerm nakî li ba mêvanan dikî xurxur?

- Çi çax?... Tu rûyê xwe reş dikî…

Dawûd keniya û got:

- Ev bû saetek tu radizê.

Hemo rabû çû ser çavên xwe şuşt.

*

* *

Nîvê şevê her sê heval rabûn, xatir xwestin.

- Keko, min ji te pir hez kir. Her tim were. Mal mala te ye, got Ristem ji Dawûdî re. Dawûd kêfxweş bûbû. Destê Ristem hejand û dûre li Selîm nihêrt û got:

- Kek Selîm, roj wê bê ne wisan?

- Helbet, got Selîm û heniya Dawûd maçî kir û berdewam kir:

- Xorto, em pir dibin. Lê ez bawer im, ew`ê Kurdistan bi destên we xortan ava bibe.

- Li xweşa Dawûd çûbû.

- Xwezî!... got û meşiya. Dengê Selîmî ji dûrî ve hat:

- Dilxwestineke ji dil, nivbiserketin e xortê delal. Vêya qet ji bîr meke…

Di rê de Dawûd kete milê Yehya. Mehemed jî kete milê wî yê din û di nava tarîtiyê de dane nava av û çiravê. Heyhemin ewê şil bibana. Ji ber vê yekê, av çirav, herî…Êdî xem ne dikir.

SERDAN

Çend roj derbas bûn. Dan û standinên Dawûd û Mihemedê Cizîrî û yên Yehya ji her gavê germtir bûbûn. Xwendegeh, hevaltî. Li paş mabûn. Ev germayî tiştekî din bû. Çi cara ku digîhan hev, ji kurd û Kurdistanê pê ve behsa teştekî din ne dikirin. Bi piranî Yehya dihaxivî. Car carina Mihemed axefên wî dibirî û yan ji, bi aweyekî din jê re temam dikir. Dawûd her tim li wan guhdarî dikir.

Ji rojan yekşem bû. Mihemed, Dawûd nuquçand. Dawûd şiyar bû û got:

- Xêr e?

- Ez dê herim malekê. Tu dixwazî bi min re werî?

- Baş e, got Dawûdî. Tu vêga here hewşê, ez têm.

Dawûd rabû û cilên xwe li xwe kir. Perdîsonka xwe, ya ku bavê wî beriya sê salan hejû re kirîbû, hilda. Milên xwe tê re kir. Destên wî bi tev çar tilî ji milên çaketve li derve man. Dawûd mezin bûbû, bejin avêtibû. Lê perdîson weke xwe mabû. Dawûd çekêt ji xwe kir û perdîsonê bi niyeta çakêt li xwe kir.

Mihemed li devê deriyê hewşê rawestiyabû. Dawûdî gîha Mihemedî. Hewa ne xweş bû. Car din hewrên reş berbihevdû ve bi lez diçûn.

- Ew dê baran were, got Mihemedî.

- Lê, wisan tê xuya.

- Mîratên pêlavên min jî bêxêr in. Kêlek-mêlekên wan tev vebûne.

Dawûd li pêlavên Mihemedî nihêrt. Dilê wî şewîtî. Ne pahnî mabûn û ne jî hal di pêlavên Mihemed de.

- Mihemed, wisan nabe, got Dawûdî. Were ez pêlavên xwe yên sporê bidime te. Heta ku tu vana bidî pînekirin, bi wan biqedîne. Beradayîne, lê car din jî, ji pêlavên te çêtir in. Mihemedî dilê xwe bi xwe şewitand, lê bi xebera Dawûdî kir û paş ve zîvirîn.

Taxa ku berê xe dabûnê, mînanî wê taxa wan karkerên kurd bû. Kuçên bi herî û li cîhna golên avê û zarokên bi tena qazaxan... Dawûd fêhm kir ku mala diçûnê, tijî tazî û birçî bû. Dilê wî xweş bû.

Baş bû. Ew`ê ji ber perdîsonê xwe şerm nekira.

Mirovekî kal û komek hestî derî vekir. Mihemed çû destê mirovî ramûsa. Dawûd jî weke Mihemed kir. Derbasî odekek firehbûn. Du alî kulavên kevn raxistî bûn. Kulav li ber dîwanekê mezin hew dibûn. Li ser kulavekê nivîneke raxistî hebû û di bin lihêfeke teba î bi pîne, jineke duta radiza. Li ber serê wê, li dora wê jin û zarok kom bûbûn. Yên mayîn jî li ser kulavê din rêz bûbûn. Hebû deh kes li odekê.

- Pîreka min e, got kalo. Ev bû sê roj di nava ciyan de ye. Evanan jî zarok û nevîyên min in.

Dawûdî pirsî:

- We biriye ser doktorî?

- Ez çi zanim qurban... Ma qey ziman heyew?... Me tiştek nexist serên hev. Ji me re derman nivîsîn û me ji ser serên xwe avêtin.

Dawûd serê xwe berra berxwe da. Kalo li Mihemed zîvirî:

- Ka Yehya?

- Çû maleke din. Ew ê sibehê yan jî du sibe were vir.

Çay hate ber wan. Çayên xwe girtin. Kaloyî firteke mezin kişand. Dûre dest bi çîroka xwe kir. Ji başûrê Kurdistanê hatibûn. Par ji ber zulm û zordariya Saddam reviya bûn û bi dizî ketibûn bakurê Kurdistanê. Malên welatparêz wan veşartibûn ji ber leşkerên tirk. Dûre bi pence talî û tengasîyan gihabûn Edenê û li Edene, birçî, belengaz û bêxwedî mabûn. Çend kurdên welatparêz ji wan re xanîyeke du odek dîtibûn. Yanzdeh kes li ser zikên hevdû bûn. Du bûkên sitûxwar û pênc neviyên sitûxwar ketibhûn ser pişta kalo yî xûz. Kurekî kalo di şer de şehîd bûbû û yê mayîn jî, li serê çiyan bû. Şeş mehan ji wî bê xeber mabûn û êdî jê bê guman bûn... Ew kalê bêqudûm her ku diçû, dibû şêr. Dema behsa pêşmergeyan dikir, radibû ser çokan û weke ku di nava şer de be, dikete hêcanê. Dawûd û Mehemed bi çavên fireh li wî guhdarî dikirin û li ber kalo bûbûn poncik. Pîra di nava ciyan de jî rabûbû û rûniştibû û weke ku kalo çiroka hinekî din digot, guhên xwe bel kiribû û di ber re jî serê xwe

dihejand.

Wext zû derbas dibû li ba kalo. Mihemedî destûrê ji wan xwest. Lê kalo bû dirdirk û wan berneda:

- Çawa hûn dê ji mala min birçî herin. Ez napejirînim.

- Me ji te qebûl got Dawûdi.

- Welleh ji min ne qebûl. Goşt û birinc tune ye. Xwedê çi da Êrê?

Mehemed di wateya hêrê de du caran serê xwe hejand. Dawûd car din li dewsa xwe de rûnişt. Pir nema, bûkên kalo sifre raxistin. Çend nanên tendûrê, sê pîvazên hişk û sê kevçî danîn ser sifrê. Dûre şorbenîsk hate ber wan. Mehemedî şorbê vegerand:

- Xwîşka min. Eva ji min re pir e, got ji bûka mezin re. Ez baarim-hemû bixwim. Bila ziyan nebe. Nêvî bes e.

Bûke bê xeberdan tasika Mihemedî bir. Kalo pîvazan yek bi yek danî ser çokên xwe û bi kulmiskan wana felqe kir.

- Tama pîvazên bi vî awayî têne şikenandin pir xweş e, got Mihemed.

Hê şorbên wan xilas nebûbûn, firaqeke mezin û bi ser savar hate ber wan. Kaloyî tasika xwe ya şorbê ya ku hêj bi nêvî bû, dahf da û kete ser savarê. Dawûdî zikê xwe bi şorbê û nanê têr kiribû. Çaxa ku Mihemed şorba xwe vegerandibû, Dawûdî fêhm kiribû ku diviya ku pir nexwe… Ji ber vê yekê, di dilê xwe de gotibû: "Qet nebe ez zikê xwe bidim ber şorbê û xwarina din çi be jî, ez hindik bixwim."

Dawûdî sê-çar kefçî savar xwar û kişiya. Devê kaloyî tijî bû. Dawûd, beriya ku kalo tişkî bibêje, got:

- Xwedê zêde bike.

Û Dawûd ji ser sifrê rabû.

- Te nexwar qurban, got pîrê ji Dawûdî re. Dawûdî li pîrê nihêrt. Çavên wê pir germ bûn. Diya Dawûdî hate ber çavên wî. Paşê got:

- Na dayê, min gelekî xwar.

- Noşîcan be kurê min…

Kalo bi wan re derket û hat heta berderiyê hewşê. Mihemedî hêdîka destê xwe yê girtî berra bêrîka kalo da û destê xwe vala

kişand. Kalo sor bû.

- Bibihûre, got Mihemedî. Lê qebûl bike.

Û Mihemed çû destê kaloyî. Dawûdî jî li bêrîkên xwe xiwrcilî. Kaloyî hişk bi destên Dawûdî girt û got:

- Na kurê min. Bêhtir min nedin şermê. Hûn jî li xerîbîyê ne. Yekî ji we da, bes e.

Dengê kaloyî bi biryar bû. Dawûdî dev ji pere danê berda û ew jî çû destê kaloyî.

*

* *

Dawûd û Mihemed ji taxê derketin. Serên herduyan jî di ber wan de bûn. Dawûd kete milê Mihemed û got:

- Binihêre Mihemed. Virdê, wêde nizanim. Vêga te xwe bê pere hiştiye. Perê min çi be, bi nêvî... temam?

Û Dawûdî ji bêrîkên xwe çar deh banknotên şîn derhanîn. Du heban da Mihemed û duduyên din jî car din xiste bêrîka xwe. Bavê Dawûdî her meh jê re pere dişand. Carina heftê carina heştê û carina jî sed… Çi ji destê jî bihata… Lê rewşa Mihemed qet ne xweş bû. Dawûd tu car sah nekiribû ku ji Mihemedî re pere hatibû ji cihekî. Û Dawûd tu caran Mihemed di qantîna xwendegehê nedîtibû ku xwarin, vexwarin yan jî şêraniyekê sitandibû. Carekê jê pirs kiribû. Bersiva Mihemedî kurt bû:

- Ez havînan kar dikim. Nêvî didim malê û yê mayîn jî, ji min re dimîne.

Baraneke dijwar dest pê kir. Di nava çend kêliyan de ji por hetanî neynûkê şil bûn. Baz didan mîrata baranê bi bazdanê re bêhtir hêrs dibû û bi xezebî dihate xware.

- Baş bû ku te phêlavên xwe da min, got Mehemedî.

- Hii?

- Pêlav dibêjim, pêlav…

- Ha… Min ji hewrên reş fêhm kiribû ku rewş, rewşa baranê bû.

Pêşgîrên xwe hildan û porên xwe zuwa kirin. Yehya li halên wan dikeniya.

- Berê cilên xwe derxin, got Yehyayî. Hûn dê nexweş bikevin.

-Te got cil, hate bîra min, got Mihemedî. Tu cil milên zêde tunene li dor morên we? Min bidaya Kalo, ew`ê baş bibaya.

Yehya ber bi dolaba xwe de çû. Dawûd hema perdîsona xwe jî xwe şemitand û got:

- Eva yek… Bûbû bela serê min. Êdî min ji berî şerm dikir. Çakêtê min qalind e.

Yehya bi tev torbeke tijî gore, fanîlye û qazaxan wve hat û got:

- Ma hûn dibêjin gelo ez îro çûbûm kû derê?

- Aferîn Yehya, got Mihemedî. Mala te ava!

Û Mihemedî bi ken domand:

- Birina wan jî li ser te. Kaloyî li te dipirsî.

- Baş e, serçavan.

Ew şev Dawûd, di xewna xwe de bûbû pêşmerge û li serê çiyan bû. Dijmin leşkerên ereb bûn, lê cilên leşkerên tirk li wan bûn. Heta bisehê deh- panzdeh leşker kuşt Dawûd.

## KUÇÊN VALA

Meha sibatê nêzîk dibû. Dawûdî li cîhê xwe ranediwestiya. Deh rojek mabû ji semestrê re. Dûre… dûre rojên bi Senemê dagirtî… Xemla şevên Dawûd… Mêhvanê şevên Dawûdî…

Her rojek bûbû weke mehekê. "Ax, ax!... De hew bin…" digot Dawûdî. Heta doh- pêr kenê xwe bi Menafî dikir. Lê vêga kezeba wî jî diperitî. Qet nebe Menafî eşkere dikir û xwe piçekî vala dikir.Wî çi dikir? Dihavêt zikê xwe û zik lê diwerimhi. Hew rojekê bi tenê ji devê xwe revandibû û ji Menaf re gotibû:

- Qet xwe qure meke Menafo. Min jî, ji xwe re yekî dîtiye…

- Kî ye, zû bêje, gotibû Menafî.

- Horîyek e. Porzêr e, çavyaqût e.

- Tu û Xxwedê bes e. Tu Felekê li ber çavên min reş dikî. Horîya te li te pîroz be.

*

* *

Dawûd bi firêngirtina otobusê re veciniqî. Rêwîyên Wêranşarê peya dibûn. Mabû saet û nîvek rê. Êdî Dawûdî hew çavên xwe girt.

Saet çarê sebehê, Dawûd baholka xwe ya biçûk î pênc salî ji destê alîkarê şofêrê otobusê girt. Tarî zulmet bû. Bayeke hişk li singa wî dida. Herîyê qeşa girtibû. Dawûd bi lez xwe gîhande malê.

Çaxa ku Dawûd li zîla deriyê malê da, bavê wî şiyar bû û li ber lampa şevê sobe dadida. Dizanîbû ku wan rojan ew dê Dawûd bihata. Bi lez derî vekir. Kurê xwe hembêz kir û ewî rast bir ber sobê. Bi dengekî nizim dihaxifîn. Lê ji odeka din dengê diya Dawûdî hat:

- Seyda, ew ne dengê Dawûdî ye?

- Belê. Dawûdî li çavên bavê xwe nihêrt. Bavê wî serê xwe berra ber xwe da û got:

- Ji te re birayekî din çêbû.

Dawhûd rabû û çû ba diya xwe. Destê wê girt û maçî kir.

- Xwedê rizqê zarokan didê got Diya wî. Lêvên wî diricifîn.

- Baş e, baş e, hundur tijî bikin. Dawet e. Dûre xwe bihavêjin dexlê Xwedê, got Dawûdî.

Çavên diya wî tije bûn. Hate ber girînhê. Dawûd poşman bûbû û xwe car din havêt destên diya xwe û got:

- Dayê, min cihaltî kir, bibuhure.

- Tişt nabe kurê min, tişt nabe…

- We navê wî çi danî?

- Bavê te dibêje Hikmet. Ez dibêjim Abdullah. Tu wê biryar bidî. Dawûdî kêfa xwe ji Hikmetî re ne hanî,

- Abdullah baştir e. Yê min bi xwe, ez`ê jê re bibêjim Apo. Êdî hûn çi dibêjin, bi kêfa xwe ne.

- Wey mala te ava, got diya wî û dûre li bavê Dawûdî Hegeriya:

- Seyda, te seh kir? Kurê min got Apo. Anku Abdullah.

- Herê herê, got bavê Dawûdî bi dengekî xemgîn û du- sê caran" la hewle wela…" kişand û got:

- Ji xwe ew dê bi ya te baya Medê. Baş bû ku Dawhudî jî xwe şaş nekir.

Bû tiqe-tiqa diya Dawûd û keniya. Paşê got:

- Dilê xwe bi xwe neşewitîne Seyda. Navê yê di rê de, ji te ra ye.

- Heylo, "kerro memir buhar hat"... got bavê Dawûdî.

Bû sibe. Dawûdî bê taştê xwe havêt sûkê. Dilê wî dikira bisekiniya. Berê xwe da rojnamevan. Rojnamekê girt û li sûkê vî serî, wî serî çû û hat. Çavên wî li saetê bûn. Ne Senem û ne jî hevalên wê xuya bûn. Ji serma diranên wî li hev diketin û pir jî westiya bû...

Deriyê qehwexanê vekir. Di qoziyê de Melo, Nodquriş, Dîko û çend hevalên din rûdiniştin. Berê Melo li derî bû. Çawa Dawûd dît, ji cih rabû û got:

- Ehlen, ehlen hekdu çavên min.

- Çavên te ne êşin.

- Wey Dawo, kurê min, tu çi zû hatî, got Dikô bi tinazî.

- Nodquriş û yên mayîn jihi tev rabûn. Yek bi yek Dawûd hembêz kirin. Paşê bi hev re rûniştin. Heso, xwedyê qehwexanê, çayek danî ber Dawûd û got:

- Ev jî, ji min.

Dawûdî bi destê Hesoyî girt:

- Spas kek Hesen.

- Na xêr, ez spas dikim. Te piyên vana hînî vira kir. Ew roj û ev roj nanê min ji wan derdikeve.

- Dev ji tiraşê berde Heso, got Melo. Çayên me jî nûh bike.

- Ser seran, got Hesoyî.

Melo li pey Hesoyî got:

- Ha, ji me ra tawlekê jî bine. Ez diranên Dawûdî bikşînim.

Dawûd keniya:

- Diranên min diqedînin. Yên te çawa ne?.

- Yekî kursî pir dêşe van rojana. Tu wê bikaribî? got Melo.

- Em dê binihêrin.

Dotira rojê, roja din jî pêjna Senemê xuya nebû. Dawûdî dikira dîn bibaya. Her roj diçû heta ber deriyê mala Senemê. Guhên xwe dida ber derî û ne dengekî û ne jî hisekî sah dikir.

Semester panzdeh roj bûn. Derdê Dawûdî bûbû bi qasê dinyakê.

Ketibû roja çerdehan, lê hê jî Senemê ne xuya bû.

Dawûd li sûkê, serî di ber de digeriya. Ji nişka ve hevaleka Senemê dhît. Dilê Dawûdî bû çivîk û hate ber devê wî. Di cihê xwe de rawestiya û çavên xwe ji keçikê neqetand. Keçik nêz bû. Wê jî Dawûdî dît. Berê kêfa xwe hanî, dûre bi çaveke çikestî li Dawûdî nihêrt. Dawûdî gavekî ber bi wê de avêt. Lê keçikê xwe ji Dawûdî dûr kir. Berê xwe jê guherî û bi riya xwe de çû. Di wê sermayê de Dawûd xwêdan da. Weke ku hinekan ava kelandî bi ser serê wî de rijandibûn. Hêvîyeke wî hebû û ewê jî berê xwe jê guherî bû. Dawûd xwe weke sêwîyan dît. Çima keçikê lê wiha kiribû? Çi şaşiyek kiribû? Lê ku tiştek bi Senemê bibe! Rast berê xwe da mala Senemê. Xistibû serê xwe, ew ê li zîla derî bidaya.

Bi dengê zîlê re mirovekî şêst- heftê salî xuya bû.

- Apo, min te aciz kir. Min ê li Mudîr beg bipirsiya, got Dawûdî.

- Kîjan mudîr? got kalo.

Dawûdî fêhm kiribû ku êdî ew der ne mala Senemê bû. Lê belku kalo tiştek zanibû. Ji ber vê yekê Dawûdî berdewam kir:

- Mudîrê banqê. Ewê çeçan…

- Ha!... Ew mudîrê ku beriya me di virde rûdinişt, ne wisan e?

- Yanî ji vir bar kirine?

- Ji zû ve. Ev bu çar meh. Min sah kir ku çûye Stanbolê.

- Tu sax be apo. Min nizanîbû. Bibûhure, got Dawûdî.

- Fermo, got kalo û derî hêdîka girt.

Dawûdî hilmeke bi deng kişand. Pekêta cigara xwe derhanî. Yek cigarek bi tenê mabû di pakêtê de. Cigarê di nava lêvên xwe de bi cih kir. Niftikê pêxist. Pakêta vala di nava destê xwe de givaşt. heciqand û ji dêleva paketa vala ve niftika tije havêt. Niftik çû di nava heriyê de cik bû. Dawûd bi halê xwe keniya. Pakêta vala ji destê xwe berda û pê li niftika tijîdarik kir, di nava heriyê de baş dewisand û derbas bû çû.

Piyên Dawûdî ew biribû hewşa wê dibistana ku li wir bi destên Senemê girtibû. Lêvên Dawûdî ricifîn û got: "Senem! Ka ezê bêyî te çawa biqedînim!" çavên xwe hişk girt. Porên zer li ba bûn. Bejna

zirav, çavên girs î kesk li wir disekinîn. Hêsiran zor dane çavên Dawûd û qulipîn di herdu kêlekên pozê wî re berxwar bûn. Dawûdî pozê xwe kişand. Dûre qûbaa cigarê bi yek derbekê re hew kir. Dûkel çû heta ber navika wî û hew derket.

Dawûd li sûkê rastî Xelîlî hat. Bi hev re çûn dikana birayê Xelîl. Dikaneke biçûk bû. Birayê Xelîlî cilan didirût. Xelîl jî li ber destê wî kar dikir. Bela ku carina Dawûd diçû ba Xelîl, navbera Dawûd û birayê Xelîl jî xweş bû. Di deriyê dikanê de li hevdû rast hatin.

- Xelîl, tu li kû derê mayî? got birayê Xelîlî.

- Va ez hatim.

- Ez didim xatirê Dawûdî... Vêga ez diçim cihekê. Du saetên din ez têm. Şalekî heye li ser masê. Xwedî, şalê xwe îşev dixwaze.

- Baş e, ez ê xilas bikim, got Xelîlî.

- Ha, hindik mabû ez ji bîr bikim. Ev pakêta li ser kursiyê şalê yekî gundî ye. Xwediyê şalê feqîr e. Ku hat, pir pere nexwaze.

Xelîl serê xwe hejand. Birayê wî bi destê Dawûdî girt û got:

- Tu jî meçe. Ez ê zû werim.

- Te got du saet, got Dawûdî.

- Me got mesela yanî... Dibe ku saetek jhi nekşîne.

- Çikas ez binihêrim, got Dawûthi.

Xelîl ketibû ser şalê. Ji qehwexana tenişta dikanê kurikek hat û got::

- Hûn tişkî dixwazin?

- Êrê, got Xelîlî. Du çayên teze.

Dawûdî destê xwe havêt bêrîka xwe û got:

- Keko, ji min re jî cigare pêwîst e. Ji çêyiya xwe, ji min re jî pakêtek cigare bistîne.

- Baş e, kîjan?

- Bedlîs.

Çaya Xelîl sar bûbû. Dawûdî cigare li ser cigarê dikişand. Deriyê dikanê vebû. Mirovekî peşmûrde kete hundur. Xelîl ew nas kir û got:

- Va ye, şalê te li vir e.

Mirovî pakêta li ser kursiyê hilda û got:

- Deynê min?

- Em bi sed banqnotî didirûn. Lê tu hefte û pênc bidî, bes e. Mirovî bêrîkên xwe tev vala kir. Şêst û pênc banqnot derket. Danî ser masê. Destên wî dilerizîn. Xelîl pencî hilda û panzdehên hûr ber bi mirovî de dahf da û got:

- Bi vana jî, ji zarokên xwe re şekiran bistîne.

- Wey mala te ava, got mirovî.

- Ye te jî.

Mirovî pakêtê xiste binê çengê xwe û ji derî derket. Ji paş ve pînên şalê wî xuya bûn. Xelîl şekirên çaya xwe li hev da. Qurtekî vexwar û got:

- Êê Dawûd!... Bihexive lo. Kê devê te dirûtiye car din?

- Qet mepirse Xelîlî. Senem çûyê û ez nizanim li kû derê ye.

- Na lo!...

- Ya!...

- Gelo kes nizane?

- Belê. Lê çawa ez ê fêr bibim, ez wiya nizanim. Beriya ku em li hev rast werin, min hevala Senemê dît. Li min ranewestiya, berê xwe guhêrî û derbas bû çû. Xelîlî henîşka xwe danî ser masê. Erçena xwe xiste nava destê xwe. Dûvdirêj hizirî. Dûre kulmiska xwe li masê da û got:

- Erê ya, erê!

- Çi hate bîra te?

- Malûva ma tu qet bîr nabî, kê te xiste vê belayê?

- Şeref…

- Kî dikare te rizgar bike?

- Wey tu sed salan bijî…

Birayê Xelîlî kete dikanê. Hê rûneniştibû, Xelîlî got:

- Kek, şal hazir e.

Xelîlî perên ku ji mirovî standibû jî danî ser masê û got:

- Vêga jî karê min û Dawûd heye.

Dawûd jî rabû. Derketin. Birayê Xelîlî li pey wan got:

- Pir nemîne Xelîl.

- Baş e.

Dawûd û Xelîl li ber deriyê mala Şerefî rawestiyan. Xelîlî li derî da. Xwîşka Şerefî derî vekir.

- Xwîşkê, Şeref li mal e?, got Dawûdî. Keçik Dawûdî nas dikir. Bang kir:

- Şeref… Şeref!..

- Ha, çi ye?

- Dawûd…

- Dawûd?... Ez vê ga têm.

Şeref hat. Bi destên hev girtin.

- Xêr e Dawûd?, got Şerefî.

- Xêre.

- Werin hundir.

- Na, ne pêwîst e. Tu dikarî ji kerema xwe re derkevî û em piçkî bimeşin?

- Ser seran.

Şeref çû paltoya xwe li xwe kir.

Ber bi nava bajêr de çûn. Dawûd nizanîbû ew dê çawa dest pê bike. Şerm dikir. Lê çare tune bû. Got:

- Şeref, kekê min. Tê bikaribû careke din alîkariya min bikî? Ev ê carê min hêştira xwe bi temamî wenda kir…

Şeref bi dengekî bilind keniya.

- Car din Senemê ye, ne?

- Êrê.

- Çûne îstanbolê.

- Dizanim…

Nexwe tu adresa wê dixwazî.

- Te pê lêkir, nigê xwe hilde, got Xelîlî. Şerefî dest bi sundan kir:

Şerefî dest bi sundan kir:

- Bi dîn bi îman ez nizanim.

- Te min kuşt, got Dawûdî.

- Lê…, got Şerefî. Em dê tişkî bikin.

- Divête ku zû be. Sibê, ber hêvarkî ez diçim. Saet tam di çaran de.

- Na lo?..

- Ya...

Deng ji Şerefî derneket. Dihizirî. Bişkoşlên paltoya xwe vekir. Destên xwe xiste bêrîkên şalê xwe û got:

- Te her du piyên min xiste ferekî sol... Çika bila bibe sibe, em binihêrin.

- Spas.

- Nexwe ez ji vêga de dest pê bikim. Bi destûra we be. Em ê sibê hevdu bibînin, got Şerefî.

Şeref ji wan qetiya. Dawûdî li pey Şerefî nihêrt.

- De gidî Şeref, got Xelîlî.

*

* *

Ji rabûna otobusê re mabû deh kêlî. Dawûd û hevalên wî tev li ber otobusê kom bûbûn. Ji her devekî teştek derdiket. Bala Dawûdî ne li wan bû. Dengê kesî ne diçûyê. Ji Xelîl pê ve kesî nizanîbû bi derdê wî. Şeref hê ne xuya bû. Şofêr li otobusê suwar bû. Dawûd, ji hevalên xwe xatir xwest û bi dileke şikestî û bi çavên tije hilkişiya çû li cihê xwe rûnişt. Hevalên wî tev hatibûn ber camê. Jê re tiştmiştna digotin. Lê Dawûd fêhm ne dikir. Ji nişka ve giraniya destekê li ser milê xwe hîs ir. Bi telaş zîvirî. Çavên wî yên li ber girînê, ji kêfa reqisîn.

- Ez ne bêbext im, got Şerefî.

Dawûd rabû û Şerefî hembêz kir. Şeref kaxetekî xiste destê Dawûdî. Dawûd kaxetê di nava destê xwe de givaşt. Şerefî ew maçî kir û got:

- De ev car riya te vekirhî be.

- Gelkî sipas dikim. Ez vê yekê ji bîr nakim Şeref, got Dawûdî li pey Şerefî.

Otobus bi rê ket. Dawûd şipyayî, ji hevalên xwe re dest hejand. Navika çavên wî dikeniyan. Xelîl bi nîşana desetan jê re got name binivîsîne. Dawûdî serê xwe hejand. Dûre li Şerefî nihêrt û destê

xwe maçî kir û danî ser heniya xwe. Şerefî jî weke wî kir.

Di nava çend kêlîkan de, tev ji ber çav winda bûn. Dawûd rûnişt. Kaxetê vekir. Adresa Senem tê de bû. Dawûd kaxetê maçî kir. Paşê kir du qat û xiste bêrîka xwe.

## PIRTÛK

Bi meha adarê re serma şikest. Lê ev car dersan zor dabû wan. Test li ser testan. Notên Dawûd ne baş bûn. Xwe baş ne dida dersan. Ne ew bi tenê yên mayîn jî di rewşeke neçê de bûn. Yehya veketibhû pirtûkan dixwend. Mihemed nexweş bû. Bi kurtî, kes ne li ser hişê xwe bû.

Dema razanê bû. Xortên odekê her yek bi tiştekî ve mijûl bûbûn. Yên ku dirûn dikirin, yên ku name dinivîsîn û yên ku bi hevdûre dihaxivîn... Dawhud ji tuwaletê derket. Di xweamadekirina dinanfirçekirinê de bû. Ji wî seriyê salona dirêj dengê qelebalixekê hat. Derket salonê. Dît ku pênc Mamosteyan deriyê odeka li sêrî vekirin û ketin odekê. Derî vekirî mabû û dengê Mamosteyekî bilind bû:

- Kes ji cihê xwe ne leqe! Kontrol heye.

Dawûd bi lez ket odeka xwe û got:

- Hevalno, vegâ kontrol heye...

Zarok tev li hev zîzikîn. Hinekan cigarên xwe vediveşartin û hinekan namên xwe. Dawûdî li Yehyayî nihêrt. Yehya li ser cihê xwe hişk bûbû û mabû. Pirtûkeke hebû di desta de û ziq li Dawûdî dinihêrt. Dawûdî bi çavan jê pirsî. Yehyayî pirtûka destê xwe dirêjî Dawûdî kir. Pirtûk bi perçakî rojname ve hatibhû qabkirin. Dawûdî di binê qabê li navê pirtûke nihêrt. Çawa navê Mahabadhî xwend, zer bû. Dengê piyên Mamosteyan nêz dibû. Dawûdî bi lez sînga xwe vekir û pirtûke xiste paşila xwe hu car din sînga xwe girt. Bala keshî ne li wî bû. Di bêrîka çakêta wî de jî pakêteke cigare hebû. Çakêt li xwe kir. Yehyayî bi çavên vekirî li Dawûdî dinihêrt. Devê Yehya hatibû girtin. Dawûd ber bi derî de çû. Di salonê de li Mamosteyan qelibî.

- Paş ve! got mamosteyekî.

Dawûd weke ku sah nekiribe çûna xwe berdewam kir.

- Ez dibêjim paş ve, got mamoste car din.

Dawûd bi banzdan di nava wan re derbas bû. Henîşka wî li newqa yekî ji wan ket. Axînekî bilind bû. Du mamosteyan dane pey Dawûdî. Dawûd dizanîbû ku deriyê xwarê girtî ye, berjor bû. Mamosteyan xwe şaş kirin û berjêr bûn. Dawûd ji vê yekê sûd girtibû. Bezabûna wî jî bi kêr hatibû. Xwe li qata şeşan dît. Zû xwe gîhande tuwaletan û kete yekî ji wan. Pirtûkê derhanî. Zîval zîvalî kir. Niftika xwe derxist û pirtûkê di qula tuwaletê de şewitand. Dûre tasika avê neh-deh caran tijî av kir û berra ser da. Paşê ji wê tûwaletê derket û kete yeka din. Derî nivçe kir û xwe da paş derî. Ew çax mamostên ku dabûn pey wî, xwe gîhandin tuwaletan. Mamosteyan tuwaletan yek bi yek kontrol kirin. Bela ku deriyê tuawaleta ku Dawûd tête de bû nîvçe vekirî bû, mamosteyan baş bala xwe ne danê. Yekî pozê xwe kişand û got:

- Bêhna pîşo tê.

Mamostên din jî baş hilim kir hu got:

- Dibe ku ewî kurikî tiştek şewitandibe. Lê ka bi ku derê ve çû? Em mamhostên din bi tenê nehêlin. Ê hefta ji destê me nafilite.

Em herin.

Dawûd ji tuwaletê derket. Hilma xwe veda. Çû dest û ruyên xwe şûşt. Paşê li ber pencerê rawestiya û li bajêr temaşe kir. Ev bûbû pênc sal û nîv, hê nûh derketibû vê qatê. Bajar di binê piyan de bû. Hê nûh didît xweşikbûna Edenê. Qata ku lê dima hanî ber çavên xwe. Ji hewşa dibistanê û diwaran pê ve, tiştek ne dixuya. Di wê derê de difetisîn. Bîhna xwarinan û rûnê qijilandî dikete pozên wan gava ku pencerên odeka xwe vedikirin. Ew kesên ku li vê qata şeşan diman pir bi şans bûn. Hem xwarinên wan cuda bûn û hem jî, torpîlên wan hebûn. Êê, ne hêsan bû. Wan jî her sal qiyametek per didane xwendegehê. Wan salanan sitraneke ewrûpî deng dabû. Pir li xweşa Dawûdî diçû. Ne jê fêhm dikir û ne jî, ji ber kiribû. Hew sê gotinan fêr bûbû. Dawûd ew di ber xwe de got: "Money, money, money…".

Malava kirin jî, malxirabî jî bi wan bû. Ew bûn yên ku jiyan li

mirov dikirin bihişt, yan jî zîndan. Ew bûn ku mirovan dikirin efendî, yan jî reben û perîşan. Diviya ku mirovî lingên xwe, ne baoriya lihêfa xwe, baoriya wan dirêj bikira..." Na, na!.", got Dawûdî "Diviya ku mirov xwe ji efsûna wan biparastiba!... Ew ên ku destên xwe dabûn wan, ne milên xwe bi tenê, bedenên xwe bi temamî wenda kiribûn. Di cihekê de şaşiyek çêbûbû, diviya ku ew bihata rastkirin. Lê çawa?..."

Dawûd li ber pencerê pir rawestiya. Carina hin zarok dihatin dest û ruyên xwe dişûştin û diçûn. Ew çax Dawûd jî, xwe bi tişkî ve mijûl dikir. Piştî ku zarok diçûn Dawûd car din diçû ber pencerê. Û axir dengên Mamosteyan ketin salona qata şeşan. Edî mamoste li odekan pir ne diman. Hem Mamoste westiyabûn û hem jî di vî karî de jî, kirin ne yek bûn. Dawûd xwe gîhandibû cihê xwe yê berê. Di nava çend kêlîyan de Mamosteyan karên xwe hew kirin û berxwar bûn. Dawûdî jî hêdî hêdî da pey wan. Qatek mesafe hiştibû Dawhûd di navbera xwe û wan de. Di nava xwe de xeber didan. Bi piranî behsa Dawûdî dikirin. Navê wî, numara wî, cîhê wî, sinifa wî. Tev fêr bûbûn.

- Ew dê sibehî weke keran were, digot yekî.

- Rast e, êdhî ne pêwîst e em xwe bêhtir bihêşînin. Bû derengî, em herin malên xwe, got yekî din. Di qata duduyan de yek ji wan veqetiya. Ew nobedarê şevê bû. Yhên mayîn diçûn malên xwe... Deryê hesinî vebû û dûre hate girtin. Şêrqînîya zincîrê û kilîtê hat. Dawûd pê li serê pêçiyên (tiliyên) xwe kir û pir hêdî ji qata duduyan daket. Bê deng di salonê re derbas bû. Deriyê odekê vekir. Di nava tarîtîyê de xwe gîhande ser ciyê xwe. Hevalên wî tev raza bûn. Xurê-xur dihate ji hinekan. Yehya bê hizûr raza bû. Berê wî li dîwêr bû û seranser axîn û ofîn hildida. Mihemed xewsivik bû û li tenişta Dawûd radiza. Mihemed bi dengê xişînîya lihêfê re çavên xwe vekir û got:

- Dawûd!...

- Hiişş... got Dawûdî.

- Xêr bû, çi qewimî?

- Sibê, sibê.

Yehya jî nêzîkî wan bû hû dengê wan sah kir. Serê xwe rakir. Xeyala Dawûd dît. Xwe rast kir. Xwest ku tiştek bibêjê, Dawûdî tilîka xwe bir ber lêvên xwe û jê re got: "Hiişş...". Yehyayî car din serê xwe danî.

Dawûd bi dengê azanê re şiyar bû. Beriya ku Mamoste were rabû. Ciyê xwe bi lez rast kir û pekiya çû derve. Bi şev keysi nedîtibû ku cilên xwe ji xwe bike. Bayeke sar hat û porên wî rakir hewayê. Xwêdana heniya wî di cih de sar bû. Ji serma ricifhî. Natorê (bekçiyê) şevê danîbûn ser riya mizgeftê. Mizgeft du derî bû. Derîkî yê ketinê bû û tam li hember wê jî yê derketinê hebû. Dawûd pêlavên xwe deranî û weke her car xiste destên xwe û rast di deriyê dinê re derket. Çû sinifê û serê xwe danî ser mêza sar.

Bi pêketina lampê re Dawûdî serê xwe rakir. Kêliyeke din Yehya, Menaf û Mihemed dor li Dawûdî girtin. Mihemed û Menafî bi çavên vala li Dawûdî dinihêrtin. Xuya bû ku Yehyayî ji wan re tiştekî negotibû. Yehya perîşan bû. Bi dengekî tun got:

- Tev ji ruyê min de...

Mihemed hêrs bû:

- Bes e hûn me dibehecînin. Ma qey hûn bêbawer in?

- Menaf jî aciziyan kir:

- Heyran tew we teva jî, in jibîr kiriye. Min çi kêmasî...

- Dawûd xeberdana Menafî birî:

- Na Menaf, haşa. Mihemed tu jî tiştek nexe ber dilê xwe. Lê hûn mecbûrên sozdanê ne. Divêt ku kes sah neke.

Manaf û Mihemed bi hev re gotin "Soz!"

- Nexwe, got Dawûdî, Bila Yehya ji we re bibêje.

Yehya sor bû. Bi destekî xwe, heniya xwe yî li ber xwêdanê, beriya ku xwêdan were, paqij kir. Li ser hev kuxiya û ji wan re bûyerê got. Dûre Dawûd çîrokê temam kir û got:

- Hal - mesele ev e.

Yehyayî serê xwe bera ber xwe da û got:

- Êê, ew dê çawa be?

- Tiştek jî nabe, got Dawûdhî ji xwe bawer.

- Çawa nabe? got Menafî. Navê te girin û ew`ê bangî te bikin. Tê çi bibêjî? Divête ku em ji te ra îfadeyekî amade bikin.

Dawûd keniya:

- Min îfada xwe amade kiriye.

Dawûdî destê xwe avêt bêrîka xwe û pakêta cixarê deranî û nîşanî wan da û got:

- Gelo çima min ev veneşart, Yan jî ne avêt?

Yehyayî got:

- Çima?

- Ez vêga nabêjim. Ger ku bawer bikin, ez dê bi cezayeke sivik rizgar bibim. Ku bawer nekirin jî, ew`ê pir pir çend rojekê îstîrahet bidine min. Ji xwe dersan ez gêj kiribûm.

- Lê ku tişkî xirabtir bikin bi te, got Menafî bi hêcan.

- Ez bawer nakim. Ji xwe ev bû salek min ceza ne girtiye. Bi rastî, min beriya tahma wê jî kiribû. Tev bi hev re keniyan. Dûre ji hev bila bûn. Ketin ser dersên xwe. Dawûd jî dersa xwe vekir. Rêzik ne dihatine xwendin. Yehya, Menaf û Mihemed îqna kiribû, lê hê ew bi xwe îqna nebûbû. Li ser îfada xwe baş hizirî. Paşê kete serê wî. Dûre pela pirtûka li ber xwe qulapt. Wêneya İstanbolê hebû tê de. Baş lê mêze kir. Li ser avê pira nûhçêkirî, ya ku tirkan xwe pê qure dikirin dît. Di binê pirê re gemîyeke mezin ber bi Behra Reş de diçû... Senem kete bîra Dawûdî. Xwe û Senem di wê gemîyê de dît. Destê Senemê di destê wî de bû û çavên wan jî, di yên hevdû de bûn. Bê axeftin li hevdû dinihêrtin. Dawûdî çavên xwe girt. Serê xwe siparte dîwêr û bi wî awayî di xewê re çû. Bi dengê zengilê re veciniqî û şiyar bû. Yehyayî henîşka xwe danîbû ser mêzê û destê wî li ber guhê wî, li Dawûdî mêyze dikir. Çavên wan li hevdû ketin. Dawûd ji Yehyayî re çav kir û rabû û got:

- Ez ji birçiya dikira biketama!

Yehya jî rabû. Ketin milên hev hû berê xwe dan cihê xwarinê. Ji her yekî re qedehekî, ji wanê şuxlê Amerîka, çay, perçekîhi nan û neh-deh zeytûnê petyayî ketin. Rojekê, çaxa ku ji zeytûnan kurm

derketibûn, gilî kiribûn û serekê dibistanê bê hizhur bûbû hû gotibû: "Hûn rûyên xwe reş dikin. Em zeytûnên herî baş hu herî herzan dikirin ji we re..."Û bi devê xwe ketibû. Zarok tev pê keniyabûn. Wî jî dizanîbû ku tiştê herî erzan, ne tiştê herî baş bû. Wî jî xwe ne girtibû û keniyabû û gotibû: "Baş e, baş e, em`ê ji nûha pêve baştir kontrol bikin..."

*

* *

Zarok tev li hewşa xwendegehê rêz bûbûn carek din. Mamosteyekî navê Dawûdhî xwend. Dawûd çû ba wî. Mamosteyhî bi awiran li Dawûdî nihêrt û got:

- Here îdarê, karê te heye.

Dawûd pir sakin bû. Çû wir. Derî girtî bû. Li derî da.

- Were, got dengekî qalind. Dawûdhî dengê Mamoste Necdet nas kiribû. Bêbav vêga jî ketibû grûba disîplînê. Dilê Dawûdî bi lez lê da. Lê tiştekî ku bikaribe bike tune bû. Derî vekir. Sê Mamoste li ser piyan, li hêviya Dêwûd bûn. Di destê Mamoste Necdetî de darek hebû. Mamoste Necdet çawa çav li Dawûdî ket, got:

- Car din tu ha?!

Dawûdî bersiv neda. Hew serê xwe rakir û li wî nihêrt. Lêdan hemin hebû. Berxwedan mabû. Pir nema, ketin ser serê wî. Dawûd yek carik bi tenê ne got "Ax!" û her cara ku dipirşîn, digot:

- Cigare hebû bi min re. Ez tirsiyam û ketm panîkê. Ger ku hûn bawer nakin, va ye Dawûdî xist û got:

- Ez bawer nakim. Reva te ji bona tiştekî din bû.

- Nîşan bide, got Dawûdî.

Dar car din hat û li newqa Dawûdî ket. Dawûd tirş bû û bi newqa xwe girt. Dar car din û car din bilind bû, hetanî ku serkarê dibistanê kete hundir û got:

- Zû îfada wî bigrin. Qaseke din mêhvanên me tên.

Kaxetek û pênûsek dane Dawûdî. Dawûdî bi lez û bê guhertin îfada xwe nivîsî û danî ser masê. Yekî jê re got:

- Derkeve!

- Azmûna (îmtîhan) min hebû îro. Dikarim ez îro bikevim

dersan.

- Here. Lê piştî azmûnê car din were, got Mamosteyekî. Dawûd dest di newqê de, bi pêlikan de rapelikî. Li deriyê sinifê da û derî vekir. Xwest ku ji mamostê di sinifê de re sedema dereng mana xwe bibêje. Mamosteyî got:

- Ez dizanim. Here li ciyê xwe rûnê.

Dawûd rûnişt. Mamosteyî kexeta testê da Dawûdî û got:

- Nekeve telaşê. Hetanî ku tu hew bikî, ez`ê li hêviya te bim.

Dawûdî li Mamosteyî nihêrt. Di nava Mamosteyan de yê ku pir dihate hezkirin, ev Mamoste bû. Dawûdî pozê xwe kişand. Lê xwîna hişk pozê wî xetimandibû.

Dawûd li ber deriyê serkariyê (îdarê) gelkî ma. Di koridora dirêj de vî serî, wî serî çû û hat. Derî vebû. Seriyê mamostê ku çaxa Dawûd reviyabû, henîşka wî li newqe ketibû, dirêj bû. Bi nîşanê ji Dawûdî re got were.

Mamoste Necdet, weke ku ji cezê ne dilxweş bû, destên xwe dabû paş xwe û di pencerê re li derve dinihêrt. Yekî biryara Mamosteyan xwend û got:

- Te em baş îqna nekirin. Lê bila weke te be. Cigare kişandin, bê emrî û banzdan… ji bona her yekî, rojek bikevê dike sê roj. Ji sibê û pê ve tu sê roj baarî bikevî dersan.

- Min fêhm kir, got Dawûdî.

- Vê ya jî, ji bîr meke! Ew dê her car çavên me li ser te bin. Hadê, yallah siktir be!

Dawûd bi lotikan derket hewşê. Karkerekî xwendegehê jî bi Dawûd re şandibûn. Ew dê Dawûd ceza xwe weke hefsiyan bikişanda. Deriyê cîhê razanê vebû û car din hate girtin. Dawûdî li pey wî karkerî got:

- Hûn min li vir tî û birçî ji bîr nekin ha!

- Na, na, tu mereqan nekî, got mêrikî.

Dawûd berê çû ser çavên xwe şuşt, dûre hilkişiya ser cihê xwe. Destên xwe di bin serê xwe de kilît kir. Li lampa odekê dûv dirêj nihêrt û di xewê re çû.

**REV**

Havîn zû hat. Ev cara yekemîn bû ku Dawûd bêkêf dikete riya malê. Du caran ji Senemê re name şandibû û hew bersîva nama dawî girtibû. Bersîveke kurt bû û Senemê behsa xweşiya Stanbolê û dersên xwe kiribû. Weke ku di navbera wan de tiştek nebûbe. Ev bûbû kul û ketibû dilê Dawûd. Lê car din jî wê namê belku bîst caran xwendibû û xistibû paşila xwe. Bi roj, destê wî li ser sînga wî bu û bi şev jî dixist bin serê xwe. Ne mal, ne heval û ne jî bîrhanînan Dawûd tesellî dikirin. Kurmekî ketibû nava wî. Weke xeyaletan diçû dihat. Çaxa ku hinekan tişkî jê pirs dikirin, yan bersiv ne dida, yan jî bi du-sê gotinan xwe rizgar dikir. Xelîl pir acizî dikir ji Dawûdî:

- Dawûd, birayê min, were ser hişê xwe.

- Dikim nakim xiyala bêbavê ji ber çavên min naçe.

- Ev nayê ser wê wateyê ku mirov terka her tiştî bike.

- Ne di destê min de ye. Mirov dibêje qey hinekan dest havêtine mejîyê min û nahêlin ez xwe tev bidim.

- Dûr be, ku miriba, ma te yê jî xwe daliqandiba?

- !!...

- Li dora xwe binihêre. Derdê kê tune ye? Lê car din jî jiyan berdewam dike. Weke avê diherike…

- Evana tev rast in Xelîl… Lê…

Xelîlî dît ku Dawûd lê guhdarî dike, axefa wî birî:

- Lê mê tune ye! Di dilê xwe de, ji me re jî cih veke. Çi ye te ev xistiye serê xwe û çavên te tiştekî din nabînin… Rast e, dijwar e, lê ne bê çare ye…

Gotinên Xelîlî tûj bûn. Dawûd rabû hû ji ba Xelîl çû. Xelîlî li pey wî nihêrt, lê neda pey wî got:

- Baş bihizire.

Li malê jî, dê ji alek, bav ji alek û bira jî, ji alek ve Dawûd pir hêşandin. Dixwestin ku bizanibin ka bê derdê wî çibû. Dawûd bûbû kevir û mabû.

- Çi ye hûn evçend dihajon ser min, got Dawûdî. Ez dibêjim tiştekî min tune ye. Çima hûn fêhm nakin?

Diya wî bû dirdirk û kete pêxîla wî:

- Ez dê me, dê!... Herkesî bixapîne lê min na... Ez ji çavên te dixwînim.

- Tu çi dixwînî?

- Ma çi naxwînim!... Tu ne Dawûdê min î. Kes newêre ji te re tişteki bibêje... Tu berê bi xwîşk û birayên xwe şad dibûyî. Vêga ez dibînim ku tu wan dahf didî... Tu li ber bavê xwe radibî... Ez hîn jî bibêjim?

- Bes e, bes e xwedê ji te razî be, got Dawûdî û rabû derket sûkê. Di rê de baş fikirî û dît ku çare nîn e. Biryar da ku çendakî ji malê dûr bikeve, ew`ê baştir bibe. Xelîl weke her car, li ser dirûnê bû. Bi dengê silava wî re, serê xwe rakir.

- Oy oy... Dawûd!... Ev bû sê roj. Ma qey tu ji min xeyidîbû?

- Na lo. Dilê min ne dixwest. Van rojanan ez bûme weke gêjan bi rasthî.

- Ca hela bibêje, çi heye, çi nî ne?

- Her ku diçê, xirabtir dibim. Min dît ku dermanê min di çûnê de ye.

- Çûna çi, ku derê?

- Tu hevalê min î, Xelîl. Ez dê ji te re rastiyê bibêjim. Ez dixwazim herim Senemê bibînim. Yek carek bi tenê, bes e.

Xelîl di cih de sar bû û got:

- Çawa?

- Vega problemeka min bi tenê heye. Ew jî pere ye. Ku hema ez bikaribim xwe bihavêjim Edenê...

- Ya du re? got Xelîlî.

- Dûre ne pir zor e. Ez dê kar bikim. Çaxa ku perhê min têr kir, rê vedibe.

Xelîl ji biryara Dawûdî ne dilxweş bû. Lê didît ku Dawûd xistibû serê xwe. Destê xwe danî ber ruyê xwe. Paşê çavekî xwe firikand. Meqesê danî ser masê û destên xwe havêt bêrîkên xwe. Çi hebû derhanî û jimart û got:

- Çend têr dike?

- Pêncî-şêst bes e. Li ba min jî bîst heye.

Xelîl perên li ser masê car din jimart. Çil banqnot derketibû. Destê xwe havêt binê masê û ji perên birayê xwe jî hinek derxist. Teva da ser hev û da destê Dawûdî û got:

- Heştê kaxet diqede?

Dawûdhî ji destan girt û bi şerm pirsî:

- Ya te?

- Bila karê te rast be, yê min ne giring e. Pir pir ez çend rojekî ji birayê xwe pere naxwazim.

- Mala te ava, got Dawûdî.

- Ya te jî.

- Ha min ji bîr kir, Xelîl. Ez hêvîdar im ku ew dê di navbera min û te de bimîne.

- Ser çavan.

Bi şev Dawûd zû hilkişiya ser xênî û kete nava ciyan. Dawûdê ku her şev van çaxan li sûkan bû, vêga radiza. Diya wî pir meraq kir. Du caran hilkişiya ser xênî. Hêdîkan dihate ber serê Dawûd û car din diçû. Dawûd çavên xwe nivçe vedikir. Pêjna diya xwe didît. Lê xwe li xewê vî alî, wî alî hejandibû û gotibû: "Xêr e înşaallah!"

Serê şeveqê, Dawûd ji nava ciyan pekiya û daket xwarê. Her kes di xeweke şêrîn de bû. Bi rastî, havînan xewên ser banên xaniyan jî, hêja bûn. Vêga top biteqiya, kesî sah ne dikir. Ji ber vê yekê, Dawûd bê tirs bû. Torbeke naylon peyda kir. Pîcema xwe û hin tiştên ku wê jê re pêwîst bibana, neqand û teva torbê. Dûre deriyê dolabê vekir. Sîtila mastê derhanî. Hinek mast xiste nava firaqeke biçûk û bi kevçî kete ser. Du-sê parî nan jî xwar pê re. Cixara xwe pêxist û rahişt torba xwe.

Gundiyan sûkê tijî kiribûn. Her sibe, van çaxanan, ji gundan qiyametek mirov dihatin. Hin ji wan bi xwe ra mast, şîr, penîr dihanîn û bi herzanî difirotin dikanan. Piraniya wan pere ne didîtin. Yan deyndarên dikanan bûn û yan jî, ji xwe re rûn, şekir, çayê dikirîn ji bedêlhê ve. Hin ji wan jî, yan karên wan hebûn, yan jî nexweşên wan. Dawûdî berê xwe da kuçan. Ne xwest li kesekî naskirî rast

were. Gundiyên wan jî pir dihatin van çaxanan.

Xelîlî dikanhê vedikir. Dawûdî ji Xelîlî re destê xwe hejand. Karkerê çayxanê di ber wan re derbas bû.

- Du çayê, got Xelîlî.

Karê Xelîlî pir bû. Dawûd jê re alîkarî dikir. Wext zû derbas dibû… Tahv bilind bûbû. Dawûdî ji Xelîlî kaxetekî û pênûseke stand. Nameke kurt nivîsî û xiste bêrîka xwe. Torba xwe li ba Xelîlî hişt û derket. Seet di yanzdehan de otobus hebû. Ji xwe bilêtekî girt û rast çû malê. Zarokan li hewşa malê dileyîstin. Diya Dawûdî ji wan re taştê amade dikir. Dawûd bê pêjin derbasî odeka mêhvanan bû. Nameya ku nivîsî bû danî ser radyo. Li pey xwe deriyê odekê kilît kir û rast çû malê. Zarokan li hewşa malê dileyîstin. Diya Dawûdî ji wan re taştê amade dikir. Dawûd bê pêjin derbasî odeka mêhvanan bû. Nameya ku nivîsî bû danî ser radyo. Li pey xwe deriyê odekê kilît kir û miftê xiste bêrîka çakêtê bavê xwe yî daliqandî. Dûre Dawûd çû ba diya xwe. Ji bona xatrê wê, çend parî nan xwar û got:

- Karekî min heye. Ez dê dereng bihêm.

- Tu bi kêfa xwe yî, got diya wî dengekî xeyidandî. Ji cerga ku Dawûdî li ber wê rabûbû û vê de, dilê wê şikestî bû. Haya wê qet ji vê pîlana Dawûd tune bû. Diya Dawûdî heta nîvê şevê şiyar ma. Dawûd ne hatibû. Ji bavê Dawûdî re got:

- Ev kurik li kû derê ma gelo?

- Xort e Medê, xortên vî zemanî li kêfa xwe dinihêrin. Ji wan re dê çi ye, bav çi ye!...

Bû sibe. Bavê Dawûdî rabû çû destmêjê. Çavên wî li ciyên Dawûdî vala ketin. Bi lez diya Dawûdhi şiyar kir:

- Emirqûtiyo nehatiye hêj!...

- Tu û Xwedê?

- Erê, rabe bibîne.

Çawa diya Dawûdî ciyên vala dît, dest bi girînê kir û got:

- Tiştek hatiye serê wî!...

- Na lê, devê xwe ji xêrê re veke, got bavê Dawûdî.

- Gotibû karê min heye, ez ê dereng werim… Û diya Dawûdî

car din dest bi girînê kir. Bavê Dawûdhi tilîka xwe bir ber lêvên xwe:

- Hiş be, thê zarokan şîyar bikî. Were em dakevin xwarê. Belkû hatibe û li wira raza be…

Berjêr bûn. Li her derê nihêrtin, kes tunebû. Hew mabû odeka mêhvanan. Dahfdan, derî venebû.

- Girtî ye Seyda, got diya Dawûdî.

- Ka raweste, em binihêrin.

Bavê wî jî xwe li derî ceriband, derî venebû.

- Ka mifta derî? got bavê Dawûdî.

- Ez her car dixim bêrîka te.

Diya Dawûdî çû û miftê li cihê wê dît û anî. Derî vekirin. Na, li wir jî tune bû. Bû kûze kûza diya Dawûd û got:

- Zû here qereqolê…

- Hela raweste lê tu min şaş dikî…

Bavê Dawûdhî çû li ser kursiyekê rûniştş. Dengê xiş-xişekê dihate ji radyo. Dawûdî radyoyê bi zanebûn vekirî hiştibû. Diya wî çû radyoyê girt. Ew çax kaxeteke sipî li ser radyoyê dît. Hilda û dirêjî bavê Dêwûd kir. Bavê wî namê girt û xwend. Dawûdî digot: "Bîhna min pir teng bûbû. Mereqa min nekin. Ez diçim ji xwe re karekî bibînim. Çendakî din, car din em ê hevdû bibînin. Bi xatirê we."

- Baş e, baş e qet nebe em zanin ku sax e, got bavê Dawûdî.

Diya wî gazinan kir:

- Ev ji me kêm bû… Ma me çi kiribû bi wî ku çendî bêhnteng bûye…

- Xort e, dibe ku ji heval-mevalên xwe dilteng bibe…

- Tu jî çendî bêhnfireh î Seyda!...

- Ez bêhna xwe fireh nekim, ew ê çi binivîsîne?. Ya baş ew e ku em ji kesî re nebêjin. Ku pirsîn, bibêje me ewî şand mala meta wî.

- Baş e, got diya Dawûdî. Hêsirê çavên xwe paqij kir û car din hilkişiya ser xanî…

*

* *

Karê Dawûdî baş diçû. Şeva pêşî li otêlekê ma. Dûre çû xwendegehê. İmtîhanên payizê, yên îkmalê dest pê kiribûn. Dawûd weke ku ew jî mabe îkmalê, navê xwe xiste deftera ku li ba nobedarê xwendegehê bû. Ji xwe kesî tiştekî jê ne pirsî. Sîh- çil zarokên din jî hebûn li xwendegehê. Razan serbest bû, lê xwarin tune bû…

Dawûd tam çar rojan weke xwînîyan li kar geriya. Lê tune bû. Karkerên berdewamî dixwestin. Ew jî ne dihate hesabê Dawûdî… Perên wî hindik mabûn… Nanê tisî bi tenê bixwara, şeş rojan têr ne dikir. Cigare jhî bela serê wî bû… Ax cigare!... Ne bi wê dibû, ne jî bêyî wê… Beriya sê salan dest pê kiribû… Hevalên wî tev dikişandin…Wî jî gotibû belku tiştek bû… Û bûbûn heval… Carina jar î tal bû, carina şêrîn- şekir, derman bû…

Edî Dawûdî çavên xwe li karên hemelan digerand. Li ku derê înşaetekî hebaya, Dawûd li wira bû. Ew jî desta ne diket. Bê hêjmar mirov herikîbûn Edenê… Tev birçî - tazî bûn. Kê çi kar bidîta, pê diqedand. Piraniya wan kesanan, ji Kurdistanê bûn û hemû jî, ji însafên xwediyên karan re teslîm bûbûn. Bi nîvê heq kar dikirin. Ev yek programkirî bû. Çaxa ku dibû havîn, ji Kurdistanê gundîyên deyndar û bêerd dihatin bajarên Tirkiye, ji bona çend quriş pere… Li Kurdistanê, ji kurdan re tiştek nihatibû avakirin. Ji xwînmijiyê, ji zordariyê, ji qereqolan hû ji mayinan pê ve…

Kes nemabû ku Dawûdî xwe nihavetibû dexlên wan. Û herî dawî, rojekê, yekî jê re got:

- Şansê te heye xorto. Îro min yekî ji kar havêt. Zexeliyan dikir… Navê te çi ye?

- Dawûd.

- Baş e Dawûd. Te li ber destê hosteyan kar bikî. Çi gotin, tu mîna wan bikî?

- Serseran, got Dawûdî.

- Rojek- du roj ez dê li te mêze bikim. Ku tu jêhatî bî, ez dê perê te bêhtir bikim… Lê vêga rojê bîst kaxet… Paşê bîst û pênc… Temam?...

- Mala te ava!...

Dawûd wê rojê dest bi kar kir. Di nava sê rojan de perîşan bû. Av dikişand, qumê li hev dida. Bûbû xulam û mabû. Rojê deh caran diçû dikanan ji wanê mayîn re cigare, xwarin û fêkî dihanî. Carina, hinekên çavvekirî karên xwe jî didane ser pişta Dawûdî... Ne dihiştin Dawûd çavên xwe ji ser hev rake... Hê wî mirovî jî jê re tiştek ne gotibû... Ber hêvarkî çû perên xwe bigre. Mirovî berê perên hosteyan û yên karkerên mayîn da. Dûre bang Dawûdî kir. Dawûd çû ber masê. Mirovî bîst û pênc kaxet dirêj kir û got:

- Aferîn!...

Dawûdî peran girt û bi kêf xiste bêrîka xwe. Ev dihate ser wê wateyê ku mirovî ji Dawûdî dilxweş bû û baoriya sozê, wî girtibû.

Dawûd rast çû zikê xwe têr kir. Paşê li sûkê çend tûran havêt. Li ber sînemayekê rawestiya. Filîmeke xweş hebû. Çû heta ber gîşa bilêtan. Lê dev jê berda û berê xwe da xwendegehê.

Panzdeh rojên Duwûdî qediyabûn li kar. Xwe dabû hezkirin û êdî kesî lê tahde ne dikir. Barê wî sivik bûbû. Her roj perên xwe derdixist, dijimart û car din vedişart. Sê sed çêbûbû. Baoriya hesabê, diviya ku bîst rojeke din jî kar bikirâ. Lê qet hesabê xwendegehê ne kiribû. İmtîhan li ber hewbûnê bûn. Her ku diçû, zarok kêm dibûn. Di nava deh rojan de kes nema ji Dawûd pê ve. Weke her car hatibû xwendegehê. Dît ku deriyê xwendegehê girtî ye. Li hewşa xwendegehê çend tûran havêt. Nobedarê şevê xuya bû û got:

- Tu çi dixwazî?

- Derî çima girtî ye, got Dawûdî. Lê tiştekî jî hîs dikir.

- Ma vira otêl e, ku tu destên xwe li ba dikî û têyî? Ev bu du roj ez te îdare dikim. Doh zarok tev çûn. Tu hê çi digerî li van deranan?

Dawûd ew çax bi xwe hisiya. Qet bala wî ne kişandibû. Herê, rast bu ku îmtîhan hew bûbûn... Dawûd zer bû û got:

- Alavên min li jor man. Îşev jî biqedine. Soz, sibê tu min nabînî.

Mirovî serê xwe hejand û bi naziyan derî vekir û got:

- Lampê pê nexe. Ku were dîtin, karê min ji dest diçe.

- Mereqan neke.

Dawûdî niftika xwe pêxist û di salona tarî zulmet re derbas bû.

Li ser ciyê xwe çarmêrkî rûnişt. Ronahiya hîvê û sitêrkan odekê rohnî dikir.

Dawûd perên xwe derhanî û jimart. Pênc sed derketin. Pê diqediya. Ku li otêl motêlan bimaya, kara wî ne dima. Biryar da ku rojeke din jî kar bike û êvarê bikeve rê. Ya herî baş ev bû.

Dawûd alavên xwe xiste nava torbeyekhî û serê şeveqê car din çû kar. Hê kes ne hatibû. Ji xwe re perçekî nan û hinek zeytûnên reş sitand û li ser qûmê rûnişt û xwar.

Ber nîvrokî, ew mirovê ku Dawûdî xistibû kar, hat. Dawûd çû ba wî. Jê re hal mesele got. Mirovî dengê xwe nekir. Ji xwe kar jî li ber xilasbûnê bu. Mirovî got:

- Baş e, êvarkî were, perê xwe yê îro jî bigre û dûre tu bi kêfa xwe yî.

Dawûd kêfxweş bûbû. Heta êvarê bi şadî kar kir. Ji teva xatir xwest û torbê xwe hilda û berê xwe da garaja otobusan. Tam wext bû. Bilêta xwe girt û li otobusê suwar bû. Dema ku bilêta xwe girtibû, "Tu sibe nîvrokî li Stanbolê yî." gotibûn jê re. İstanbolê weke hûtekî devê xwe vekiribû. Otobus kete zikê hût. Dawûdî bi çavên fireh li vî alî, li wî alî dinihêrt. Senem ne neheq bû ku çendî pesna vî bajarî dabû di nameya xwe de.

Dawûd li Topkapi peya bûn.Weke gêjan li hev geriya. Baş bû ku adresa kurmamê xwe yê li Stanbolê girtibû beriya ku ji malê derkeve. Defterka xwe ya biçûk derhanî û adresa kurmamê xwe nîşanî mirovekî da. Mirovî bi destê xwe Dawûdî li mînîbûsekê siwar kir û jê re got:

- Tu dê li Aksarayê peya bibî.

Dawûd li Aksarayê jî, ji hinekan pirs kir û adresa kurmam bi hêsanî dît. Li ber dikaneke biçûk rawestiya bû. Adres rast bû... Lê çima dikan e, got Dawûdî xwe bi xwe. Lê çare tune bû û bi ser de, dikan jî girtî bû. Di pencerê re li hundurê dikanê nihêrt, dikan vikî-vala bû. Li ber deriyê dikanê li ser qelafîskan rûnişt û pişta xwe da deryê qefaltî. Hê cigara xwe nûh pêxistibû, kurmamê wî xuya bû û got:

- Dawûd!.. Tu û van deran!

- Kek!...

Hev du himbêz kirin. Kurmamê wî derî vekir. Ji hundir bêhna masiyan dihat. Li erdê merşikeke kevn î rizyayî û li ser merşikê jî doşekekî û lihêfekî qirêj hebû. Di orta dikanê de jî, sera sera perdeyek hatibû kişandin. Li paş perdê, di qoziyê de, du alî bizmar hatibûn kutandin. Şirîtekî hebû bi wan ve. Li ser şirîtê cilên şil raxistî bûn. Erebokeke destan ciheke mezin girtibû di odekê de. Li ser erbokê leganeke plastîk î tije masî hebû. Dawûd li kurmamê xwe nihêrt. Kurmam keniya û got:

- Sermaya min e...

- Çawa? got Dawûdî.

- Ez berê masiyên xav distînim. Dûre wan li vir paqij dikim, dişom û bi şev jî li sûkê ez wan diqelînim û bi nan û pîvazan difirşim.

- Baş e kara te?

- Ne xirab e. Lê teşqele ye û bêhna mîratên masiyan ji laşên mirovan dernakevin... Hela em dev ji vana berdin. Bibêje, yên ku tu ji nava wan têt, çawanin?

- Tev jî baş in.

Kurmamî li saeta xwe nihêrt. Du re kete ser masiyan. Dawûd jî alîkarî kir. Di ber re jî axifîn... Mistefa, kurmamê Dawûdî, karê xwe zû qedand û dûre miftekî derî xiste destê Dawûdî û got:

- Piştî ku te xewa xwe sitand, derkeve were nig min. Hema rast berê xwe bide nava sûkê. Ez li ber deryê sûka binê erdê me.

- Temam, got Dawûdî.

- De vêga bi xatirê te...

Mistefayî ereboka xwe hajot û çû. Dawûdî li pey wî derî kilît kir û xwe havêt nava ciyan.

*

* *

- Werin masiyan, werin masiyên qelandî!, digot Mistefa û di ber re jî masîyên qelandî diqulapt ser ruyê din, çaxa ku Dawûd ber bi wî de histe nava nan û li muşteriyan belav dikir. Dawûd hat, hat li nig

kurmamê xwe rawestiya. Feqîrê kurmam wisan bi kar ve bilyayî bû ku qet Dawûd ne dîtubû.

- Werin masiyan, masiyên qelandî! got Dawûdî bi dengekî bilind. Mistefa ciniqî û li tenişta xwe nihêrt.

- Te ziravê min qetand...

- Çawa diçe?

-İşev qismet vekirî ye. Tu têr razayî yan na?

- Şeş seet ne hindik e. Min xewa xwe yî şevê jî stand. Lê problemekî hebû, tuwalet li mala te tune ye... Gelo...

- Min fêhm kir, got Mistefa û cihê tuwaletên tevayî nîşan da bi tiliya xwe.

Dema ku Dawûd ji tuwaletê derket, dengê Mistefayî qalind sah kir:

- Baqî, kurê min, pîvaz xilas bûn, nan jî amade bikê, digot ji hevalê xwe re. Baqî xorteke zirav î dirêj bû. Esmerekî li hev bû. Di unîversîtê de xwendevan bû. Ji tinazan jî pir hez dikir. Pir nema bersîva Mistefayî da:

- Çi ye Misto? Baş e ku qulikek dikana te heye ku em ji xwe re tê de disitirin. Ku tu wê minetan bikî, em dikarin li ser bankên parkan jî razên...

- Ya zivistanan? got Mistefayî.

Dawûd gote belku bi rastî şer dikin:

- Heyran hûn çi şer dikin? Ka kêrikê, ez dê pîvazan hûrkim. Wê çaxê herduyan bi hev re li Dawûdî nihêrtin û keniyan. Baqî di binê simbêlan re keniya û got:

- Tu li me nenihêre. Ev kurmamê te berazekî jîr e. Ev bû çar seet ez li ber destên wî kardikim, qet ne got "mala te ava" jî...

- Êdî mineta min ji te tune ye, got Mistefayî bi tinaz. Va ye kurmê min hatiye.

- De haydê birê min, karê me jî heye, got muşterîyekî.

- Ser çavan got Baqî. Fermo...

Mistefayî kir û ne kir Dawûd ne kete nava ciyan. Doşekek bi tenê hebû. Mistefa lihêfê dabû Baqî û doşek mabû. Mistefa dixwest

ku Dawûd li ser doşekê razê. Ji xwe re jî du kursiyan hanî bû. Li ser yekî rûniştibû û piyên xwe li ser ya mayîn dirêj kiribû. Dawûd nepejirandibû. Digot: "Yan ez`ê li ser kursiyan razêm û yan jî em dê doşekê li hevdû parvekin." Mistefa doşekê li ser pehnayî zîvirand.

- Ev car baştir e, lê balgîf ji te re ye, got Mistefayî.

Dawûdî dengê xwe dernexist. Mistefayî çakêta xwe danî bin serê xwe. Rebene Baqî çawa xwe dirêj kiribû, wisan raza bû.

Ber nivrokî şiyar bûn. Çûn li restaûrangekê şorbenîsk xwarin. Ew çax Dawûdî pirsî:

- Ez dê çawa bikaribim herim Kuçukyaliyê?

- Kuçukyali? got Mistefayî. Çima?

- Hevalekî min heye li wir. Ez dixwazim bibînim.

- Kî ye, ez wî nas dikim?

- Çi ji te re, kî ye, kurê kê ye! Lêwik ji te tiştekî pirs kir, ne got îfada min bigire, got Baqî.

Dawûd keniya. Baqî wî hew kiribû. Mistefayî êdî hew xeber da. Paşê Baqî got:

- Ez jî ber bi wan deranan de diçim. Tu dixwazî em bi hev re derkevin.

- Ez çawa naxwazim, got Dawûdî. Baqû Dawûd rabûn. Mistefa têr ne xwaribû. Ji xwe re xwarineka din jî xwest û got:

- Hûn zû werin ha. Ez baarim bi tenê masiyan giştî bişom û paqij bikim. Baqî lê zîvirî:

- Tiştekî belaş tune ye kurê bavê min…

- Soz Baqî. İşev ez dê te bişînim ba jina te…

Li ber qasê Dawûdî destê xwe havêt bêrîka xwe. Baqî bi çepilên Dawûd girt û ewî derêxist derve û got:

- Patron Misto ye, hadê em herin.

Li vaporê suwar bûn. Bêhna behrê Dawûdî gêj kiribû. Piştî panzdehbîst deqîqeyan li Kadîkoyê peya bûn. Baqî Dawûdî li mînîbûsekê siwar kir û got:

- Riya min heta vira bû.

Dûre Baqî ji şofêr re got:

- Vî hevalî li Kuçukyaliyê peya bike bi xêra xwe.

- "Baş e" got şofêr. Baqî heqê riya Dawûdî da şofêr. Dawûd pir di berxwe da, lê Baqî bi zor da û got:

- Mereqan meke. Ez dê ji patron du qatan bistînim. De hadê oxir be...

Gel kî spas, got Dawûdî.

Dawûd li semteke pir luks û paqij peya bû. Ji hêcanê dikira dilê wî bisekiniya. Adresa Senemê derhanî û ji çend kesan pirsî heta ku xanî dît. Apartmaneke pênc qat bû û nava baxçeyekê de bû. Xuya bû ku bavê Senemê xwedîzewq bû. "Kî zane bê nûha çendî kirê dide!..." got Dawûdî. Li qata çaran, li ser navê derî navê bavê Senemê hatibû nivîsîn. Sînga Dawûd bi lez lê dida. Dawûdî destê xwe dirêjî zîla derî kir. Derî vebû. Diya Senemê bi dengekî nerm got:

- Fermo?

Zimanê Dawûdî li hev geriya.

- Xaltî, gelo Senem li mal e?

- Tu kî yî?

- Ez hevalê wê me. Navê min Dawûd e.

Ew çax ji salonê dene Senem hat:

- Dawûd!...

Senem bi lez hat. Destên hev girtin û hejandin. Çavên wan li hev ketin. Li ber derî weha mabûn. Diya Senemê li wan dinihêrt. Dît ku ew tiştekî ne bêje, ewê hem hey li ber derî rawestin. Ji ber vê yekê got:

- Senem, keça min, ma qey tê hevalê xwe li ber derî bihêlî?

Senem bi xwe hesiya:

- Were Dawûd, fermo.

Dawûd berxwar bû ku pêlavên xwe derêxe, lê Diya Senemê destê xwe danî ser pişta Dêwûd û got:

- Na kurê min, ne pêwîst e. Bi tev pêlavan ve derbas bibe.

Dawûd di nava milkursîkê de winda bûbû. Li vî alî dinihêrt; Diya Senemê, xwîşka Senem û birayê wan î biçûk û li wî alî dinihêrt; Senem...

Beriya ku Dawûd bihaxife, Senemê bi kurtî Dawûdî da naskirin. Teva jî lê kêfxweşî dan. Dest pê kirin vir de, wê de axifîn. Di her pirsekê de Dawûd sor dibû, xwîdan dida. Carina diya Senemê û xwîşka wê li hev dinihêrtin û ji hev re dimizicîn. Paşê di binê çavan re geh li Senem û geh jî, li Dawûd dinihêrtin. Ne Senem û ne jî Dawûdî xwe rehet didîtin. Bi qasî seetekê Dawûd rûnişt. Dûre destûra xwe xwest. Diya Senemê got:

- Tu bimaya xwarinê?

- Na, spas dikim, got Dawûdî. Ez dê xwarinê li ciheke din bixum. Ku qismet be, em`ê car din hev bibînin.

Dawûd rabû û çû destê diya Senemê maçî kir. Senem û xwîşka wê jî bi Dawûdî re derketin.

Di nava mehelê de qederekî geriyan. Xwîşka Senemê bûbû sedema nexeberdanê. Ne Dawûd û ne jî Senem dikarîbûn bi dileke rehet behsa tiştên ku di navbera wan de çêbûbûn bikin. Herduyan jî xwe dixwarin, dixwestin ji hevre bibêjin "Min beriya te kiriye, ez ji te hez dikim..." Lê nedibû. Ji delava van gotinan, behsa xwendegehên xwe, dersên xwe kirin... Dawûd ketibû sala dawî. Ji Senemê re hêj du sal hebûn ku xwendegehê hew bike. Senem bi temen ji Dawûdî biçûktir bû. Lê hiş û aqilê wê, fîzîka wê, bejna wê temam bû... Ji vêga de dilxwazên wê çêbûbûn. Senem teva jî red kiribû. Bav jî, dê jî dixwestin ku Senem, berê xwendegehê hew bike. Bîra Senem unîversîte bû. Digot: "Ez dixwazim bibim doktor. "...Dawûd jî dixewest ku bibe Mamoste. Dawûdî digot: "Ez pir mereqan dikim. Gelo jiyana Mamosteyan çawa ye!..."

Li hevîya trênê bûn. Xwîşka Senemê rê nîşanî Dawûdî da. Ji hatina trênê´re hêj hebû. Xwîşka Senemê ti bûbû:

- Ez dê herim ji xwe ra vexwarinekê bikirim. Hûn jî dixwazin?

- Na, got Senemê.

- Ez jî naxwazim, lê ka ez herim ji te ra bistînim, got Dawûdî.

- Na, got xwîşka Senemê du caran li ser hev. Hûn rûnên, ez vêga têm.

Herî dawî, bi tenê mabûn Dawûd û Senem. Rûniştin. Lê ev car

jî, ji ber şerma ji xelkê li wir, pir nêzîkî hevdû nebûn.

Dawûdî got:

- Senem! Min tişki fêhm nekir. Em dê çi çax bi tenê bimînin?

Senemê porên xwe yên zerî havête paş û keniya:

- Destûra min nadin ku ez bi tenê ji mehellê derkevim. Tu jî, kesî li ba me naxwazî. Ew çax divête ku tu werî vir car din.

- Çawa yanî, ez car din werim mala we?

- Na, ne pêwîst e. Mesela, got Senemê û fikirî. Dûre çavên wê beriqîn:

- Mesela; were li vir raweste. Ez dê bi awekê derkevim.

- Çi çax?

- Du sibe, seet diduyên paş nîvro, baş e?

- Baş e, got Dawûdî bi kêf.

Xwîşka Senemê di desta de şûşeyekî Coco coco, derket hat. Di rê de piçik-piçik vexwaribû. Şûşe bûbû bi nêvî. Şûşê dirêj kir. Senemê şûşê girt û jê du-sê qurtan vexwar... Trên hat. Dawûd li trênê siwar bû. Trên bi rê ket. Dawûd di pencerê re serê xwe deranî. Senemê jê re destê xwe dihejand. Dawûdî jî destê xwe rakir. Trên bi lez diçû. Di nava sê-çar saniyan de Senem û xwîşka wê ji ber çav winda bûn. Dawûd li dewsa xwe rûnişt. Ji vê gavê de ketibû heyecana du sibehê. Destê xwe e bi pencerê vê givaşt û di dilê xwe de got: "çil û pênc seet nayêne kişandin!.."

*

* *

Çar rojan li ser hev, Senem û Dawûd her li eynî cihî hev du dîtin. Tiştek nema bû ku nihatibû axeftin. Geh Dawûd dihaxifî, Senem guhdarî dikir û geh jî Senemê digot, Dawûdî guhdarî dikir. Diçûn kêleka Derya Marmarayê. Bi destên hevdû digirtin. Ku kes li wan deranan tunebaya, lêvên wan biricif digihan hevdu û bi deqîqeyan wisan diman. Soz dane hevdû ku bi hev re bizewicin. Lê ji herdukan re jî hê zû bû. Senem bi doktoriyê ve bûbû dirdirk û bi rastî, Dawûdî jî mamostetî xistibû serê xwe. Ne dixest ku bibe mela. Di malekê de melakî bes bû. İnteresa Dawûdî jî melatiyê re qet tune bû. Ew ji

dersan û ji mamosteyên bi dar, gelekî aciz bûbû. Ku bibaya mamoste, tu caran dar nedida destê xwe. Bi kurtî; diviya ku Dawûd û Senem bi kêmanî, çar-pênc salên din jî xwe ragirtana.

Vebûna xwendegehan nêz bûbûn. Dawûd û Senem careke din hevdû dîtin. Ew dê rojê heta êvarê ji hevdû ne qetiyan. Dûre destên wan î di hev de, sist bûn. Çavên wan tijî bûn. Û trên hat û Dawûd hilda, bir. Hêsirên çavên Senemê herikîn. Bi dileke şikestî berê xwe da mala xwe.

Dotira rojê, Dawûdî ji Mistefa û Baqî jî xatir xwest. Lê kurmamê wî Mistefa, pê re çû heta ber otobusê. Bilêta Dawûdî jî Mistefayî standibû. Dema ku ji hevdû qetiyan, Mistefayî bi zorê, sed banqnot jî xiste bêrîka Dawûdî.

Otobus di ber Kuçukyalî re derbas bû. Dawûdî bêguman serê xwe rakir û heta jê hat, li kuçan nihêrt. Ne apartmana ku Senem lê dima dhît û ne jî xwendegeha Senemê. Di pencerê re sirek hêba hat û rûyê Dawûdî miz da. Çavên li ber girîn, hêsiran paş ve şandin. Qirika Dawûdî şil bû. Dawûd serê xwe sipart koltixê û cixara xwe pêxist. Dûman hêdî hêdî di pozê wî re derket.

## DIRBÉSIYÉ

Dema ku Dawûd kete hundir, şa yîyek kete nava malê. Dê û bavê wî ji mêj ve li wî bihûrî bûn. Dawûd hem ji Edenê û hem jî, ji Stanbolê ji wan re name şandibû. Zarokan, berê xwe havêtin sitûyê Dawûdî, dûre pakêtên wî ji destên wî girtin û bû qerepera wan. Diya wan, xwe gîhande wan û şekir û lokuman li wan belav kir.

Dawûd vebûbû. Dihaxîfî, dikeniya, bi zarokan re dileyîst. Bavê wî di binê çavan re li Dawûdî dinihêrt û ji Diya wî re çavê xwe diqripand. Gerr li Dawûd hatibû. İştaha wî jî vebûbû… Derdiket, diçû ba hevalên xwe û bi seetan bi wan re dihaxifî. Bi piranî diçû dikana birayê Xelîl. Dawûd kiribû, ne kiribû, Xelîlî perê ku dabûyê, ji destan ne girtibû. Dawûd xwe xeyidandibû û peran havêtibû ser masê. Xelîl bi pêşniyarekî pejirandibû. Diviya ku Dawûdî bêrîkên xwe vala bikira û çi derketiba, bikirana bi nêvî. Dawûd ji bilî perên

li ser masê, sed banqnotên din jî derhanîbû. Xelîl lê nihêrtbû ku dema Dawûdî bikira bi nêvî ew`ê bêhtir bihata, poşman bû. Lê Dawûd perê zêde jî dabûyê. Ew çax Xelîlî gotibû:

- Baş e, ez dê big,rim, lê heta çûyina te ya Edenê, çayên te li ser min, baş e?

- Temam, gotibû Dawûdî.

- Ha bi rasti çend rojên te hene? gotibû Xelîlî.

- Şeş.

- Nexwe carek çûyina sînemayê jî li ser min.

- Ew çax birayê Xelîlî ketibû dikanê û dengê sînemayê sah kiribû:

- Hûn ê bêyî min herin lo?

- Haşa, gotibû Xelîlî.

Çavên birayê Xelîlî şemitîbhûn ser perên li ser masê:

- Ev çi ne?

- Çi ji te! Ji cihekê hatin.

- Ma qey tu bi dizî kar dikî?

Xelîlî ji birayê xwe re çav kiribû û Dawûd nîşan dabû. Birayê Xelîl dizanîbû ku Xelîlî pere dabû Dawûdî. Serê xwe hejandibû. Dawûd çavkirina Xelîlî jî, serhejandina birayê wî dîtibû. Lê xwe li tiştekî nekiribû xwedî.

Maçekî standibûn. Ew roj antremaneke hêja kirin. Xelîl, Dîko, Nodguriş, Seid, Ednan... tev hatibûn. Piştî antremanê di nava xwe de pere kom kirin û teslîmî Dîko kirin. Maça ku sitandibûn li Derbêsîyê bû. Ewê Dîko mînîbusekê kirê bikira bî wan perayan. û ku pere bimaya, ew'ê lîmon û benîştan bikirya.

Meydana ku ewê lê bileyîstana, li ber tixubê Sûrîyê bû. Di navbera sahê û tixub de riya trênê û têl hebûn. Kurdên Sûriyê ji dûrî ve dihatine xuya. Cilên wan, meşên wan, axafatinên wan tev mînanî yên kurdên vî alî bûn. Cudahî ew bû ku yên li Sûriyê di bin zulm û tahdeyên ereban û yên vî alî jî di bin ya tirkan de bûn… Yên wî alî dikirin ereb û yên vî alî jî dikirin tirk. Ax ew ax bû ku bi hevdûre çandibûn û zad çinî bûn. Mirov ew bûn ku bi hezaran salan di bin

tava bêînsaf de, bi hevdûre qemirî bûn. Lê vêga xwedî ne ew bûn... Têl hatibûn kişandin, mayin hatibûn reşandin... Keç ji dê, kur ji bav, dotmam ji pismam hatibûn qetandin. Bi kuştin, bi çavtirsandin û bi "sirgûn"an... Tav cardin ew tav bû, lê her yek bi aweyekî dihate şewitandin. Û her yek bi aweyekî dihate şelandin... Ziman ne yek bû, lê diz bê ziman bûn. Û dizî ji xwe re mubah kiribûn...

Maçeke dijwar destpê kir. Dawûd du golên hêja havêtibû. Xelkê Dirbêsîyê, yên ku temaşe dikirin, bi deqîqeyan ji Dawûdî re fîkandin û li çepikan xistin. Taqiman di ber hevdû didan. Maç didu û didu bû. Taqima Dirbêsîyê kontrakekî girîng zeft kiribû. Li pêşiya wan Nodquriş bi tenê hebû. Top ber bi hewayê bû. Nodqurişî beriya teva xwe gîhande topê û şûtekî wisan li topê da ku top bilind bû çû, çû li xeta tirênê ket û car din bilind bû û di ser têlan re derbas bû çû Sûriyê. Tev şaş bûbûn. Zarok çûn heta ber hesin. Kirin ne kirin top nehat. Polîsên Sûriyê topa nûh top hildan û birin, çûn. Leşkerên tirk diranên xwe beş kirin û bû tiqe-tiqa wan û keniyan...

Di Hegerê de Dîko, Nod qhûrişî niquçand:

- Kuro ew çi şût bû?

- Ez çi zanim. Çavên min tarî bûn û serê Mistoyî li hewşa dibistana me hate ber çavên min.

- Serê Mistoyî giran e, got Xelîlî. Ma ji wir û heta Sûriyê diçe?

- Diçe keko, diçe. Ne heta Sûriyê bi tenê, heta Fîzanê jî diçe...

Dawûdî bi hezkirin li Nod qirûşî nihêrt û keniya. Nizanî bû ku Nodquriş çendî yeman bû. Li paş wî rûyê nerm, pişikekî ne karê kiloyan hebû. Navê Nod qirûşbûnê, ji bavê wî hatibû. Dikanekî bavê wî hebû. Mirovekî dilsoz bû û heq çi baya, wî digirt. Carekê muşterîyekî li ser lezê kîloyekî sorik kirîbû. Bavê Nodqurişî girtibû. Mirovî banqnotekî dirêj kiribû û bi rê ve çûbû. Bavê Nodqurişî li pey mirovî banzdabû û gotibû: "Deynê te nodquriş e, ha ji te re deh qurişên te..." Mirovî gotibû: "Heyran ez zanim. Bila deh quriş bimînin..." ..."Na," gotibû bavê Nodqurişî: "Bavê Yûsifî perê zêde nagre!:" û bi zorê perên mirovî dabûyê. Nas û dostên bavê Dawûdî Uluç, Nodquriş, wan dîtibûn û navê wî danîbûn Nodquriş... Hevalên

Dawûdî Uluç jî, vî navî hanî bûn û li Dawûdî Uluç kiribûn.

Roj rojan xwar, şev şevan vexwar û seet bûne vagon û li pey hev rêz bûn. Otobus hat û Dawûdî hilda bir. Rê, rê, rê...

Dawûd di pencerê re li derve nihêrt. Di Ruhayê re derbas dibûn. Bajarê kevnare. Bajarê tijî dengbêj. Beden bi hêybet li cihê xwe bilind dibû. Otobus rawestiya. Zarok ketin otobusê...

- Av, ava sar, ava bûzê, digot yekî ji wan.

- Pelên cigarê, pelên şamî digot yekî din. Û yekî ji wan mezintir jî digot:

- Kent, Marlboro, Pallmall...

Her sê zarokan jî bê guman li rêwîyan dinihêrtin. Ku yek rewîyekî serê xwe bi xuranda, her sê zarok bi hev re ber bi wî rêwîyî de diçûn...

Dawûdî çavên xwe girt. Nodquriş, top û serê Mistoyî xuya bûn.

Dûre polîsên Sûriyê û diranên leşkerên tirk derketin piyasê. Diranên wan tev bi qirêj bûn...

## NUSRET

Saleke nûh, saleke bi jiyan destpêkir. Xwendekarên nûh hatibûn ji Diyarbekirê, ji Wêranşahîrê û ji Sêwregê. Xortên panzdeh-şanzdeh salî... Roja wî ya destpêkê hate bîra Dawûdî. Dema ku ew jî hatibû, sênzdeh salî bû. Pênc salên qerase derbas bûbûn û sala şeşa destpê kiribû... Ev sal xwendegeh hew dibû. Lê ew jî pêre hew bûbû. Di nozdehan de xwe nod salî didît Dawûd. Êdî serê wî ji ketibû nava seriyên mezinan. Weke herkesî, ewî jî payekî dida xwe. Tu bibêjî, ne bêjî, di sinifa heftan de bû û êdî mêhvan bû li xwendegehê...

Di nava zarokên nûhatî de yên Sêwregî pir bi jiyan bûn. Bala herkesî dikişandin. Û her gurûbekî dixwest ku wan di nava xwe de bihelîne. Lê zaro ber bi kesî de ne diçûn û ji hevdhû jî ne diqetiyan. Di nava wan de xorteke şanzdeh salî heb. Bejna wî ya dirêj, ewî mezintir nîşan dida. Xurt bû û bi navpî bû. Her dem ewî hevalên xwe kom dikir û tevan li wî guhdarî dikirin. Yehyayî dûr-dûr li van xortan

bi hezkirin dinihêrt. Rojekê Yehya, Mehemed û Dawûd bi hev re digeriyan. Di nava xeberdanê de navên wan zarokanan jî derbas bûn.

- Şiyar têne xuya, got Yehyayî.

Mihemedî serê xwe hejand û got:

- Rast e.

Yehyayî berdewam kir:

- Gelo em dê çawa bikaribin xwe nêzîkî wan bikin?

Pirsa Yehyayî li hewayê mabû. Kesî tiştek negot. Dawûd destên xwe xistibû bêrîkên şalê xwe û bi dengekî nizim difîkand. Yehya li Dawûd nihêrt û got:

- Dawûd!

- Ha.

- Navê wî kurikê dirêj çi bû?

- Nusret.

- Nusret..., got Yehyayî di ber xwe de... Nusret, bi aqil û giran tête xuya, ne wisan?

- Êrê, got Mihemedî... Em bikaribin xwe nêzîkî wî bikin, yên mayîn bi xweber tên...

Yehyayî heniya xwe ya vekirî miz da û got:

- Rast e, lê çawa!... Yê min tîpa min ne musaîd e. Ez ditirsim ku ji min birevin.

- Ya ez!, got Mihemedî... Hûrikeke reben im. Hê nizanim bi we re bihaxivim.

Berê herdukan jî bi Dawûdî ket. Dawûd mizicî:

- Mame ez, ne wisan?

- Ya, got Yehyayî. Tu di şûna xwe de nasekinî. Di her branşê sporê de pozê te heye. Di xwendegehê de ji Mamosteyan heta xwendevanan, kes tune ye ku te nas nake. Yek "Merheba" kî te dikare bîst hevalan çê bike ji me re.

- Êê?.. got Dawûdî.

- Heyran em ji te bîst hevalan naxwazin. Nusret bi tenê bes e.

- Baş e, got Dawûdî.

Yehyayî rast digot. Kîjan zarokê kurd bihata, berê weke xwe

dima, dûre diçerixî û bi alek ve diçû. Hinek ji wan zarokan dibûn neyarên kurdan û derdiketin... Ev bûbû pênc sal li vira bûn. Di nava van pênc salanan de, pêncî zarok nas kiribûn, ku berê di ber xwe dabûn û dûre bûbûn miyên mêşinî û mabûn. Yan bi hinekan xapiyabûn û yan jî bi xweber guherîbûn... Vêga jî hêjmara zarokên kurd, nê kêmî sedî bû li xwendegehê. Lê hew çend heban bi tenê bi çavên kurdan li xwe dinihêrtin. Û hew çend heban xwe ji nava lepên guran parastibûn... Xwendegehê li bin guhê hevdû bixistana, deh kes dernediketin. Ew jî bêbawerî bûn. Ji ber vê yekê, Yehya, Mihemed û Dawûd ji teva dûr ketibûn. Carina Menaf nêzîk dibû û car din dûr diket. Hebû, tune bû Felêkê... Vê havînê nîşaniya xwe çê kiribû. Kar û barê Menafî, jimartina rojan bû. Dawûd çend rojan li dora zarokên Sêwregî çû û hat. Zarokan bi piranî ji sporê hez dikirin. Dawûd hêdî-hêdî wan ber bi xwe de dikişand. Nusretî jî kêfa xwe ji Dawûdî re dihanî. Çend caran di maçên mînyatur de, bi futbolê leyîstin bi hev re. Hevaltî bi nermî û bi germî destpê kiribû. Êdî zarokan problemên xwe ji Dawûd re digotin. Serê wan di belê de bû. İdara xwendegehê wan bi zanebûn û bi qastî dabû odekekê ku çiqasa gur û hirçên xwendegehê hebûn, li wir bûn. Ew gur û hirçanan jî tev ji nava yên mayîn hatibûn hilbijartin... Di xwendegehê de, li ser navê sporê, qursekhi hatibû vekirin. Di wir de judo, karate û taekwando hîn dikirin. Kesên ku ders digirtin jî tev endamên "Ulku Ocagi" bûn û ji wan pê ve, ji herkesî re qedexe bûn ew qursanan... Ew kesên ku li wê odekê civiyabûn tev di wan qursanan de bûn. Yar û neyaran, herkesî hevza xwe ji wan dikir. Rebenê Nusret û hevalên wî ketibûn nava agir û pêre pêre dişewitîn...

- Ew dê rojekê bela xwe di me bidin, lê nizanim çi çax! digot Nisret.

Pir ne çû. Şevekê hevalekî Nusret dereng hate odekê. Lampê pêxist. Ew çax yekî serê xwe rakir û got:

- Ne otêla bavê te ye!

Kurikî tirsiya û lampê vemirand. Di nava tarîtiyê de ciyê xwe dît û bê deng kete nava ciyan. Nusretî ofînekê kişand. Deng çû ket

guhên kurikî ku gotibû ne otêl e… Kurik weke berazan boriya:

- Yên ku li xweşa wan nayê, bila cehennem bin herin ji vir…

Nusret çavên xwe girt û dinanên xwe li ser hevdhu givaşt.

Roja dinê, Nusretî bi milê Dawûdî girt:

- Dikarî tu bi me re werî?

- Ku derê? got Dawûdî.

- Tu ku derê dixwazî, got Nusretî.

Ji hewşa xwendegehê derketin. Ber bir parkekê de çûn. Bi rêve de Nusret bûyera doh ji Dawûdî re got. Dawûdî mahdê xwe tirş kir û got:

- Odeka xwe biguherînin.

- Ma qey em naxwazin!... Du caran em çhun ba mamosteyan. Li şûna ku li me guhdarî bikin, çêrê me dan.

Dawûdî got:

- Me tirsin. Baarin tiştekî belav bikin. Lê car din jî, xwe ji wan bêbavanan biparhêzin. Neyarên kurdan in. Li ba wan bi kurdî ne axifin. Wext ber hhêvarkî bû. Kuçên bajêr tijî pelên zer bûbûn. Li parkê rûniştin. Kes ne dipeyivî. Nusretî di ber xwe de difîkand. Fîkandina wî bi meqam bû û nava mirov miz dida.

- Gotinên wê ji tune ne gelo? got Dawûdî.

Nusretî bersiv da:

- Belê, çawa tune ye.

Dawûdî dest pê kir, got:

Mirin pir xweş dilo heyran,
Li vê biharê…
Li vê biharê dilo heyran,
Li vê biharê.
Tirba min bikolin dilo hewar,
Li Kurdistanê…
Li Kurdistanê dilo heyran,
Li Kurdistanê…
…

Dawûd ji xwe çûbû. Heta dawî bê nefes guhdarî kir. Pûrtên laşê wî bûbûn sitirî û cit bûbûn. Hêsiran zor dane qapaxên çavên wî yên girti. Lê Dawûd rê neda wan ku birijin.

*

* *

Çendaki derbas bû. Yehya û Mihemed jhî, xwe nêzîkî zarokan kirin. Çi cara ku ji xwendegehê derdiketin û cihekî rûniştinê didîtin, Nusretî destê xwe dida ber guhê xwe û stranên xwe li pey hev rêz dikir.

Rojekê, Yehyayî got:

- Tu me şad dikî, Nusret. Ez pir dilxweş im ku min tu nas kir. Êdî çavên me li paş namînin.

- Ku bihêlin, got Nusretî. Her roj bela xwe di me didin. Duh jî hevalekî me aciz kirin. Kuxihkê jî qedexe kirine.

- İca ev çi ye!... got Mihemedî.

Dawûd pir hêrs bûbû:

- Ger ku car din tiştekî weha bikin, haya me pê bikin.

Ew şev, car din kuxika Remezan girtibû. Kurik çûbû ba doktor. Dermanan fêyde ne dikirin. Dema ku li ser piyan bû, tiştekî wî tune bû. Lê ku dikete nava ciyan, dest pê dikir... Hê duh ji bona kuxikê gur û hirçên odekê kiribûn qerepere... Remezan derket salonê. Dawûd jî li salonê bû. Dawûd, Remezan dît û bang kirê. Remezan ber bi wî de çû. Dawûd bi mereq got:

- Xêr e Remezan?

- Xewa min nayê. Vêga tiştek tune ye. Lê ku ez di nava ciyan de bûma, tu wê ew çax halê min bidîta. Kuxik li ser kuxikê, got Remezanî.

Dawûdî li bejbana Remezanî nihêrt... Berya pênc salan hate bîra Dawûdi. Di şexsê Remezanî de xwe dît. Ew dê çaxê ev kuxik bûbhû bela serê wî jî. Bi rojan kişandibû... Dawûdî got:

- Ez dermanê te nas dikim. Sibe bi xêr em herin ji te ra bikirin.

Kêfa Remezan hat. Dawûdî berê xwe da tuwaletan û ji Remezan re jî got:

- Here razê. Ku tiştek biqewime, tu odeka min nas dikî.

Remezan piçekhî bi tirs deryê odekê vekir. Ji bona ku ne kuxe pir di ber xwe da, lê nebû. Qirika wî peritîbû… Bi dengê kuxikê re yekî serê xwe rakir:

- Kurê qe…n, derkeve ji vir.

Remezan xebera wî lê vegeran. Kurik ji cih pekiya hat û Remezan kişkişand. Nusret bi milê kurik girt û ewî dahf da. Ew çax çar kesan bi hev re hêrîşî ser Nusretî kirin weke gurên devbixwîn. Remezan banzda çû odeka Dawûd û bi girîn Dawûd şiyar kir. Bi Dawûd re odek tev şuyar bûbû. Dawûd pêxwas da pey Remezan. Yehya û Mihemed jî li pey wan derketin. Menaf berê serê xwe xurand û dûre ew jî rabû çû… Deriyê odekê vekirî bû. Dawûd di nava komekî de, serê Nusretî şikestî dît. Janê havêt dilê wî û kete nava wan. Xwe gîhande kê, lê da û di ber re jî digot:

- Bes e, bes e me ji we kişand!...

Yehya û Mihemed zû hatin hawarê. Menaf jî weke ku ji xewekê şiyar bibe, ciniqî û ew jî di nava qelebalixê de winda bû.

Pîspiska nobedarê şevê û dengê mamosteyekî, wan rawestand. Mamosteyî deriyê odekê girt hu kaxetekî û pênûsekî derhanî. Navên tevan bê îstîsna nivîsî. Nusretî teslîmî nobedarê şevê kir û wî şand ji bona serê xwe pansûman bike…

Wan rojanan teftîş hebû. Ji ber vê yekê serkariya xwendegehê dixwest ku bûyerê zû bigire. Cezayên sivik dane wan Nusret û hevalekî wî dane odekeke din. Remezan careke din şandin ba doktor û di vegerê de ewî di rewîra xwendegehê de razandin…

Piştî vî şerî, êdî kesî bela xwe bi zarokan ne da. Nusret deh rojan bi serê girêdayî geriya. Ji wan guranan rizgar bûbû, lê car din jî bê kêf bû Nusret. Dawûdî dikir û nedikir venedibû.

- Ev der ne cihê min e. Weke ku bi saxî min xistibin gorê, digot Nusret… Ax bavo, te min şewitand…

Dawûdî tiştek ne digot. Qedera zarokên kurdan ev bû. Ji her malekê yekî dişandin ji bo melatiyê. Yan bav mela bû û yan jî çavên bavan tarî bûbûn û ji tune bûnê zarokekî xwe dikirin bi qurban û dişandin xerîbîyê.

Ger ku ne sala dawî bûya, Dawûd ji zû ve de terka xwendegehê dikir. Vêga jî, tu mafê wî tune bû ku ji Nusretî re tiştekî bibêje.

Di destpêka meha sibatê de ji hevdu qetiyan. Ketibûn semestira zivistanê. Otobusa Nusret beriya ya Dawûd rabhû. Nusret bi çaveke tijî li Dawûd nihêrt û destê xwe jê rakir ji paş pencerê. Dawûd baş li Nusretî nihêrt. Dixwest ku şiklê vî kurikî ji bîr meke. Ev cara dawî bû. Êdî Dawûdî ji Nusret bêguman bû... Bi rastî jî Nusret hew hat. Di meha gulanê de nameyek hat ji Dawûdî re. Nusret hev hat. Di meha gulanê de nameyek hat ji Dawûdî re. Nusrt dev ji xwendegehê berda bû û li Ruhayê ketibû karekî. Di dawiya nameyê de Nusretî digot: "Dirûnên pêlavan ji zulm û zordarîyên bênamûsan çêtir e."... Dawûdî namê du caran xwend. Dûre destê xwe danî ser heniya xwe. Dawûd bi qasê seetekê, name li ser çogê, li ser benka wê parka ku her tim diçûnê rûniştî ma... Sirrek hêba bêhna axê bi xwe re hanî. Ax li ber zayînê bû... Gul û çîçek li ber vebûnê bûn û jiyan berdewam bû... Dawûdî nameya bêadres çirand û havêt. Destên xwe xiste bêrîkên xwe û berê xwe da xwendegehê. Bi dengekî nizim strana ku Nusret digot, ji nava lêvên wî derket:

Dilo ez bimrim, dilo hewar,  
Li vê biharê...  
Li vê biharê, dilo heyran,  
Li vê biharê...

Dema ku Dawûd di deriyê hewşa xwendegehê re kete hundir got:" Oxir be Nusret!..." ... Ew çax topekî hat û li ber piyên Dawûd sekinî. Xwediyê topê dûr bû. Dawûd şûteke wisan lê da ku top çû ji xwedî derbas bû... Ew çax Nod qirûş û topa ku çûbû Sûriyê hatin ber çavên Dawûdî...

## AZMÛN

Rojên dawî bi kêf û bi ken derbas dibûn. Êdî rizgar dibûn ji xwendegehê. Şeş salên weke şêst salan, tijî kul û derd li dawî mabûn.

Sê heval, Yehya, Dawûd û Mehemed, li ber deriyê hewşa xwendegehê kêlîkekê man. Dûr dirêj li pey xe nihêrtin. Yehya nîvê

porê xwe li vê xwendegehê weşandibû. Ji paş ve guriya serê wî dihate xuya. Dawûd ji mirinê rizgar bûbû û Mihemed jî, porên xwe sipî kiribû... Roja pêşî hate bîra Dawûd; ew û Yehya û Menaf bûn... Menaf carina payiz û carina î buhar bû. Lê Yehya weke xwe mabû. Dewsa Menafî, Mihemedî girtibû. Û vêga jî, Mihemed bûbû Menaf di çavên Dawûdî de...

- Qeda li te bikeve ey xwendegeh! got Yehyayî.

- Û set caran, got Dawûdî.

Mihemed keniya û got:

- Ma qey hûn dibêjin em rizgar bûn gelo?... Jiyan hê nûh dest pê dike...

Kesî bersiv neda. Alavên xwe hildan û ketin rê.

*

* *

Bîst rojek derbas bû. Kaxeteke resmî hate ji Dawûdî re. Dawûd kaxetê bêkêf vekir. Ev ew kaxet bû ku Dawûd bi rojan li hêvîya wê bû. Baor kaxetê, piştî deh rojên din, diviya ku Dawûd biçûya Enqerê ji bona azmûnê. Keyfîyet tune bû, mecbûrîyet hebû... Şeş salan sorbên wan hi bi sabûn û zeytûnen wan î petyayî xwaribû Dawûd... Vêga jî diviya ku deynê xwe bidaya. Diviya ku ji wan re kar bikira. Yan na tezmînat vedibû û ne îşê hezeran bû. Çare tune bû... Dawûdî xwest ku kaxetê zîval zîvalî bike. Lê nekir. Pozê xwe kişand. Destên xwe xiste bêrîkên şalê xwe û riya girê qezzê girt. Çi cara bêhntengî dibû, diçû serê gir. Bişkofkên sînga xwe vedikir û sînga xwe dida ber bê. Piştî ku sist dibû, xwe dirêj dikir û guhdariya çivîkan û xişe-xişa pelên daran dikir. Beriya ku ji ser gir dakeve, jî, diçû wî seriyê gir, li ser kevirekî rûdinişt û dikete temaşa qezê...

*

* *

Destê sibehê, otobus li Enqerê rawestiya. Ev cara pêşî bû ku Dawûd bê alav û bê bar bû. Çavên xwe firikand. Li kêleka wî Menaf û li paş wan jî Yehya û Mehemed rûniştî bûn. Wekî din jî hebûn...

Azmûn piştî nîvro bû. Hê pir hebû. Her çar heval ji yên mayîn

qetiyan û dane nava Anqerê. Li cihekê taştê xwarin. Dûre çûn cihê imtîhane dîtin û car din dageriyan hatin nav bajêr. Her serê gavê li hinekan rast dihatin. Ji her derê xort hatibûn… İro ew`ê tev bi hev re biketana azmûnê û sibe ewê bibana sê grûb. Jêhatî, normal û qels… Grûba yekem, ew kesên ku ji azmûnê jêhatî derketana, di nava bîst rojan de, ew`ê dest bi melatiyê bikirana… Ew kesên normal, yên gurûba dudoyan, ew`ê meheke qurs bidîtana û paşê biketana dora melatiyê… Û grûba sisiyan, ewa ku ew kesên qels têde cih bigirtana, didan cihekê ku du meh û nîv lê qurs hebû… Dawûd grûba sisiyan xistibû serê xwe. Çendîn melatî bi derengî biketa, ew`ê ew çend baş bibûya… Ji zemanê sûd digirt… Heta wê çaxê encamên azmûnên universîtan jî kifş dibûn. Dibû ku ji vî derdî rizgar jî bibûya…

Heta dema imtîhanê, yek kuçekî Anqarê ne hiştin ku lê ne geriyan. Di ber re jî çûbûn ji xwe ra li otêleke herzan cih jî girtibûn. Çi dibû, çi ne dibû.

Hewşa diyanetê tijî mirov bûbû. Bi kêmanî, hebû pênc sed kes. Tev bi hêcan li hev digeriyan. Dawûd beriya tevan derket hewşê. Kaxeta xwe vikî-vala dabû. Hew navê xwe nivîsî bû. Li hewşê çend tûran havêt. Cigara xwe pêxist. Êdî kes tune bû ku jê re bigota ew çi cigare ye? Êdî ne pêwîst bû ku pakêta xwe bixista heft qulan û veşarta û êdî cigarekişandinên di tuwaletan de kuta bûbûn… Alekî hewşê li Anqarê dinihêrt. Diyanet li ser gireke bilind bû û bajar di bin piyan de bû. Dawûd pişta xwe da diwêr û li ser qelafîskan rûnişt. Simbêleke ziravik berdabû Dawûd. Destê xwe bir ber devê xwe û bi simbêlên xwe leyîst. Dûmana cigarê di nava tiliyên wî re hêdî hêdî derket.

Menaf xuya bû. Berê xwe dabû Dawûd û dihat.

- Hii, te çi kir? got Dawûdî.

- Ma ez dê çi bikim… Te kaxeta xwe vala da, min jî şaş çêkir.

- Nexwe emê çendakî din jî hevdû bibînin.

- Wisan tête xuya.

Qaseke din Mihemed û Yehya jî hatin. Mihemed bi mahd, Yehya bi kêf bû…

Heta nîvê şevê li serxwe geriyan. Hingê bi rê ve çûbûn, binê lingên wan reş bûbûn. Ew Dawûd`ê ku dikete nava ciyan û bi seetan li pey xewê digeriya, ew şev çawa xwe havêtibû ser ciyan, weke meytekî di xewê re çûbû.

Dotira rojê, ber nîvrokê çûn Diyanetê. Lîste tev derdekirî bûn. Dawûd di nava qelebalixê de xwe bi zor gîhand ber pencerê. Li navê xwe geriya. Sakin bû. Ji ber ku beriya jê re were gotin, ewî cihê xwe dizanî bû. Navê xwe dît. Di hember navê wî de Grûb: C, Qurs: 2 meh û nîv, Cih: Konya hatibû nivîsîn. Û li binî notekî hebû: "Ew kesên ku ewê herin Konya, divêt ku di pêncê tîrmehê de, li xwendegeha melatiyê de amade bin..." Dawûd di lîsta xwe de navê Menafî jî dîtibû. Menaf jî rêwîyê Konyê bû. Dawûd çavên xwe li Menafî gerand. Menaf vî alî, wî alî li navê xwe digeriya. Dawûd bi milê wî girt:

- Mizgîniya min li te, Menaf. Tu ji weke min...

- Bira lo?

- Ha waye navê te li wir e.

Menaf bi lez çû ber lîstê. Mihemed bimahd pişta xwe dabû derî û li erdê dinihêrt. Dawûd çû ba Mehemed hû got:

- Xêr e Mihemed?

- Ez çi bikim heyran! Min kir û ne kir çênebû. Bi tişkî pir hindik min grûba A winda kir:

- Meke derd. Pir pir meheke din, got Dawûdî. Lê bersiva Mehemedî, Dawûdî di cih de zuwa kir:

- Ma tu nizanî ku cihên baş tev li grûba A belav dikin?... Ji me re jî gundên dûr û bêxwedî dimînin.

- Na lo! got Dawûdî, Tu di grûba B de yî û gundên dûr û bêxwedî ji te re bikeve, xwedê zane ji me re çi dimîne!

Mihemed keniya û got:

- Baor vê rewşê ji we re jî serê çiya, teht û newal dimînin...

Dawûd ev car hêrs bû û got:

- Ez di mizgeftan de narizim!

Dengê Dawûdî bilind derketibû. Ew kesên li wê derê tev li wî

zîvirîn. Dawûd sor bû û derket kuçê. Mihemedî jî da pey wî. Menaf jî derket.

- Kanê Yehya? Pirsî Mihemedî.

- Çikas ez binihêrim, got Menaf û çû li Yehyayî bigere. Pir nema hatin. Dinanên Yehyayî beş dikirin.

- Yê min temam e, got Yehyayî.

Hevalên wî jê re kêfxweşî dan. Bi destên Yehyayî girtin û hejandin.

- Hevalno, got Yehyayî ezê du-sê rojên din jî li vira bim. Nasên min hene. Dibe ku ez ji xwe re ciheke baş zeft bikim.

- Nexwe emê ji hev biqetin ha! got Menafî.

Yehyayî lê vegerand:

- Êrê keko... Pêşiya we vekirî be. Me şeş salan bi hevdûre xwar û vexwar... Mirin heye... Li min helal bikin...

Çavên teva sor bûbûn. Hevdû hembêz kirin. Ew çax Dawûdî ji Yehyayî re got:

- Te got nasên min hene?

- Herê.

- Gelo jêhatî ne?

- Têra xwe hene. Pirs çi ye?

- Ez dê ji te tiştekî bixwazim. Lê ne ji bona min e. Mihemedî pir dixwest ku zû bi zû dest bi melatiyê bike. Lê bi tiştekî pir hindik grûba A winda kiriye...

- Min fêhm kir, got Yehyayî.

Mihemed zer bûbû. Yehya careke din Mihemedî hembêz kir û got:

- Çavên mino, ma em ne bira ne?... Tiştê ku ji destê min were, ez dan û paş naxim.

- Sipas, got Mihemedî. Çavên li ber girîn stêrk havêtin ji kêfa.

Adresên hevdû girtin. Ji hevdû xatir xwestin û Dawûd û Menaf ber jêr û Yehya û Mihemed jî ber jor çûn.

Di rê de Menafî dest bi tinazan kir. Lê Dawûdî bi yekî jî ne keniya. Şiklên Mihemed û Yehya ji ber çavên wî ne diçûn... Şeş

salan talî û tengasîyan bi hevdûre kişandibûn... Kî zane ku çi çax, li ku derê û bi çi awayî ew`ê li hevdû rast bihatana! Di demeke jiyanê de mirov li hinekan rast tê. Dûre jiyan berdewam dike û ew hinekanan car carina têne bîranîn... Yan jî di bin rêzikên pirtûkan de û di refan de dirizin diçin...

## BAJARÉ KONYAYÊ

Riya bêdawî dest pê kiribû ev car. Erê, du meh û niv bu qûrs... Ewê li bayê xwe derbas biba... Lê dûre!

Dawûd heta Konya hizirî. Di wê riya dirêj de, navê xewê negirtibû çavên wî... Hê tav du bejin dirêj bûbû, bajarê li wê rastê weke gureke devbixwîn devê xwe vekir û ketin riya xwendegehê. Ne rê dizanîbûn û ne jî cihê xwendegehê. Li wê derê, taksiyên li hêviya rêwîyan hebûn. Lê herdu jî tu car li taksiyên taybetî suwar nebû bûn. Dawûdî dixwest, lê Menafî berê xwe dabû bajêr û peyatî diçû. Li pey xwe jî got:

- Tu têyî, were. Yê min va ez diçim.

- Dibêjin dûr e, got Dawûdî.

Menafhî kir niç-niç û got:

- Beriya şeş salan bîne bîra xwe. Ji bona du gav rê, me çiqasa pere dabû paytonê?..

- Le, çi qazoxekî delal bû ne wisan, got Dawûdî bi ken û da pey Menafî.

Qismetê wan vekirî bû. Li xwe heyrî neman. Ketin nava bajêr. Kes tune bû ku pirs bikin, lê xwendegeh li ser riya wan derketibû. Bi ser de jî, ji bona razanê ji xwe re cih jî dîtibûn. Hilkişiyan ser ciyên xwe û ketin xewên şêrîn...

Nîvrokî hewşa xwendegehê tije xortên mînanî wan bûbû. Bi qasê sê sed mirovî hebûn. Ji her bajarî hatibûn... Heval hevalî, nas nasî kişand û beriya hêvarê grûba Dawûd û Menafî bû deh kes. Û dotira rojê bûne bîst...

Xwendegeh têr ne dikir. Ji wan re bînaya "Konya Yuksek İslam Enstîtusu" girtin. Du bîna hebûn di hewşa fireh de. Di nîverasta

hewşê de cih girtibûn û herdû jî têra xwe mezin û bilind bûn. Li kêleka wan jî mizgeftekî ne karê xwendegehan hebû. Qubba wê, minaleka wan jî mizgeftekî ne karê xwendegehan hebû. Qubba wê, minaleka wê nê kêmî yên mizgeftên nava bajêr bûn. Li pêşiya hewşê hawuzeke fireh û ne kûr hebû. Avê tê de şîn dikir. Li dora wê hawuza gilover, benkên biçûk î delal bi cih kiribûn. Bi rastî planeke xweş dabûn her tiştî. Nava hewşê tijî darên bilind bû. Di wê germa havînê de mirov pir aciz ne dibû... Ew herdû bîna têra kiribûn. Lê di bicihkirinê de Dawûd û Menaf ji hevdû qetandibûn... Ev ji hevdû qetandin bi xwe re berê ji hevdû dûrketin û dûre ji hev cuda bûneke hêdî, lê bi temamî hanî bû... Çawa ku hestî di laş de girs dibû û goşt bi hestî re şikil digirt, av jî berê li hev diket û dûre zelal bûbû...

*

* *

Roj bi roj xortên kurd civata xwe mezin kirin. Roj hebû ku çil kes digîhan hevdû. Û weke her tim, dilnexwaz pir bûn û pîlanên xirabkirina, belavkirina vê gurûba mezin dikirin. Di wê hewşa mezin de tu grûba sîyasî, bi dizî yan jî eşkere, çendî mirov kom ne dikirin... Weke rovîyan dûvên xwe dihejandin û li ser nêta "te çi xwar kar e." li dora kurdan dizîvirîn. Û neyar, neyar bû, lê ji hevdûre dostên bi dizî bûn... Dema ku li hevdû rast dihatin, berê bi hawiran li hevdû dinihêrtin dûre dibûn yarên hevdû û bi neyarî li kurdan dinihêrtin. Carina neyariya wan dibû xezeb... Û biryar dan ku bi çi awayî be, bera bibe, şêr bikin pisîng.

Weke her car, tirsonek û bêbext pir bûn di nava civata xortên kurd de. Bi dev digotin "Em kurd in", bi kurdî diaxifîn, lê ne Kurdistanê dixwestin û ne jî tiştekî din... Dîn, îman, xuda, pêxember... ji wan re di ser her tiştî re bûn... û dewlemend jî musluman bûn... baor wan kesan tu zilm û zordarî, tu ferq û merî tune bû... Bindest û zordest bira bûn... Weke din; xiyanet bû... Her tim ev bêhişiya zarokên kurd dibû sedema mirinên wan... Ji hev bela dibûn, winda dibûn diçûn... Bê şexsiyet diman û ji neyarên koka kurdan re dibûn terî, dibûn dûv û diman...

Di nava mehekê de, hejmara kurdên bi hev girêdayî ji çilî daket heft kesan. Hin ji wan bi çavtirsandinan û hin jî, bi xapandinan ji grûbê dûr ketin. Û ji xwe, yên ehl î kêf û bêbext jî berya teva veqetiya bûn. Di nava wan heft kesên dawî de Menaf jî hebû. Lê rojekê Dawûd û Menaf hevdû bêminet kirin. Li cihê xwarinê bûn. Li dora masa wan î dirêj deh kes hebûn. Menaf li Dawûdî rûdinişt. Li hember wan jî, du kesên Turkeşçî (Faşîstên tirkan) hebûn. Yên mayîn jî ne kêmî wan kesanan bûn. Di hember Dawûd de faşîstekî ku çend caran bela xwe di Dawûd de dabû, rûdinişt. Li Edenê hindik ranebûbûn hevdû... Kurukî ji kelîma kurd dikete dehşetê û dizanî bû ku Dawûd jî kurd bû. Kurikî bi qastî û bi dengekî bilind got:

- Çend kurd û komunîst hebin, mirov bişîne Moskowayê, ew çax ev welatê xweş dibe bihişt.

Kurekî li çavên Dawûdî dinihêrt. Dawûd ne peyivî. Menaf zer bûbû.

Kurik ev car ji Dawûdî re got:

- Ne welê ye Dawûd?

- Çi ne welê ye? got Dawûdî.

- Dibêjin Mosqowa xweş e û Sîbîrya fireh e. Têra hemû kurdan dike, ha, ha, ha...

Dawûd bi dengekî sakin got:

- Ma qey kurdan bazdane ser d...a te gelo?

Ew çax firaqên ser masê hemû hatin xwarê. Bi kulmiskan gîhane hevdû. Faşîstekî rahişt kêrika fêkî ya ku li ber wî bû û hêrîşî Dawûd kir. Yên li dora wan girtin û wan ji hevdû cuda kirin...

Disiplîn, ceza tune bû li wê derê. Mamosteyek hat wan kesên li dora wê masê rûdiniştin, teva îxtar kir û Dawûdî ji wê masê rakir û bir maseyeke din î dûr. Menaf jî, ji wê masê rabû. Lê ne çû ba Dawûdî. Çû û li maseyekî ji teva dûr rûnişt. Xuya bû ku Menaf êdî hevaltiya Dawûd ne dixwest... Hevaltiya bi talûke jê re ne pêwîst bû. Û vêga Dawûd bûbû dînamît... Menaf bi wê tewra xwe, xwe dabû ber siyê, tav jê re ne baş bû. Dawûd çetela xwe di goştê ne pijyayî de çikiland û rabû derket. Li hewşê çend tûr havêt û çû li

kêleka birkê rûnişt. Hevalên wî yên mayîn li ciheke din xwarin dixwarin. Dema ku bi wê bûyerê hesiyan, weke camêran rabûn û hatin nig Dawûd û dilê wî şakirin. Ev dilnermkirin, kula Menafî dabû jibîrkirin. Mabûn şeş kes. Lê car din jî, ji çilên beradayî çêtir bû: Dawûd, Husên, Xidir, Harûn, Emer û Seîd...

Emer ji peyivtinê pir hez dikir. Gava ku devê wî vedibû, êdî ji kesî re rê ne dima. Bi çaveke serokatiyê li xwe dinihêrt. Ev car jî, berê ewî xeber da:

- Bijî Dawûd! Tu vêga ketî çavê min.
- Berê ez li kû derê bûm gelo? got Dawûdî.
- Di bêrika şalê Emero de, got Seîdî bi tinazî.

Tev bi vê gotinê keniyan. Emer kete milê Dawûd û di hênkaya berêvarkî de berên xwe dan Meramê. Meram li dervayê Konyayê bû û ciheke bi dar û ber û avî bû. Herdû kêlekên rê hemû baxçên fêkiyan bûn. Di rê de, ketin baxçekî ji her çavan dûr û têra xwe fêkî xwarin. Yên ku çavên wan têr nebûbûn, bêrikên xwe tijî fêkî kirin.

Li Meramê pir man. Li wê derê li çend kesên nas rast hatin.Yek ji wan kesanan Salih bû. Bejneke bilind, poreke zerik û çavên şîn durbeke ewrûpî dabû Salih. Çaxa ku Dawûdî sah kiribû ku Salih jî kurd bû, bawer ne kiribû. Vêga ew Salih bi kurdîyeke bêqusûr li wan kefxweşî dida û bi çavên tijî hezkirin li Dawûdî dinihêrt. Ewî bûyerê sah kiribû... Lê Salih li wan pir ne sekini û bi riya xwe de çû.

Salih yekî bê deng bû û hertim bi tenê bû. Ji civatan hez ne dikir. Her tim di bêrîka çakêta wî de pirtûk hebûn. Rûdinişt û bi seetan dixwend. Di nava bend û rêzikan de winda dibû diçû. Carina jî, de stên xwe dida ber ruyên xwe û dûr û kûr dihizirî. Emer navê wî "Fîlozof" danî bû. Lê filozof di rewşeke neçê de bû. Li Mêrdînê xwendegeh hew kiribû û li wê derê şoreşgereke yeman bû. Wî û hevalên kurd bişon. Çend kesên girs î perwerdekirî hatibûn xwendegehê û vêketibûn xire-cirê. Ji her halên wan xuya bû ku dixwestin li xwendegehê tevlîhevîyê çêbiin. Yek ji wan kesanan Riza bû. Riza di nava tevan de yê herî bê ar bû. Rojekê lêdaneke hêja xwaribû. Piştî wê lêdanê kesî Riza ne dîtibû. Li bayê xwe çûbû

bajareke din. Û ew Riza îro jî li Konyayê bû û weke gureke devbixwîn li dora Salih diçû û dihat. Rojên pêşî dengê xwe dernexistibû. Çavên wî nedibirîn ku bi tena serê xwe derkeve pêşiya Salihî. Bi bejnê û bi qelafetê ne kêmî Salih bû, lê bêzirav bû. Ji ber vê yekê, berê ji xwe re hevalên mînanî xwe kom kir li dora xwe. Qiyametek kûçik û dûçik dabûn pey wî. Paşê li her derê derheqê Salih de propagande kir. Salihî her roj, her tiştî sah dikir û li hevîya derbê mabû. Dizanîbû ku ew dê rojekê fermana wî rabe, lê çi çax bû, nizanîbû... Roj hat ku Salih di hewşê de girtî ma. Her roj neyarên wî li devê deryê hewşê kom dibûn û jê re gefan didan.

Rojekê, piştî xwarinê û dema ku roj diçû ava, Salih li hewşê tûr dihavêt. Car din bi tenê bû û car din bi tena serê xwe bû. Ji nişka ve, nêzîkî deh kesan dora wî girtin. Rizayî bi milê Salihî girt û ewî kişkişand. Selah wî dahf da û got:

- Tu çi dixwazî?

- Hesabekî me yî nivçe hebû, were em safî bikin, got Rizayî.

- Tu hesab mesabên min bi te re tune ne, here karê xwe!

Rizayî bi milê Salihî ve bû dirdirk. Hevalên Rizayî tev li Salihî civiyan û ewî bi dahfdanan dane pêşiya xwe.

- Tu mêrî derkeve derve, digot Rizayî. Reng bi Salihî ve nema bû. Lê car din jî ji mêraniya xwe daneket xwarê.

- Were kuro, were..., got Salih û ji hevalên Rizayî re jî got:

- Ger ku hûn mêr bin, ne deho-deho, yeko-yeko werin...

Ew çax pir kes hatin temaşa wan. Ne kesî diwêrîbû ku navçîtî bike û ne jî kesî dikarîbû bipeyive... Piraniya wan kesan jî kurd bûn bi ser de. Herê, ew kurdên bê bext û çî me jê... û bê şerm û bê heya hatibûn temaşê jî...

Dawûd û hevalên xwe ber bi qelebalixê ve dihatin. Tevan ji Salih dîtibûn. Dawûdî lez kir. Lê Emerî bi milê Dawûdî girt û got:

- Tu çi dikî Dawûd?

- Çawa ez çi dikim?

- Hişê xwe bîne serê xwe, tu nabînî qiyametek in.

- Tu çawa dikarî welê bipeyivî Emer? got Dawûdî û bi çaveke

ecêbmayî li Emer nihêrt. Ew çax Husên jî peyivî:

- Emer rast dibêje. Hem çi karê me bi mêrikê bê dîn û bê îman ketiye!...

- Herê ya, got Xidirî. Ka rojekê hate ba me? Na. Yê me em musluman in û çi halê wî hebe, bila bibîne.

Çavên Dawûdî stêrk havêtin. Êdî tiştekî peyivtinê nema bû.

- Baş e ku min we nas kir. Hevalên tirsonek û bêzirav ji min re pêwîst in. Yê min û we heta vir, got Dawûdî û bi rê ve çû.

Kesek li pey Dawûdî neçûbû û bi ser de jî Emer tinazên xwe bi wî kiribû. Ew Emer`ê ku di tifikê de xwelî ne dihişt, ew Emer ê dema ku diaxifî, mirov digote qey bûye pêşmerge û vêga li serê çiyan e, îro her tiştî firotibû û ruyê xwe yê bi qirêj nîşan dabû. Yên mayîn jî, jê ne kêmtir bûn…

Dawûd tam di devê derî de xwe gîhande Salihî. Rizayî bi hêrs got:

- Tu dûr raweste.

- We ew bi tenê dît, ne wisan, got Dawûdî. Hê ew dê bipeyiviya, lê boksekî hat û li ser pozê Dawûdî danî. Û di devê derî de bû hingedinga wan. Di hember bîst milan de çar mil ketin berxwedanê. Pir nema du-sê kesên din hatin navçîtî kirin. Lê wan kesan jî, ji Riza û hevalên wî lêdan xwarin û ew kesanan jî, mecbûr man û alîkariya Dawûd û Salih kirin. Dema ku xelkên derve hatin û wan ji hevdû cuda kirin, hê xwîn ne rijiya bû. Çavekê Salih werimî bû. Bişkovkên Dawûd şikestibûn û sînga wî derketibû meydanê. Dawûd li ser hev bîhn distand û sînga wî bilind dibû û dadiket.

Ew kesên ku bi hizra navçîtiyê hatibûn û paşê bûbûn hevalên wan, hê jî li ba wan bûn. Yek ji wan kesan Recebê Elbîstanî bû. Çend caran silav dabûn hev û Dawûd wî bi Salih re dîtibû. Receb jî bi Dawûdî re keniya û got:

- Ez çavên te bixwi lo! Bi xêra te pozê me jî şewitî.

Dawûd ne peyivî. Li Recebî nihêrt.

- Ez dê vêga ji te ra tiştekî bibêjim, lê pê neşkê, got Receb.

- Fermo.

- Ew kesên ku tu bi wan re digeriya, mirovên bêzirav in. Ez Emer jî, Xidir jî, Husên jî baş dinasim.

- Tu rast dibêjî, got Dawûdî.

- Raweste, hê hew nebû hevalê delal. Ji bîr meke, kes ne mînanî xwe ye. Bê tecrûbekirin, nayê fêhmkirin.

- Ev jî rast e, got Dawûdî, Duh em şeş kes bûn, îro mame yek.

Na qurban. Tu ne yek î, got Salihî, tu bi serê xwe şeş î û ez jî bi te re, dibe heft…

- Ku carina hûn min jî binivîsin, em dikin heft û nîv, got Recebî.

Tev bi hev re keniyan. Bi ken re çavê Salihî werimandî winda bû.

Mabû deh rojekî ji hewbûnê re. Salih li kû derê, Dawûd li wê derê bû. Receb jî dihat. Piştî wî şerî, Dawûd û Recebî jî xwe di hewşê de heps kiribûn… Emer, Xidir, Hisên, Harûn û Seîd piştî wê "teresiya" xwe, ji hevdû belav bûbûn û carina, ku yek ji wan li Dawûdî, yan jî li Salihî rast bihata, serê xwe dikirin ber xwe û bi lez derbas dibû diçû…

Li qata sisiyan odekeke mezin hebû. Di nava odekê de şirît hebûn. Mirov dikarîbû cilên xwe yên şûştî li ser wana raxista. Dema razanê bû. Dawûd cilên xwe yên şûştî yeko-yeko dawdişand û bi şirîtê ve radixist. Carekê, bi dengekî qalind re veciniqî. Dengê Rizayî ketibû odekê. Bi hevalekî xwe re diaxifî Riza. Di destê Rizayî de kêrikek hebû û sêva di destê xwe de diqeşart. Ji nedîve, çavên Dawûd û Riza li hevdû ketin. Riza berê xwe da Dawûd. Dawûdî şalê xwe yê şil li milê xwe yê rastê gerand. Riza kir ku kêrikê li Dawhud bixe, hevalê Rizayî hişk bi milê Rizayî girt û got:

- Tu çi dikî Riza?

- Ez dê welat ji bê îmanekî rizgar bikim.

Riza kir nekir, hevalê wî milê wî berneda. Dawûd di şûna xwe de cit sekinî bû. Qet ne dipeyivî.

- Ev car bila wisan be. Lê heştemin em dê careke din li hevdû rast werin, got Rizayî. Dawûd heta jê hat xwe sakin kir û bersiv da:

- Dinya biçûk e.

Paşê Dawûdî şalê di destê xwe de baş givaşt û havêt ser şirîtê.

Riza û hevalê wî derketin çûn.

Di nava ciyan de Dawûd vî alî, wî alî zîvirî. Çavên wî xew ne digirtin. Ne tiştekî biçûk bû. Lê ku Riza kêrik lê bixista! Ricfekî kete nava dilê Dawûd. Dev li lêvên xwe kir. Destê xwe bir heniya xwe. Xwêdana sar paqij kir û got: "Dawo, tirs ji bo pîrekan e. Piştî çendî dîkîtiyê, xwe meke mirîşk!" Paşê-çavên xwe girt. Porên Senemê xuya bûn. Dûre çavên kesk... Pê re muzîke destpê kir û Senem bû kew û basikên xwe li ba kir...

*

* *

Dawûdî di hemû azmûnan de xwe bêxêr kir û dawîya dawî, bi ya wî bû. Mamosteyan ji wî tiştek fêhm ne kirin û biryar dan ku ji Dawûdî re ku qurseke din pêwîst bû. Roja dawî kaxetekî xistin destê Dawûd. Dawûd kaxetê vekir xwend. Kaxetê digot: "Baor vê rewşê, berê, li bajarê Boluyê, li felan qezayê, di bin qontrola Miftî de, du mehan qurs û piştî vê yekê, li felan gundî destpêkirina melatiyê..." Dawûdî kaxet qat kir û xiste bêrîka xwe. Baş bû. Qet nebe du mehên din fêyde kiribû. Panzdeh rojan jî heqê rê, dikir du meh û nîv... Heta wê demê çi dibû, çi ne dibû...

Ew sal bavê Dawûd barkiribû Stanbolê. Ev ji Dawûdî re baş bûbû. Ew dê her hefte bikarîba ji Bolu biçûya Stanbolê. Ji alek din ve Bolu nêzîkî Enqarê jî bû. Dibû ku di nava vî zemanî de bi çend carên çûn û hatinên Anqarê re, ji xwe re çareyekî jî bidîta. Nas û dost hebûn di parlamentoyê de...

Dawûd beriya ku li otobûsê siwar bibe, cara dawî li bajêr nihêrt û got: "Bi xatirê te jî Konya!...

## BAJARE BOLU`YÉ

Li Stanbolê roj li bayên xwe diçûn. Diya Dawhûd û xwîşk û birayên Dawûd jî hatibûn. Xanîyekî mizgeftê dabûn bavê Dawûd. Xaniyeke ji textan avakirî û bêxêr bû. Ne xanî bû, du qulikên di nava hevdû de bûn. Deh kes ketibûn ser zikên hevdu. Odeka mezin li ser dirêjahiyê, hebû heft û li ser pahneyê jî pênc gav. Odeka din jî, ji

sisiyan du parên ya mezin bû. Dema razanê, hema li teniştên hev xwe dirêj dikirin. Car din jî cihê gavekî bi tenê mirov bibêje, valahî ne dima... Lê kêfa herkesî li cih bû. Zarokan, her ku çendî hê ne dîtibûn jî, bi navê Stanbolê şa dibûn û dê û bavên wan jî, bi şabûnên wan re şa dibûn...

Stanbolê şa dibûn û dê û bavên wan jî, bi şabûnen wan re şa dibûn...

Yê xwedî derd Dawûd bi tenê bû. Carekê ji diya xwe re gotibû:

- Dayê, dilê min qet naxwaze ez herim.

- Hiş be kurê min. Bila bavê te sah neke, gotibû diya wî.

Devê Dawûdî hew qul bûbû... Di wê demê de du-sê caran çûbû dîtina Senemê jî. Lê Senem weke nema bû. Her ku diçû, diguherî. Hezkirin ew hezkirinbû. Çi cara ku Dawûdê didît, ji kêfan, nizanîbû ew dê çi bikira... Lê car din jî tiştekî hebû! Dawûdî keys ne didît ku pirs bike. Her car hevalên Senemê dor li wan digirtin û qet bi tenê ne diman. Dema ku nêzî mala Senemê dibûn, Senemê jê xatir dixwest û diçû mala xwe. Her şev Dawûd digot:" Ez dê ev car pirs bikim." Lê ne dibû...

Wexta çûnê hatibû. Dawhûd bi dilekî şikestî ji Stanbolê derket. Berê xwe dabû bajareke nûh, bajareke nenas... Ka bê çi li peşiya Dawûd bû! Dawûd xwe berda destê dem û zemanê...

Piştî Boluyê bi çendî saetekî rê, Dawûd li qezayeke biçûk peya bû ji otobusê. Qeza li kêleka rê bû û pal dabû çiyayeke ne pir bilind. Dawûd kete nava sûkê. Avahiya ku Miftî tê de dima, di nava sûkê de bû. Bînayeke kevnare bû. Dawûd hilkişiya. Miftî di qata duduyan de bû. Dawhud li derî da. Yekî got:

- Fermo.

Dawûdî derî vekir. Mirovekî hal û bi rih rûniştî bû û bi ewraqan dileyîst.

Dawûd demekê li piya ma... Li odekê dinihêrt. Her tişt kevn û riziyayî bû. Her tiştên di nava bînayê de weke bînayê kevnarê bûn. Heta ku Miftî jî, mirov digote qey di temenê xanî de bû.

Herî dawî Miftî serê xwe ji ser ewraqan hilda, berçavka xwe rast

kir û bi mahdeke tirş got:

- Xêr e xorto?

- Navê min Dawûd e. Ez ji Konyayê dihêm.

- Dawûd... himm... herê, herê, kaxeta te hate ji me re.

Dawûd hê jî li ser piyan bû. Miftî ji serî heta pêlavan li Dawhûd mêze kir. Dawhûd xwêdan da Paşê Miftî got:

- Tu hê pir ciwan î... Çend salî yî tu?

- Nozdeh.

Mifti destê xwe di nava riha xwe yî dirêj de gerand. Dûre çenga xwe xurand. Çavên xwe biçûk kir û got:

- Here odeka din, bila muamela te çê bikin û peran bidine te. Xwedê zane vêga perên te jî tune ne.

Dawûdî serê xwe kir ber xwe:

- Têra sê-çar rojan heye.

- Tu zanî ne wisan? got Miftî, du mehan tê li vira, li ba me bimînî. Paşê tu wê herî gundê xwe...

- Herê, ez zanim.

- Nexwe vêga here bila muamelên te safî bikin. Paşê here ji xwe re cihê razanê peyda bike.

Dawûd derket û çû odeka din. Ewraqên xwe da wir. Mirovê li ser taktîlo jî, ji Dawûdî çend pirsan kir û dûre dest bi muamelê kir. Êvar nêzik bûbû. Mirovî li seeta xwe nihêrt û got:

- Heylo! Saet bûye pênc! Em îro baarin hemû kuta kin. Pêwîstî nîn e ku tu bimînî. Vêga here ji xwe re li otelekê cih bibîne. Sibe car din were. Hem perên xwe bigre û hem jî li vir rûnê, çayeke me vexwe.

Dawûd rabû. Di nava sûkê de pir neçû, otêleke çîçkî paqij dît. Odekekî li ser hesabê xwe girt û mifta odekê sitand. Alavên xwe bi cih kir. Çû dest û ruyên xwe şûşt. Li ser ciyan xwe dirêj kir û piçekî hilma xwe veda. Heyecana wî rawestiyabû. Êdi v eger tune bhû. Yan ew dê teslîm biba û herî dawî biçûya gundekî û li wê derê biriziya, yan jî ew`ê di berxwe bida, heta ji xwe re çareyekî bidîta... Lê herkesî û her tiştî ewî ber bi teslîmîyetê de dahf dida. Lê Dawûd ji

karên zor hez dikir. Ji zarotiya xwe û vir de, her dem berê xwe dida ya zor. "Ya hêsan ne marîfet e" digot... Ev car jî biryar da ku di berxwe bide, heta ku derê biçe... Dawûdî, bi dengê qure-qura zikê xwe re ji nava xewna xwe derket. Vêga tiştek bi tenê rast bû ku ew jî birçî bû... Rabhû pêlavên xwe xiste piyên xwe û li pey xwe deriyê odekê kilît kir. Her çend tiştekî hêjayî diziyê tune bû jî, ewî car din derî kontrol kir û ji otelê derket. Li hemberî otêlê restaûranteke biçûk hebû. Dawûd rast berê xwe da wê derê... şorba germ nava wî jî germ kiribû. Piştî şorbê, ji xwe re xwarineke buha xwest û bi îştah kete serê. Xem ne bû. Ew dê sibe pere bistanda. Li ber buhabûna xwarinê ne ket û piştî xarinê jî kadayîfê xwar. Zik lê nepixî bû, lê hêja bû...

*

* *

Dawûd dabhûn ber destê melayekî. Mizgefli ser kaşekî bû û pirî caran vala bû. Hew rojên înan pênce-şêst kes dihatinê... Mela ji Dawûd re baş bû. Dawûd bi kêfa xwe mabû. Ji du- sê rojan carekhê diçû û bi dengê xwe yê xirae azanê dixwend û dema ku dipirsîn, digot: "Qirika min bê xêr e..."

Roj hat ku mela jê re got:

- Dawûd, ne pêwîst e ku tu azanê bixwînî.

Dawûdî xwe feqîrokî kir:

- Çima?

- Malava, çaxa ku tu azan dixwînî, ew kesên ku têne vira jî, riyên xwe diguherînin û diçin mizgefteke din.

Dawhûd keniya. Mela jî pê re keniya û dûre destê xwe danî ser pişta Dawûd û got:

- Ji xwe re here, were... Em binihêrin ka bê çawa dibe.

Ev yek tam baor dilê Dawûdî bû. Ji xwe ewî jî tiştekî weha dixwest. Dawûd çend rojên pêşî piçekî biyanîtî kişandibû, lê bela ku qeza biçûk bû, zû hate naskirin. Otêla ku lê dima ne mezin bû û mirovekî bi tenê lê dinihêrt. Ew mirov pîr bû. Di destpêkê de, yekî karker ji xwe re girtibû, lê hatibû xapandin. Ew kesê ku girtibû, yan peran kêm nîşan dabû, yan jî, bi qastî di hesaban da şaşî çêkiribû.

Roja ku bîst kes hatiba, ewî deh kesan nîşan dida, yan jî ku çar kesan odekên li ser hesabên xwe bigirtana, ew wan çar kesan di odeyekê de nîşan dida hû ferqîyên odekan dihavête bêrîkên xwe... Rojekê, xwediyê otêlê bi fena mirovî hesiya bû û ewî qewirandibû... Navbera Dawûd û xwedyê otelê xweş bû. Carina Dawûd bi daxwaziya xwe alîkariya mirovî dikir... Rojekê, ber êvarkî, qizikeke hivdeh-hijdeh salî hate otêlê. Dawûd li odeka xwe rûniştî bû û rojnameyekî dixwend. keçikê li derî da.

- Fermo, got Dawûdî.

Derî vebû. Keçikê serê xwe dirêjî hundir kir. Dawhûd rabû ser piyan. Keçikê got:

- Gelo Dawûd tu yî?

Di dengê keçikê de telaş hebû. Dawûdî bêhtir mereq kir û got:

- Herê, ez im. Xêr e?

- Ez qiza Cewat im, xwediyê otelê.

- Ser çavan.

- Çavên te ne êşin. Bavê min ji doh û vir de di nava ciyan de ye.

- Ya! got Dawûdî, Min jî digot Mam Cewat li kû derê ma...

- Silavên wî hene ji te ra. Got, ger ku Dawûd karibe, bila îşev li otelê binihêre.

- Çawa ez baarim. Serseran.

Çavên keçikê beriqîn. Bi hezkirin li Dawûdî nihêrt. Dawûd çavên xwe revand, keçik pir delal bû. Lê Dawûdî Senem ne dida bi tu kesî... Keçikê mifta otêlê da destê Dêwûd û paşê mifteyeke biçûk jî derhanî û dirêj kir:

- Ev jî mifta qasê ye.

Dawûdî mifta biçûk jî girt. Keçikê xatir xwest û çû.

Ew şev qismet vekirî bû. Yek cihekî bi tenê vala nemabû li otelê. Dotira rojê, Dawûd rast berê xwe da Mala Mam Cewatî, xwediyê otelê. Li derî da. Keçika ku doh hatibû otelê, derî vekir û ji Dawûdî re bişirî got:

- Fermo.

- Ez hatime dîtina bavê te. Gelo çawa ye?

- Vê sibehê çû Boluyê.
- Xêr bû?
- Çû nexweşxanê.
- Wa! derbasbûyî be. Ku hat, silavên min jê re bibêjin.
Dawûdî ji bêrika xwe zerfekî derhanî û got:
- Ev jî hesabê doh e. Fermo.
keçikê zerfê girt. Dawûd kete rê.

Keçikê li pey Dawûdî nihêrt. Zerf di desta de wisan ma. Tiştekî germ ketibû nava wê. Heta vê gavê, tu kesî li wê welê tesîr nekiribû.

- Zelîxa, kî bû ew, got diya wê. Zelîxaji nava xeyalan derket û bersiv da:

- Dawûd bû. Ew xortê ku bavê min behsa wî dikir.

Mam Cewat ji Boluyê hat. Hê hilma xwe venedabû, Zelixa zerfa ku Dawûd dabûyê, dirêjî bavê xwe kir. Mam Cewat qiyametek pere deranî ji zerfê. Jimart, careke din û cerake din jimart. Dûre serê xwe hejand û got:

- Ev kurik yan pir dirûst e, yan jî piçekî kêmaqil e. Heqe cihê xwe jî xistiye ser.

Paşê Mam Cewat rabû û berê xwe da otêlê. Derî vekir. Dawûd li ber sobê diponijî. Mam Cewat hat, li ber serê Dawûdî rawestiya. Dawûdî çavên xwe vekir... Piştî lihevkêfxweşîdanê, Mam Cewatî got:

- Te di hesabê de şaşî kiriye Dawûd.

Dawûd sor bû. Mam Cewatî bi ken berdewam kir:
- Panzdeh banqinot zêde derketin.
- Na, temam bû, got Dawûdî.
- Ez napejirînim ku tu jî pere bidî. Hem tu heta nivê şevê şiyar mayî û hem jî, tu pere didî. Ev nabe.
- Alîkarî bê berjewend (menfeet) e, got Dawûdî.
- Na xêr, Ez êdî ji te pere nagirim.
- Nexwe ez jî êdî li vir namînim.

Mam Cewatî dît ku Dawûd têht e, serê xwe xurand û got:
- Ka were em li hev bikin. Aboriyate te têra otelê û zikê te nake.

Tu li nig min kar nakî? Karekî ekstira?

- Çawa yanî? got Dawûdî.

- Yanî bi heq. Tê li dewsa min rûnê û ezê jî pere bidim te.

- Herdemî?

- Herê.

- Na, got Dawûdî, ka were em bi awayekî din li hev bikin.

- Fermo, got Mam Cewatî.

- Rojên ku ez li vir bim, otel li ser min. Ew çax ez heqê razanê nadim û ji te jî tiştekî naxwazim. Lê carina ez`ê herim cihna. Ew çax ji min gazinan meke.

- Wey ser seran.

- Nexwe, hema em îşev dest bi kar dikin. Tu vêga here mala xwe.

- Baş e. De bi xatirê te.

- Oxir be.

Ev li hevhatin lihesabên herduyan jî dihat. Dawûdî xwe bi otêlê ve girê nedabû û Mam Cewatî jî karkerekî dirûst û belaş girtibû. Xem ne dibû ku carina biçûya cihna... Ma karê kê dernediket?...

Dawûd her roj nîvrokî, perên ku dixiste nava zerfê, dibir teslîm dikir. Bi piranî Zelîxa ji wî re derî vedikir û Dawûdî dida xeberdan. Zelîxayê dixwest ku bala Dawûd bikişîne Û carina bi sedemekî diçû otêlê û li ba Dawûd rûdinişt û diaxifîn... Bi rastî, kêfa Dawûd jî ji Zelîxayê re dihat. Lê çi cara ku çavên wan li hev diketin, Senem dihate bîra Dawûdî. Heyf bû, lê çare jî nîn bû... Jiyanekî bê Senemê ne gengaz bû... Gelo Senem jî bi çendî wî wefakar bû?...

*

* *

Zivistaneke dijwar destpê kiribû. Berf li çogê bû. Miftî bang Dawûdî kir. Dawhûd dizanîbû ji bo çi bû. Bi lez çû. Li derî da. Bi dengê "Fermo!" re kete hundirî. Miftî li Dawûdî nihêrt û got:

- Du mehên te kuta bûn.

- Dizanim.

- Tu wê çi çax herî gund?

- Ez ne amade me.

- Ew çi ye yanî, "ez ne amade me"?.

- ...

- Her roj gundî têne vir. Dibêjin em mela dixwazin.

- ...

Bêdengîya Dawûdî Miftî nerm kiribû. Miftî rihê xwe miz da û got:

- "Neyse." Van rojanan karên min pir in. Piştî deh rojekî din ez diçim Hecê. Di vegerê de, em dê car din li ser vê yekê biaxifin. Vêga here mizgefta taxo jêrîn. Li wê derê kursa Qur'anê heye. Alîkariya melayê wir bike. Heta ez werim, ew dê karê te ev be. Ez bi mela re peyivîme.

Dawûd ji karê xwe yê nûh dilxweş bûbû. Du mehên din jî fêde dikir. Xêra Xwedê bû. Heta vê gavê, ne bavê Dêwûd û ne jî mirovê wan hî li parlamento tu kar safî kiribûn. Di wan du mehên derbasbûyî de Dawûd du caran çûbû Stenbolê û carekê jî çûbû Enqerê. Mirovê wan î li Enqerê, riya xwe firikandibû û gotibû:

- Tu çima naxwazî bibî mela?

- Ez baarim melatiyê bikim.

- "Kurê kerê!" gotibû bavê Dawûdî, ne min ji bo ku tu bibî mela çendî ked bi te da.

Dawûdî bersiv nedabû.

- Xoce, gotibû mirovî ji bavê Dawûdî re, "Xortên vî zemanî nayêne fêhmkirin! Lê ez zanim çima welê ye."

- Çima? got Dawûdî.

- Tu ditirsî.

- Ez natirsim. Ez hê biçûk im. Melatî jî ne baor min e. Tu dikarî çareyeke bibînî, yan na?

- Çikas em binihêrin, gotibû wî mirovî, vêga tu herî. Bila bavê te bimîne.

Dawûd bi hêvî vegeriyabû Boluyê. Tu nabêjî mirovê wan î li Enqerê û bavê Dawûd bêyî Dawûdî biryar dabûn ku tiştekî nekin û Dawûd mecbûr bibe û here melatiyê bike.

*

* *

Piştî ku Miftî çû hecê, Dawûd sê-çar rojan çû qûrsê û alîkariya mela kir. Zarok hindik bûn û kurs heta nîvrokî bû. Şembî û yekşemban jî kurs tune bû. Rojên înan, jî zû hew dibû. Dawûd ji valahiyê sûd girt û rojek ji rojên înan, piştî qûrsê bi lez çû perên otelê kom kir û bir da xwediyê otelê û got:

- Ez dê îro herim Stanbolê. Roja yekşembê, ber êvarkî, ez ê werim. Mam Cewat li ser wateya "başe" de serê xwe hejand. Zelîxa ji Dawûd re derî vekir. Dawûd meşiya. Piştî çend gavan, hate bîra Dawûdî ku ji Zelîxa xatir ne xwestibû. Lê dereng mabû. Zelîxayê beriya wî got:

- Oxir be Dawûd.

Dawûd rawestiya û got:

- Bibexişîne... Bimîne di xweşiyê de.

Dawûd derket ser riya asfalt û li hêviya otobûsan rawestiya. Çend otobus derbas bûn. Tev jî tije bûn û li bayên xwe çûn. Sermê dev û lêvên Dewûd terikandibû. Destên Dawûdî di bêrîkên wî de di lerizîn. Binê piyên wî bûbûn mînanî çekûran. Û herî dawî otobusekê rawestiya û Dawhûd lê siwar bû. Lê cihê runiştinê tunebû. Bi qasê nîv saetî Dawûd li ser piyan ma. Paşê rêwîyeke peya bû. Dawûdî zû xwe gîhande dewsa wî rêwîyî, beriya ku kesên din lê rûnên.

ŞÎLMAQ

Erda Stanbolê nîv çok berf girtibû. Zivistan îsal bi xezeb bû. Ardûyên malê bi ber nemanê bûn. Zarokan xwe di binê lihêfan de germ dikirin. Dema ku sobe pêdiket, hêdî hêdî ber bi sobê ve dihatin. Ew çax piçekî germ dibûn û destên wan î bi lihêfan ve şidyayhî, sist dibûn. Paşê lihêfên xwe dihavêtin û di odeka weke tirbekî de, dest bê leyistikan dikirin. Lê herzikên wan zû dişkestin.Yan diya wan, yan jî bavê wan bi wan re şer dikir. Di şûnên xwe de rûdiniştin. Qaseke din sobe sar dibû û car din radihiştin lihêfên xwe û diçûn dewsên xwe yên berê û di cihê xwe de diponijîn.

Dawûd çawa ketibhû hundir, xebera nexweş gîhandibûne. Birayê wî yê en biçûk gotibû:

- Xwîşka me mir.

Dawhûd di cih de sar bûbû. Li diya xwe nihêrtbû. Diya wî serê xwe berra ber xwe dabû û gotibû:

- "înna lîllah we înna îleyhî racîûn."

- Çawa çêbû? gotibû Dawûdî.

- Kurê min tu dizanî ku ev bû çend meh û vir de me yek doktorekî nehişt. Kesî tu çare jê re ne dît. Vê dawîyê jî li nexweşxanê razandin. Çavên diya Dawûdî tijî hêsir bûbûn. Gotina wê nîvçe mabû. Êdî ji xwe ne pêwîst bû jî. Dawûd di cihê xwe de rûniştibû. Pişta xwe dabû dîwêr. Serê xwe xistibû nava herdû destên xwe û kûr û dûr çûbû. Xwîşka wî ya bê qeder şeş salan kişandibû. Nexweşiyeke zalim ewê di zarotiya wê de girtibû. Berê çav çûbûn, pêre ziman û herî dawî jî li mêjû dabû. Dawûd hêsirên çavên xwe paqij kiribû û gotibû:

- Ji xwe re rizgar bhû.

Ew roj kesî zêde ne peyivîbû. Dotira rojê jî bê tahm derbas bûbû. Roja yekşembê Dawûd amadekariya xwe kir. Xatir xwest û derket. Di rê de şeytaniyekî hate bîra Dawûdî. Rast berê xwe da postexanê û ji xwe re telgirafekê kişand.

*

* *

Saet heştê şevê Dawûdî deryê otêlê vekir. Mam Cewat, xwediyê otelê li ber sobê rûniştî bû. Dema ku Dawûd dît, bi kêf rabû û ewî hembêz kir û got:

- Çi hebû, çi tune bû?

Dawûd bê kêf bû. Hal mesele ji Mam Cewatî re got. Lê behsa telgirafê nekir. Hew got:

- Sibê divêt ku ez car din herim Stanbolê.

- Tu zanî, got Mam Cewat, Tu wê çi çax werî?

- Nizanim. Dibe ku ez çendekî neyêm. Tu li min bibuhure.

- Tiştekî bihurandinê tune ye bavê min. Ji xwe peymana me jî ev bû.

- Spas, got Dawûdî, Nexwe tu îşev here malê. Sibe em hev

dibînin.

Mam Cewat bêdeng rabû û çû.

Ji qûrsê bangî Dawûdî kirin. Dawûd weke ku haya wî ji tiştekî tunebe, xwe belengaz kir û çû nig cîgirê Miftî. Mirovî telgirafa di destê xwe de da Dawûd û got:

- Xwîşka te wefat kiriye. Serê te sax be.

Dawûdî deng nekir. Cîgirê Miftî rûnişt, kaxetekî nivîsî mohr kir û dirêjî Dawûdî kir û got:

- Ji te pe pênc roj îzin.

Dawûdî di otobusê de hilma xwe veda. Mirina xwîşka xwe ji xwe re bi kar anîbû. Xwêdanê di heniya Dawûdî re avêt. Cigarekê pêxist. Pişta xwe sipart hû li derve nihêrt. Berf li cihna bi qasê bejnekê bilind dibû. Her der sipî boz bû. Nava Dawûdî qeşa girt. Piyên xwe danî ser kalorhifera ku mirov fêhm ne dikir ku pêketî bû.

*

* *

Ev bûbû çend mehekê ku Dawhûd Senemê ne dîtibû. Rojekê, serê şeveqê kete rê. Diviya ku beriya nîvro xwe bigîhanda ew xwendegeha ku Senem lê dixwend. Dema ku hate ber derî, hê ji belavbûnê re nîv saet hebû. Li dora xwendegehê çend tûran avêt. Ji hêcanê çarpênc cigare li ser hev kişandibû. Ji her du- sê kêlîkan carekê li saeta xwe dinihêrt.

Di hember deriyê hewşa xwendegehê de girikeke pir biçûk hebû ku mirov digot qey bi destan hatibû çêkirin. Dawûd di şeş gavan de hilkişiya ser girik. Li ser kevireke ziwa rûnişt. Qaseke din zîlê lê da û xwendegeh belav bû. Dawûd hêdî-hêdî rabhû ser piyan. Dilê wî dikir gupe-gup. Mirov digote qey Senemê ew dîtibû û bi qastî dernediket. Li ber devê der yê xwendegehê çar-pênc xortan belavokan belav dikirin. Yên ku derdiketin belavokan digirtin. Hin ji wan kêf dikirin û hin ji wan jî tirş dibûn, lê belavokan di destên xwe de qat dikirin û dixistin bêrîkên xwe. Çavên Dawûd ji xortan û belavokan bêhtir, li deriyê bînaya xwendegehê bi xwe bû. Deryê hewşê bala wî nedikişand. Senem û çend hevalên xwe xuya bûn. Di

devê deriyê hewşê de, li wan xortên ku belavokan belav dikirin rawestiyan. Hemû li dora Senemê bi hurmet rêz bûbûn û ji teva bêhtir, dengê Senemê bilind dibû. Carekê bala Senemê bi alê Dawûdî ve ket. Destê xwe ji Dawûdî re bilind kir. Dawûd berxwar bû. Hevalên Senem berê li Dawûd nihêrtin û dûre li Senemê. Senem piçekî sor bû û got:

- Hevalê min ê zaroktiyê ye.

Dawûdî gîhand wan.

- Hevalino, ev Dawûd e, got Senemê evana jî Xurşîd, Demîr, Ulwî, Kurşad…

Yeko-yeko destê Dawûdî girtin û hejandin. Paşê yekî ji wan belavokekî xiste destê Dawûdî. Dawûdî belavokê girt. Bala wî li Senem bû. Senem sar radiwestiya. Hevalên wê ji wan qetiyan û çûn. Lê meşa wan pir giran bû. Weke ku ne dixwestin ji Senemê dûr bikevin.

- Min pir bêriya te kiribû, got Dawûdî.

- !...

- Tu çima napeyivî, çi qewimiye Senem?

- Ez guherîme Dawûd. Tu qet nabînî.

- Bêlê, ez dibînim. Ev bû salek û vir de, her ku diçe, tu dûr dikevî.

- Heta beriya salekê min hê zarotî ji serxwe ne havêtibû.

- Yanî? got Dawûdî.

- Yanî, em roj bi roj mezin dibin. Jiyana me vala bû heta doh.

Senemê axeftina xwe birrî û li Dawûd nihêrt. Dawûd li çavên Senem dinihêrt, ka ew ê çi bigota, mereq dikir.

- Tu li min guhdarî dikî, ne wisan? got Senemê.

- Belê.

Senemê li dora xwe nihêrt û domand:

- Ez êdî ne weke berê serbixwe me. Doh tu bi tenê hebû di dilê min de…

- Ya îro?

- Niha doza min, hevalên min û xebata ji bona welatê min jî hene.

- Nexwe, got Dawûdî, Tu wê yekî ji me bikî bi qurbana yê din. Çika bibêje hela, çi ye doza te, kî ne hevalên te?

- Ma qey, got Senem, Ma qey haya te ji dinyayê tune ye gelo?

Dawûdî xwe tahl kir û got:

- Çawa tune ye, Senem! Yê min jî jiyaneke min heye. Kes ne giya ye... Madem me vekir, divêt ku em hevdu baş binasin vêga.

- Baş e. Ger ku tu dixwazî min nas bikî, doza min, hevalên min hemû di wê belavokê de ne.

- Belavok? got Dawûdî.

- Erê, belavok. Ka te çi kir jê?

Dawûdî destê xwe ji bêrîka şalê xwe derhanî û xiste bêrîka paltoya xwe. Ew belavoka ku xistibûn destê wî, hê nevekirî bû. Dawûdî derfet ne dîbû ku binihêrê ka bê çi bû. Dawûdî belavokê derhanî û bi herdû destan girt û xwend. Belavokê bi tirkî digot: "Ulkudaşlar! Bu cennet vatanimizi bolmek, parçalamak isteyenlere, ulkemizî Moskof çizmelerine çignetmek isteyenlere, dinsiz, imansiz vatan hainlerine aman vermeyelim. Dun bir ulkudaşimiz şehit duştu bu hainlerin kurşunlariyla. Kanini yerde birakmayacagiz. Bire karşilik on can alacagiz!"

Belavokê bi kurtî derheqê mirovên pêşverû, şoreşgêr û kurdan de tiştek nema bû ku rêz ne kiribû. Mêjûyê Dawûdî çelqiya. Lê belavokê heta dawî xwend. Belavok bi çend siloganên faşîst kuta dibû.

Çavên Senemê li Dawûdî bûn. Her halê Dawûdî mereq dikir. Dawûd ji hêrsan xwe dixwar. Belavok hew bûbhû, lê Dawûd hê jî lê dinihêrt. Beriya ku tiştekî bibêje, xwest ku xwe bixe binê kontrolê. Tiştên ku Dawûd difikirî, herfo-herfo rêz bûn û di ber çavên Dawûdî re derbas bûn: "Erê, Erê... Hîtlerê tirkan di postê guran de derketibû û nazîstên tirkan jî di eyarên kûçikan de dabûn pey. Hewte-hewtên wan bûn. Di nava wan kûçikan de kuçikeke porzer û çav kesk jî hebû. Ew jî, ji Senemê pê ve ne kesekî din bû..." Dawûdî serê xwe jî ser belavokê rakir. Li Senemê pê nihêrt. Senem dimizicî. Lê carina mirov û carina jî, bi çar pî xuya dibû ji Dawûd re. Ew xweşikbûn, ew

delal bûn bi carek ve wenda bûbû. Sînga Dawûd teng bû.

- Rêça te ne tu reç e Senem, got Dawûdî.

Senem li hêviya tiştekî xweş bû. Xeberdana Dawûdî pê pir tahl hat û ji delava wî dengê nerm î xweş, dengekî hişk î mînanî yên qereçiyan derket:

- Min jibîr kiribû ku tu jî kurd î. Hûn kurd hemû xayîn in, komunîst in!

- Xwe pîs meke Senem!

- Tu çi dibêjhîbênamûs?

- Bênamûs tu yî, got Dawûdî û belavoka di destê xwe de perçe perçe kir û avêt ser çavên Senemê. Senemê tif kir ser rûyê Dawûdî û weke cehdûkaran kire qîje-qîj:

- Xurşît, Kurşat!

Hevalên Senemê gîha bûn wî seriyê kolanê. Bi dengê Senemê re rawestiyan. senemê berdewam kir:

- Werin vî komunîstî ji holê rakin...

Çavên Dawûdî stêrk havêtin. Destê xwe rakir û heta wê hat gote ziring û şîlmaqekî danî ser rûyê Senemê. Destê Senemê hişk bi paltoyê Dawûdî ve zelixqandî, bi şîlmaqê re bi hişkî kişiya. Bişkofkekê paltoya Dawûd di desta de, Senem bi serdevkî kumişî erda şil. Hevalên Senemê bi banzdan berên xwe dane wan. Yekî ji hevalên Senemê destekî xwe avêt paş qûna xwe. Dawûd careke din li Senemê nihêrt û got:

- Tif ji te ra, faşîst!

Û Dawûdî berê xwe da riya asfalt. Çendî sed gavan mesafe hebû di navbera Dawûd û hevalên Senemê de. Dawûd ji şîşên kêleka rê zû rizgar bû û bi lez derbasî wî aliyê rê bû. Yên mayîn hê nûh hatibûn ber şişên vî aliyê rê û hingê navgîn (wesayît) derbas dibûn, baarîbûn xwe bigihînin Dawûd. Dawûdî hem banz dida û hem jî destên xwe ji her navgînî re radikir. Roj roja man û nemanê bû. Navgîn tev li bayên xwe diçûn. Taksîyekê xûya bû. Berê li Dawûdî ranewesta. Dûre ajo li wî aliyê rê nihêrt û dît ku çend mirovên bi çek, lez dikin xwe bigihînin ewî xortê ku destên xwe jê re hejandibû. Taksî

rawestiya. Anarya kir. Dawûd zû xwe gîhandê. Ew çax bû terqîniyên debançan. Dawûd xwe avêt nava taksiyê. Ajo pê li gazê kir. Taksî bi derîkî vekirî çendî nîv kîlometre çû. Dûre Dawûdî derî girt. Dilê wî dikira rawestiya. Ajoyî cigarekê dirêjî Dawûdî kir:

- Çi karê te heye li van deranan xorto?

- !...

- Neyse, ez vê mehellê baş dinasim. Tijî kûçik e.

Dawûdî hilmekî ji cixarê kişand. Daxanê di nava xwe de girt û paşê piçik piçik berda. Ajo berdewam kir:

- Baş e, baş e ne peyive, lê bibêje tu dixwazî herî ku derê.

- Hema tu min li ku derê datînî deyne. Ev der jî baş e, got Dawûdî.

- Na, nabe, got ajoyî. Dibe ku wan jî erebekî girtibin û li pey me bin. Hem min qenciyekê kir, bila nîvçe nemîne.

- Tu bi xwe diçî kû derê? got Dawûdî ev car.

- Ez dê derbasî wî aliyî bibim.

- Baş e, riya me yek e. Ez diçûm Beşîktaşê.

- Şansê te heye, got ajo, Ez jî diçim Ortakoy. Li ser riya min e

Li ser pira mezin ku Dawûdî beriya salan resimê wê di nava pirtûka xwe de dîtibû û ketibû nava xeyalan, bêdengiyekê çê bû. Dawûd li ava ku çendî şêst metreyan di binê pirê de şîn dikir, nihêrt. Çend sandalên biçûk û gemiyeke mezin derbas dibûn. Êdî Dawûd baş sakîn bûbû:

- Hesabeke min î biçûk hebû li Kuçukyali. Ev roj wê di jiyana min î nûh de ciheke hêja bigire.

Ajoyî serê xwe hejand:

- Nebî, nebî tu di jiyana xwe ya nûh de, car din li wan deranan û bi vî halî derkevî pêşiya min!

Bi hev re keniyan. Dawûdî bersiv da:

- Ku car din biqewime, ma tu li min ranawestî?

- Ne carek, sed caran be, ezê rawestim, lê bila neqewime.

Dawûdî ji ajoyî pir hez kiribû:

- Navê min Dawûd e.

- Navê te ne girîng e, got ajo Lê ez dizanim ku tu perçek ji min î.

- Dibe ku em careke din û di merceke din de li hevdu rast werin, got Dawûdî.

- Dibe xorto, got ajoyî, Dibe ku di meşekî de, dibe ku di şerekî de û belku jhî di mirinekî de. Lê jibîr meke, em her gav, li her derê ne. Her tim serbilind û her tim bê tirs be!

Dawûdî ne dixwest ku yek herfekî bi tenê bi revîne, çaxa ku ew mirovê zane dipeyivî. Her gotineke wî weke pirtûkekê bû. Hê pir pirtûk hebûn li ba ajoyî lê rê hew bûbû. Hatibûn Beşîktaşê. Dawûdî bi cavên deyndar li ajoyî nihêrt. Ajoyî çavên xwe revand û got:

- Ev jiyan e xorto, here, ji te ra oxir be. Dibe ku tu jî rojekê bi kêrî camêrekî weke xwe werî. Ew çax bizanibe ku ew camêr ez im...

Û ajo taksiya xwe ajot û çû. Dawûdî destê xwe rakir û heta taksî ji ber çavan winda bû, dananî.

Dawûd gelekî birçî bûbû. Ji xwe re hambûrgerekî û dewekî kirî. Paşê çû kêleka behrê. Dûr nihêrt û xeyala pênc- şeş kûçikan hatin ber çavên wî. Di nava wan kûçikan de yekî zerik î çav kesk jî hebû. Kûçikan bi hev re dikirin hewte-hewt. Lêvên Dawûdî ji ser hev rabûn û di ber xwe de got:

- Oxir be Senem!...

## DERAJOTIN

Ev çend sal û vir de, Stanbol zivistaneke wisan nedîbû. Berf, bager, qiyamet... Bi sedhezaran mirov perîşan bûbûn. Otomobîlên li ser riyan weke kosîyan diçûn. Carina dişemitîn û diman. Rêwiyên reben ne siwar bûn, hemal bûn. Bi piranî, karên wan dahfdanên otobusan bûn.

Ne Stanbol bi tenê, her der weha bû. Heta ku jê jî xirabtir... Roj tune bû ku telewîzyon, yan jî radîo behsa otomobîlên qelibandî, yan jî lihevketî ne dikirin. Her roj, bê hejmar mirov di van bûyeran de ji canên xwe dibûn.

Berfa li derve, qidûmên Dawûd şikenandibû. Mabû rojek wî bi tenê li Stanbolê. Ku Stanbûl welê ba, kî dizane bê nûha halê Boluyê

çilo bû! Dawûd di binê lihêfê de duta bûbû. Ji alekî ve kula Senemê û ji alekî din ve jî, ev serma, ev zivistana bê oxir pişta Dawûd xûz kiribû. Her ku çendî dibêjin: "Jiyan berdewam dike!.." jî her seknekî û her birêveçûneke nûh pir tiştan bi xwe re dibir û dihanî. Her rawestanek weke mirineke biçûk e û her birêveçûneke nûh, ji nûh ve çêbûnekî bû. Bi jan, bi axîn û ofîn... Heta ku dergûş radibe ser piyan... û di her çêbûneke nûh de perçeyek kêm; dil, gurçik, navdil, pişik, çav û dawî jî mêjû... yeko-yeko winda dibûn. Lê çi bimaya, car din jî fêyde bû... Bi zordana diya Dawûdî, bavê Dawûdî ji nexweşxaneke mezin, ji bo Dawûdî, ji doktorekî naskirî bi minnet û bi rica bîst rojan rapor girt. Ev yek, av reşandibû ser kul û derdê Dawûd. Lê car din jî, roj bi jimartin bûn. Ha îro, ha sibe, ew`ê hewbibana... Ya dûre? Her kes, her tişt bêdeng bû. Şevan rojan xwarin... Şevên dirêj, şevên bê xew... Xewên bê tahm, xewên tijîkabûs... Yek xewnekî Dawûd î bê şaşik û bê tizbî tune bû. Carina mirî dihatin ber çavên Dawûdî... Kevirên ku miriyan li ser duşûştin, diberiqîn... Dawûd vediciniqî û radibû... Lê dîsan jî, ne şaşik û tizbî, ne mirî û kevirê şûştinê bûn tirsa Dawûd. Li wî welatê sar ku Dawûd biçûya gundeke bê rê, ew dê bi salan li wir e bimaya weke girtiyan. Ji xwe heft salên xwe yên zarotî û xortanî di nava hev de, li xwendegeha ku ji girtîgehê xirabtir bû, derbas kiribû û heft salên din jî, ji mirinê xirabtir bûn... Ne xwendin dima û ne jî pêşeroj... Jiyaneke zorakî, jiyaneke bê dil ji mirinê pêştir ne tiştekî din bû... Dema ku Dawûd duwanzdeh salî bû, bi daxwaziya bavê xwe û piçekî jî, bi mereqa dîtinaya bajareke nûh û mezin, ketibû gorê. Çendîn xwe lebitandibû, kûrtir çûbû di nava gorê de... Heta qirikê di nava axê de mabû. Vê gavê jî, ew seriyê ku li derve mabû jî, hêdî hêdî dişemitî nava axê... Berxwedan heta çi çax û heta kû derê bû?.. Lê car din jî berxwedan jiyan bi xwe bû...

*

* *

Di destpêka meha adarê de Dawûd kete rê. Nîvrokî gîha Gerede, ew qeza biçûk î şêst kîlometre ji boluyê wê de. Ew cihê ku li wê derê azan xwendibû, Mam Cewat û Zelîxayê nas kiribû…

Taveke bê ronahî dabû berfa li ser çogê. Diya Dawûdî goreke rîs î sitûr dabû Dawûd. Pêlavên Dawûdî hem teng bûn û hem jî bûn… Çend qirûşekî perên Dawûdî hebûn. Dema ku berê xwe dabû Stanbolê, hizir kiribû ku ji xwe re qapûteke germ û potinekî bistîne. Lê rewşa bavê Dawûd nebaş bû. Çi perên wî hebû, dabû bavê xwe. Roja vegerê jî, bavê wî, heqê bilêta wî, ji hin mirovan bi deyn standibû. Ew dê Dawûd çawa bigota, Qapût!, ew ê çawa bigota, Pêlav! Çaxa ku gorên rîs î ku diya wî dabûye, kişandibû piyên xwe, ew dê çawa bigota "Bi van goreyan piyên min naçin pêlavan!"… Zor dabû xwe. Sor bûbû, lê pêlavan li lingên xwe edilandibû… Milên xwe jî di paltoyê ku astarên wê zîrtol-zîrtolî bûn re kiribû û hew gotibû "De vêga bi xatirê we!"... Dê jî, bav jî dîtibûn halê Dawûdî. Bavê wî tûka xwe yî nivbelxem di qirika xwe ya pûç re bi zor derbas kiribû. Diya Dawûd jî bi çavan av reşandibû li pey Dawûdî. Hew zarok bi kêf bûn û ew ne haydar bûn ji jiyanê. Hê Dawûd pêlikan xilas ne kiribû, zarokan li ser şekirê dawî û qûtîka vala dest bi şer kiribûn. En biçûkê wan, bi girîn û bi alîkariya diya xwe, bûbû xwediyê şekir û qutîka vala di destên yên mayîn de perçe-werçe bûbû.

Birêveçûna Stanbolê û wexma otobusê piyên Dawûdî werimandibûn. Pêlavan êdî digotin "Em ew çend zextê naperjirînin. Yan gorên xwe derxîne û yan jî çarekî din bibîne. Yan na em nameşin…" Dawûdî xwe avêt pêlavan, lê pêlav ketibûn eksê. Dawûdî piyên xwe ji pêlavan derhanî û hêdî pêl pahniyên pêlavan kir. Pahniyên pêlavan baş kupand û bi rê ve çû. Di wê berf û qiyametê de, kesî ne dîtibû ku mirov weke ku di orta havînê de be, pêlavên xwe bike weke şimikan û bi rê ve here. Dawûd ji şerman xwe mînanî seqetan kir. Pahniyên pêlavan baş kupand û bi rê ve çû. Di wê berf û qiyametê de, kesî ne dîtibû ku mirov weke ku di orta havînê de be, pêlavhen xwe bike weke şimikan û bi rê ve here.

Dawûd ji şerman xwe mînanî seqetan kir. Çaxa ku li pêjnekê rast dihat, xwe di kuland û bi wî awayî jê derbas dibû. Baş bû ku bala kesî ne li wî bû. Li ber deriyê otelê hilma xwe veda. Mifta xwe deranî û li derî ceriband. Lê derî nekilîtkirî bû. Dahf da. Derî li ser piştê vebû.

Zelîxayê li dewsa bavê xwe rûniştî bû. Bi dengê derî re, rabûbû ser piyan. Dawûd û Zelîxa yî germ, destê Dawûdî sar î nûh ji derve hatî germ kir. Dawûd pirsî:

Zelîxa diberiqî. Ev bûbû çend meh hev dinasîn, lê ev car weke ku nûh laqê hev dihatin wisa bê liv mabûn. Zelîxayê bi dengekî lerzok got:

- Tu bi xêr hatî.

- Tu di nava xêre de bî, got Dawûdî. Destên hev girtin û hejandin. Dawûd pirsî:

- Mam Cewat li ku derê ye?

- Nexweş e car din. Di nava ciyan de ye. Ev bû çend roj em perîşan in. Kes tune bû ku li otelê jî binihêre. Her roj, heta êvaran ez dimam û evaran jî, bi rica û bi minet mermalekî me dima. Ew jî, bi heq û binazî. Baş e ku tu hatî Dawûd.

Zelîxayê serê xwe kir ber xwe. Bêdengiyekê çêbû. Wê gavê Zelîxa pêlavên Dawûdî dît. Dawûdî pir şerm kir û got:

- Piyên min werimîne. Doktoran ji min re gotin, "Divête ku tu çendakî pê li pahniyên pêlavan bikî, çare tune ye..."

Paşê çavên Dawûdî li yên Zelîxayê geriyan. Dawûdî dixwest ku Zelîxayê ji wî bawer bike. Zelîxa jî, bi gumanekê din li Dawûdî dinihêrt. Ewê jî dixwest ku ev xortê ku çendî lê tesîr kiribû, piçekî pê ve têkildar bibe. Bi kurtî, dixwest ku Dawûd ji wê hez bike. Dawûd kî bû, ji kû derê bû, çi dikir? Ji Zelîxayê re ne mihîm bû...

- Zelîxa, got Dawûdî, Here malê. Ji bavê xwe re jî bibêje va ye Dawûd hat. Bila êdî mereqan meke.

- Vêga tu birçî yî, got Zelîxayê, Ez herim ji te re xwarinê bînim.

- Na, hîç xwe ne westîne. Lê ez pir westiya me. Ezê piçekî razêm.

Zelîxa rabû û çû. Dawûd li pey Zelîxayê nihêrt… Delal bû, bi aqil bû û ji wî jî hez dikir, wisan dihate xuya û hezkirina xwe jî, venedişart. Yê ku direviya Dawûd bû. Reva wî ya ji ber Zelîxayê, ji rûyê Senemê bû… Ew Senema ku bi salan ewî bi xwe ve girêdabû hû wê rojê bi ewî dabû fêhmkirin ku ji dilgirtinê, ji hezkirinê jî girîngtir hin tişt hebûn.

Dawûd di nava ciyan de gevizî. Dûre qapaxên çavên wî giran bûn û di xewê re çû.

*

* *

Mifthî ji zû ve hatibû û weke guran li Dawûdî digeriya. Rapora Dawûdî vê dawiyê, Miftî aciz kiribû. Piştî hatina Dawûdî, ji wî re xeber şand. Dawûd kete rê. Êdî tu çare nemabû. Hatibûn dawîyê. Yan dişikest, yan jî ava dibû.

Deriyê odeka ku Miftî lê bû, li ser piştê vekirî bû. Pişta Miftî li derî bû. Di pencerê re li berfê dinihêrt. Bi destekhî jî rihê xwe yî dirêj difirikand. Dawûd li derî da û kete hundir. Miftî berê xwe da Dawûdî:

- Tu amade yî, ne wisa?
- Ji çi re? got Dawûdî.
- Çawa ji çi re? Ji süyina gund re, gund!
- Hêja qûrsa kur`Qwranê hew ne bûye.
- Bi qîra qûrsê ke…

Dawûd bi çavên vala li pencerê nihêrt. Derve sipî boz bû. Çavên wî qeşa girtin. Tewra Miftî ya dawî jî, bûbû cẹmed û ketibû serê Dawûdî… Dawûdî bersiva Miftî neda. Miftî berdewam kir:

- Divête ku tu sibê herî gundê xwe!
- !!...
- Ez ji te re dibêjim. Ma deng nayê te?
- Belê, got Dawûdî bi dengekî tûnd.
- Êêê?...
- Çendekî din jî, ji min re destûre bidî… Berf e, sar e. Vê qiyametê zor e.

- Na, got Miftî bi hêrs, Sibê zû bikeve rê!

Nava mêjiyhe Dawûd çelqiya:

- Ez naçim...!

- Te got çi?

- Min got ez naçim!

Dawûd cara pêşî bi dengekî nizim û bêqerar gotibû "Ez naçim", lê cara dawî sakin û bilind bû dengê Dawûdî. Miftî hate xezebê:

- Osman! Osman! got bi dengekî bilind. Katib bi banzdan hat:

- Fermo.

- Makîna xwe bîne zû. Ev bê terbiye li ber min radibe.

Dawhûd cit radiwestiya û devê xwe kilît kiribû. Tiştek ava ne bûbû. Qedeh şikestibû û av rijiyabû. Osman, katibê Miftî, daktîlo hanî. Kaxetekî kişandê û tiştên ku Miftî digot, herfo-herfo nivîsî. Dawûd ceza xwaribû. Kexeta cezê xwend û îmze kir.

- Tu bi vêya rizgar nabî, got miftî, Ji te re sê roj. Ku tu hê neçûbe gundê xwe û dest bi melatiyê ne kiribe, ew dê tiştên xirabtir çê bibin…

- Tu bi kêfa xwe yî, got Dawûdî. Ez piştî sê rojên din jî, piştî sîh rojên din jî naçim.

- Wa! Nexwe em xwe beradayî nedin bendî te. Ez vêga ji Enqenê re agahê dişînim.

- !!...

Binivîse, got Miftî ji Osmanî re.

Dawûd derxistibûn salonê. Dengê şeqe-şeqa tûşên daktîlo, gohên Dawûd qul dikirin. Dawûd weke pir caran, dîsan destên xwe xiste bêrîkên şalê xwe û hevalê xwe yê demên teng derhanî. Niftika xwe derxist û hevalê xwe pêxist. Dûman di dev û pozên Dawûdî re derket û di nava salona fireh de bi telaş belav bû. Carina dengê Miftî bilind dibû. Ew çax Dawûd fêhm dikir ku katibê kerr gotinên Miftî pê dide dubarekirin.

Pir nema, Miftî li pêş, katib li paş derketin. Daktîlo û çend kaxetên vala di ber sînga katib de bûn. Miftî qet li Dawûdî ne nihêrt û li bayê xwe derbas bû û çû. Katib qasekî li pey Miftî nihêrt. Serê

xwe vî alî, wî alî hejand. Paşê bi dengekî nerm ji Dawûdî re got:

- Miftî çû xwe amade bike. Ew dê sibê here Enqerê. Heta ku ev kar safî bibe, tê her roj werî vir û herî.

- Çawa yanî? got Dawûdî.

- Her sibe, ji saet heştan heta pêncê êvarê.

Osman, katibê Miftî, kete odeka xwe.

- Ya vêga ezê çi bikim? got Dawûdî û li pey Osmanî ew jî kete odekê Osman li saeta xwe mêze kir û got:

- Tu vêga serbest î.

*

* *

Ew şev Dawûd raneza. Ji kerban dikira bibeheciya. Li salona otelê, li ber sobê û li ser kursiyeke hişk kir sibe.

Miftî serê şeveqê ketibû riya Enqerê. Ew roj în bû. Dawûdî biryar da ku piştî mesaîye here Stenbolê. Dibû ku careke din keys nedîta û çem û çem biçûya. Dawûdî bi ya xwe kir. Nîvrokî Dawûd çû mala Zelîxayê û bê mazeret, niyeta xwe ji bavê Zelîxayê re got. Mam Cewat, bavê Zelîxa, ji Dawûd re keniya û got:

- Ji xwe ez jî çend zemane, li malim. Ewê bibe sedemekî derketina derve ji min re… Qet mereqan meke, oxir be…

Zelîxayê bi kelegirînî pirs, li Dawûdî dinihêrt. Ji mahdê Dawûdî tahl, Zelîxa fêhm dikir ku tiştekî girîng hebû. Lê newêrîbû ku bipirse " Çima tu diçî? Ma mirov di nava pênc rojan de car din dikeve wê riya dûr î sar?"

*

* *

Beriya ku Dawûd ji otobûsê peya bibe, gorên rîs î stûr yên ku diya wî dabûyê, ji tûrê xwe deranî. Gorên teba şemitand û gorên rîs kişande piyên xwe. Kir û ne kir piyên wî neçûn pêlavan. Mecbûr ma û careke din pahniyên pêlavan kupand.

Nîvê şevê Dawûdî li derî da. Dengê diya wî bilind bû:

- Ew kî ye?

Xwendegeh hate bîra Dawûdî. Her tim, dema ku ji Edenê diçhû

mal û destê şeveqan li derî dida, ev deng bilind dibû. Ew dengê zelal î germ. Vega ji ew deng bû. Car din zelal, car din germ.

- Ezim, got Dawûdî.

Derî zû vebû. Diya wî kurê xwe hembêz kir:

- Xêr e kurê min, vê saetê û evçend zû?

- Qet mepirse… Ev car temam e. Min û Miftî me şer kir. İro Miftî çû Enqerê…

- Hiişş!... Çima lawo?

Dawûd hal-mesele ji diya xwe re got. Navê xewê di çavên Diya Dawûd de nema bû:

- Qeda li wan bikeve. Ez duşembê bavê te bi rê dikim, dişînim. Enqerê. Ka ewî mirovê parlamento çi kir, bila pirs bike. Tev mînanî hev in. Heta ku rayên me distînin, xwe diçirînin. Xwe dikin ax. Paşê me jibîr dikin. Belqitiyo meriv e jî, bi serde.

- Lê got Dawûdî, Dema ku me dibîne, hêja tê bîra wî ku sozekî dabû… Dayê ez rica dikim tu ji bavê min re tiştekî ne bêjî. Piştî ku ez çûm, êdî tu bi kêfa xwe yî.

- Nabe kurê min. Ma ew ê ne bêje "Tu hê doh ji vir çû, xêr e tu car din hatiyî?"

- Êrê ya, ew jî heye, got Dawûdî.

Diya Dawûdî ji alîyekî ve ji Dawûdî re xwarin çê dikir û ji alek din ve jî, jê re doşek û lihêfê datanî, rast dikir. Niçe-niça wê bû. Dawûd dûsê pariyan xwar. Di ber re jî dihizirî. Û carekê beriqî Dawûd:

- Ez dê ji bavê xwe re bibêjim ku min xewneke pir xirab dît û min ne qedand û ez hatim…

- Hah, mala te ava, got diya wî. Ev baş bû bi rastî.

*

* *

Weke her car, Dawûd roja yekşembê ji mal derket. Pîlana wî û diya wî baş çûbû serî. Bavê xwe dabû bawerkirin. Û niha çi dibû, êdî ne çendî muhîm bû. Bila bavê wî ha xwe li erdê bixista, fêyde tune bû, herî dawî riya wî Enqerê bû. Diya Dawûd dibû mûçing û bi laşê bavê wî ve diket.

*
* *

Roja duşembê piştî nîvro, mirovekî hat ji Enqerê. Bangî Dawûd kirin. İfada Dawûdî dûvdirêj girtin. Dawûd ji her car sakintir bû. Hemû bersîvên xwe kurt û saxlem dida. Xwe nigivaşt. Tu poşmanî nîşan neda û ji ya xwe daneket xwarê... Pir pir ew ê wî ji kar bihavêtana. Tişkî winda kirinê tunebû. İfadegirtina Dawûdî qediya. Wî mirovî ewraqên ku dabû hev, teva kom kir û car din çû Enqerê. Êdî rojên Dawûdî bi jimar bûn.

*
* *

Meha adarê hew bûbû. Qeweta meha nîsanê jî têr ne kiribû ku berfê ji erdê rake. Her roj Dawûd diçû ba Osmên, katibê Miftî, rûdinişt û êvarkî radibû berê xwe dida otêlê. Tu kar û barê wî tune bû. Wî li ber çav digirtin, hew... Ew jî zilmeke din bû. Rojê heşt saetan ruyê Miftî yî tirş didît û li fişe-fişa pozê katib guhdarî dikir.

Di ser îfada dawî re panzdeh roj derbas bûbûn. Dawûd car din deriyê odeka katibê Miftî vekir û bêdeng derbas bû. Katib ne li cihê xwe bû. Ji odeka Miftî deng dihatin. Pir nema daktîlo dest bi kar kir. Li derve baran dihat. Wisan dihat ku mirov digote qey ew ê tofan rabe.

Xurîniya asîmanan bû. Carina birûskan dengê daqtîlo difetisandin. Birûsk wekî fîşekan diçûn li hedefên xwe didan û paşê bêdengiyekî çê dibû. Dûre car din şeqe-şeqa diktîlo destpê dikir... Baranê cihê xwe ji zîpikan re hiştibû. Zîpikên bi qasê nokan, bi xezeb li caman didan. Dawûd kursîka xwe ber bi sobê de kişand. Destên xwe germ kir û firikand û got: "Êê... Dawûd, dibe ku ev cara dawî be, xwe baş germ bike..." ... Singa Dawûdî weke pêlên behrê bilind bû û daket.

Deriyê odeka Miftî vebû. Osmên serê xwe dirêj kir û got:

- Dawûd!.

Dawûd ji cih pekiya, rabû. Osmanî bi nîşanên serî got, were. Dawûd di deriyê vekirî re kete odeka Miftî. Miftî li cihê xwe rûniştî bû û li kaxetên li ser masê dinihêrt. Pozîsyona Miftî û Dawûd weke

roja pêşî bû. Miftî bi kaxetan mijûl bû car din û Dawûd li ser piyan radiwestiya. Miftî di binê çavan re li Dawûdî nihêrt. Berçavka wî şemitî bû ser pozê wî yê mezin.

- Rûnê, got Miftî ji Dawûdî re.

Dawûdî xwe bera xwar da. Miftî hin ewraqên din jî kişand ber xwe. Dûvdirêj li wan mêyze kir. Paşê hemûyan bi hev re îmze kir. Pişta xwe sipart milkursiya xwe ya ku dizîvirî. Li Dawûdî nihêrt. Dawûdî jî bêdeng li Miftî dinihêrt. Kifş bû ku tiştek hebû. Miftî berçavka xwe rast kir û got:

- Herî dawî em îro ji hev rizgar dibin.

Dawûdî çavên xwe ji Miftî ne qetand.

- Fermo, ez guhdarî dikim.

- Eva ji Enqerê hatiye, got Miftî û kaxetê dirêjî Dawûdî kir. Dawûd nêzîkî masê bû. Destê xwe avêtê û kaxetê girt hû xwend. Baor biryara mirovên li Enqerê, di nava panzdeh rojan de, diviya ku Dawûd biçûya Qarakose. Bi naveke din Agiyê... Yanî bi kurdî, Agirî. Bajarê Kurdistanê. Ew bajarê ku bi çiyayê xwe bi nav û deng bû. Lê mixabin, Dawûd ne diçû ku li wî bajarî bigere... Ev nefîkirin bû... Simbêlên Dawûdî nûh derketî xwîdan dan. Heniya wî sincirî... Lê Dawûd xwe zû rast kir û kaxetê danî ser masê û got:

- Çi pêwîst be, em zû safî bikin.

Miftî mizicî:

- Osman!

Osman hat û bi çend kaxetan re li ba Dawûdî rawestiya. Osman wan kaxetan yeko-yeko danî ber Dawûd û pê da îmzekirin. Paşê Osman hin ji wan kaxetan xiste nava zerfeke zer î mezin û zerfê teslîmî Dawûdî kir. Dawûd rabû.

- Oxir be, got Miftî.

Dawûdî bersiv neda. Ber bi derî de çû û deriyê vekirî bi hişkayhu li pey xwe kişand. Derî gote req...

*

* *

Dawûdî alavên xwe kom kir. Deriyê otelê kilît kir û cara dawî kete riya mala Zelîxayê. Ev car bavê Zelîxayê derî vekir. Dema ku Mam Cewat, bavê Zelîxayê, Dawûdî bi tev baholê ve dît, şaş ma.

Bi zor bi çepilên Dawûdî girt û wî kişkişand û bir hundir.

- Zelîxa, keça min, ji me ra çayekê deyne ser, got Mam Cewatî. Çavên Zelîxayê sor bûbûn. Çû av danî ser û hat ber deriyê odekê. Dawûd bûyerê ji serî heta binî ji wan re got. Piştî çayê destûra wan xwest. Mam Cewat rabû. Lê Zelîxayê got:

- Bavo, bihêle ez Dawûdî derbas bikim. Tu dê serma bigirhî.

- Tu zanî keça min, got bavê Zelîxayê. Paşê Dawûdî himbêz kir hû got:

- Riya te vekirî be Dawûd.

Dawûdî bersiv neda. Serê xwe hejand û bahola xwe ya li ber derî hilda. Zelîxayê ji Dawûdî re derî vekir û bi wî re daket heta hewşê. Dawûd û Zelîxa bi destên hevdû girtin. Zelîxa diricifî. Dawûd li Zelîxa nihêrt. Hêsir di çavên Zelîxayê de kom bûbûn.

- Ez ne layiq im, got Dawûdî.

Hêsirên Zelîxayê berxwar bhûn. Zelîxayê destê Dawûdî bernedida. Dawûd jî hate ber girîn. Berê xwe guherî. Dengê wî bi zor derket.

- Eva jiyan e, Zelîxa. Weke ku me hev qet nas ne kiriben…

Axaftina Dawûdî nîvçe mabû.

- Ne weha hêsan e Dawûd, got Zelîxayê.

- Na, lê ne mirin e jî.

Destê Zelîxayê sist bû. Destê Dawûdî filitî. Dawûd bi re ve çû. Zelîxa pêkêt hêsirên xwe paqij kir û got:

- Riya te vekirî be Dawûd. Ku rojekê tu di van deran re derbas bibî, min bîne bîra xwe!

Dawûd rawestiya. Careke din li Zelîxayê nihêrt. Tûka xwe yî bi hêsiran re tevlîhev bi zor daqurtand û bi gavên fireh di deriyê hewşê re derket.

*Dawiya cildê yekem.*

# WeşanênPêrî

## PİRTÛKÊN KURDÎ

- **Dîwaro** tera dibêm. Bûkê tu guhdar be / *Celîlê Celîl...*
- **Autobiyografya** / *Abdurrezak Bedirxan*
- **Bîranînên** Şer ( Rojaneya Kuba) / *Ernesto Che Guevara.*
- **Hêlîn** / *Mahmud Baksi.....*
- **Nameya Dijle**/ *Faysal Dağlı..*
- **Filitê Quto** / Salihê Kevirbiri
- **Despêke Rêzimana Kurdî** / Haydar Diljen
- **Xewnên Pînekirî**/ /*Medeni Ferho.*
- **Marê Di Tur de** / *Medenî Ferho*
- Zîlan Agir û **Stranên Jîyanê** / *Medeni Ferho.*
- **Hevî û Jiyan** / *Derwêş M. Ferho.*
- **Salar û Mîdya** / *Cegerxwîn.*
- **Berhevoka Kurdî** / Stıg Wikander
- **Nado Kurê Xwe Fırot** / Rıza çolpan
- **Hemu Berhemên** / Casime Celil
- **Alfabeya Kurdî** / Tori
- Kurdistana bi **Fifti Fifti** / Osman Aydar
- **Şahmaran** / Lokman Polat
- **Çîrokên Kurda** / Salahaddîn Mihotulî
- **Birîna Bêar** / İlhamî Sertkaya
- **Xevna Avê** / Raif Yaman
- **Di Siya Dara Xacê De Serhildan** / *Miraz Ronî..*
- **Evîna Mir Hesen** / Fevzi Demirağ
- **Kêjê** / *Adil Zozanî..*
- **Rojnamevan** - ***Lokman Polat***
- **Ziwanê Ma** / Alfaba / *Haydar Dıljen.*
- **Zazaca - Türkçe Sözlük** / *Harun Turgut*

***

- Yeni ve Yakın Çağda **Kürt Siyaset Tarihi**. / *SSCB Bilim Akad.*
- *Kürt Kom. (Celîl, Lazarev, Jagalina, Gasaratyan, Mıhoyan).*
- **1880 Nehri Kürt Ayaklanması** / *Prof. Dr. Celilê Celil..*
- **Kürtlerin Örf ve Adetleri** / *Mella Mahmudê Bayezıdî..*
- **Tarihin Tarihi,** Kürtlerde Tarih, Tarihte Kadın / *Dr. Kemal Mazhar Ahmed*
- Batı- Ermenistan (Kürt Klişkileri) ve **Jenosid** / *M. Kalman.*
- Belge Tanık ve Yaşayanlarıyla **Ağrı Direnişi** / *M. Kalman*
- İngiliz ve Türk Belgelerinde **Botan Direnişleri** / *M. Kalman..*

- **Kürt Davası ve Hoybun** / *Prens Süreyya Bedirhan*
- Dersim Yazıları / Sait Çiya ( Tij Yayınları)
- Zerdüştün İlahileri - **Gathalar** / *Çev. Nergiza Tori.*
- İki Dünya Savaşında **Irakta Kürt Sorunu** / *Ş.X. Mıhoyan.*
- **Yaşayan Her Dil Bir Halktır** / *Hasan Yıldız.*
- XX. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyasası ve **Modernizm** / *H. Yıldız.*
- Kürdün "Maküs Talihi" **GAP.** / *Osman Aytar.*
- **Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna** / *Osman Aytar.*
- **Baban Botan Soran** / *Dr. Kaws Kaftan.*
- İnsanlığın Kültür Mirası **Adıyaman** / *Mehmet Akar.*
- Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni Kürt İlişkileri / ***Garo Sasuni.***
- Tarikat - Kara Para Kemalizm Üçgeninde **Milli Görüş** / *İsmet Siverekli.*
- **Batı'nın Yeni Doğu Seferi** - NATO / Türkler / Kürtler / *Hayrı Argav.*
- **Tutkular ve Tutsaklar- Portreler** / Evin Aydar Çiçek
- **İskandinav Modeli** / Şerefhan Ciziri
- **Eski SSCB'de Kürtler** /Herman Taels

***

- Bir **Kürt** olarak **Yaşamım** / ***Dr. Nureddin Zaza..***
- Görüş ve **Anılarım** / ***Hasan Hişyar Serdi(1907- 1985)..***
- **Ağrı Daği İsyanı** / ***İhsan Nuri Paşa..***
- **Anılar** *(Şeyh Mahmudê Berzenci Hareketi)* / ***Refik Hilmi..***
- Kürt Gözü ile **Yılmaz Güney** / *Mahmut Baksi..*
- **Kamışlı Katliamı** / *Mahmut Baksi.*
- **Teyrê Baz** ya da **Hüseyin Baybaşın** / *Mahmut Baksi..*
- **Dono**'nun **Köyü** / *Mahmut Baksi..*
- **Özlem** (Garod) / *Hraçya Koçar **Kapriyelyan.***
- Sam, **Zal** ve **Oğlu Rustem** / *Norma Lorca Goordich..*
- **Zinacı** / *Edip Polat*
- **Nazımı Anlamak** / *Mehmet İnanç Turan.*
- **Ormanın Dili** / *Munzur Çem.*
- Tanıkların Diliyle **Dersim'38** / *Munzur Çem.*
- **Dersimde Alevilik** / *Munzur Çem.*
- Dersim - Civarik **İki Uçlu Yaşam** / *Hüseyin Akar.*
- **Özlemin Gül Süreti** / *Hafız Akdemir.*
- **Otobiyografya** / *Abdurrezak Bedirhan.*
- **Duvar** Sana Söylüyorum Gelinim Sen Dinle / *Celîlê Celîl...*
- ***Ronahi / Haydar Işık.***
- **Hilalın Gölgesinde** - Bir Ermeni Kızın Yazgısı.
- **Antranig Paşa ve Anıları** / *Antranig Çelebyan*
- *Gururun Verdiği Cesaret-* **Tahtallı** / *W. Zewal Doğan.*



ISBN: 975-8245-54-6